Ama ağırbaşlı ve ölçülü olup ne zaman ve nerede, nasıl hareket edeceğini bilen bir insan, herkes tarafından saygı görür, takdir edilir. İnsanın kişiliği zedelendiğinde eski değer ve itibarına kavuşması çok zordur. Dolayısıyla kişinin toplumdaki yeri ve itibarı sarsıldığı zaman eski saygınlığını ve değerini kaybeder. Toplum nezdindeki saygınlığı ve ağırlığı biter.[5]

II. Konuyla ilgili ortak deyim ve atasözleri ile hikâyeleri

Bu makalede kendisine yer verilen hikâyeler (mesellerin temsilleri), genelde evlilikle yeni kurulan akrabalık veya dostluk ilişkilerinin ölçülü olmasının yanı sıra toplumsal hayata yeni katılan veya evlilikle birlikte yeni bir aile kuran gençlerin gelecekteki hayatlarının ve aile ilişkilerinin zedelenmemesi ve zarar görmemesi için bir takım öğütleri içermektedir.

Bu hikâyelerin bir kısmında baba veya anne, yeni katıldığı ailesine ve kocasına alışmasını sağlamak ve ilişkilerinin sarsılmasını önlemek amacıyla, yeni evlenip koca evine giden ve ölçüyü kaçıracak şekilde sık sık babasının evine gelip giden kızına ve aynı davranışlarda bulunan damadına öğütlerde bulunur. Bazen de evlilik bağıyla yeni kurulan dünürlük gibi akrabalık ilişkilerinin zedelenmemesi ve zarar görmemesi için dünürlerin ölçüyü ve gelenekleri aşan davranışlarını önlemek için uyulması gereken kurallar dile getirmektedir. Kurmancî deyimle: *Şêrîn şêrîn here malên dostan*; Zazakî deyimle: *Şîrîn şîrîn bîye*; Farsça deyimle: *Sengîn burow sengîn biyâ* ve Türkçe deyimle: *Tatlı git, tatlı gel* önerilmektedir.

Bazı hikâyelerde bilhassa Kurmancî son hikâye ile Farsça'dan Türkçeye çevirilen bazı hikâyelerde ebeveynler, sosyal hayata yeni katılan; örneğin büyük ve saygın kişilerin bulunduğu bir cemaate veya davete giden evlatlarının, orada nasıl oturup kalkması gerektiğini hatırlatan öğütlerde bulunur. Kurmancî deyişle: *Peyvên gir kirin* (Büyük laflar etmek) ve Farsça deyişle: *Bâlâ bâlâ bi-nişîn, herfhâ-yê gunde gunde be-zen.* (Yüce yüce otur, büyük büyük laflar et!) ve Türkçe benzer deyişe: *Akılsız kafaya söz kâr etmez.*) haddini aşan kişilikler mizahi bir yolla uyarılır ve hicvedilir. Ancak bütün hikâyelerde, verilmek istenen mesajın ve öğüdün muhatabın kabiliyet ve yeteneğini aşacak tarzda kinayeli ve kapalı olması sebebiyle iletişim sıkıntısına yol açarak istenen şeyin tam tersi durumlar ve sonuçlar da ortaya çıkabilir.

Şimdi ilgili ortak deyimler (meseller) ve ardından onların hikâyelerine bakalım. Bu ortak deyimler ve hikâyelerinden bazısında akrabalık ve dostluk ilişkilerinin ölçüsü ve kurallarına vurgu yapılırken bazısında da aptallık, cehalet ve yersiz övünmeler yerilmektedir.

a)Kurmancî:

Şêrîn şêrîn here malên dostan. (Dostların evine tatlı tatlı git./ Türkçe: *Tatlı tatlı gel, git.*

Dûr be şêrîn be. (Uzak olsun, tatlı olsun)

Şîrîn şîrîn were. **(**Türkçe: *Tatlı tatlı gel*)

[5] Kurmancî olanlar için bk. Oncu, 2009, 395-396; Mazî, 266; Seccâdî, 262. Zazakî olanlar için bk. Selcan, Lezgin, 145; Said Veoj; Selcan, 169, 234-235; Farsça olanlar için bk. Dêhxodâ, II, 991; *Zûlfiqârî,* I, 1211-1214; Enverî, I, 636, 674-675. Rahmandûst, Mustafa, *Fovt-ê Kuzegerî*, Tahran 1390 hş., II, 658; Türkçe olanlar için bk. Aksoy, I, 121-122; Albayrak, 112, 495, 819; Akyalçın, 90-91, 532.

Sêrek sêrek bê. (Seyrek seyrek gel. Türkçe: *Tatlı tatlı gel*)

Tama çûn û hatine nelewitîne. **(**Gidip gelmede ölçüyü kaçırma. Türkçe: *Tatlı tatlı gel*)

Ger mala birayê te be jî şîrîn şîrîn biçe. **(**Gidip gelmede ölçüyü kaçırma. Senin kardeşinin evi de olsa tatlı tatlı git. Türkçe: *Tatlı tatlı gel*)[6]

b)Zazakî:

Şîrin şîrin bî. (Türkçe: *Tatlı tatlı gel.*)

Giran biyene. (Makul ve ağırbaşlı gelmek; hafif davranmamak.

Usıl usıl so. (Türkçe: *Tatlı tatlı git.*)[7]

Dur bu şîrîn bu. (Uzak olsun tatlı olsun.)

c)Fârsî:

سنگین برو، سنگین بیا!

Sengîn burow sengîn biyâ. (Ağırbaşlı git, ağırbaşlı gel! Türkçe: *Tatlı git, tatlı gel.*)

شیرین بیا و شیرین برو

Şîrîn biyâ û şîrîn berov. (Türkçe: *Tatlı gel, tatlı git.*)

کم بیا عزیز باشی

Kem biyâ 'ezîz bâşî. (Az gel, aziz ol. Türkçe: *Tatlı gel, tatlı git.*)

سنگین برو، رنگین بیا.

Sengîn burow, rengîn biyâ. (Ağırbaşlı git, özleterek/çekinerek gel. Türkçe: *Tatlı tatlı gel, tatlı tatlı git.*)[8]

بالا بالا بنشین حرفای گُنده گُنده بزن!

Bâlâ bâlâ bi-nişîn, herfhâ-yê gunde gunde be-zen. (Yüce yüce otur, büyük büyük laflar et! Türkçe benzer: *Akılsız kafaya söz kâr etmez.*)[9]

Seyrek gel, seyrek git ki tatlı olasın Sık sık gidip gelme, kendini özletmeye çalış. Bu mesel şunun bunun evine sık sık gidip gelen ve insana sıkıntı veren kişiler için söylenir.

---

[6] Bk. Hesen, 92, 233; Oncu, Mehmet, *101 Biwêj 101 Çîrok*, Avesta İstanbul 2015, s 129-130.
[7] Ersoz, Umer Farûq, *Kekû*, Roşna, Diyarbakır 2013, s. 13-14; Selcan, 410, 56; Lezgîn, 108.
[8] Emînî, Emîr Kulî, *Ferheng-ê 'Avâm yâ Tefsîr-ê Emsâl o Istılâhât-ê Zebân-ê Fârsî,* I-II, Dânişgâh-ê Isfahân 1369 hş./1990, 364, Enverî, Hasan (ve diğerleri), *Ferheng-ê Emsâl-ê Suxen*, İntişârât-ê Sohan, Tahran 1384 hş., I, 678; Azîmî, Sâdıq, *Ferheng-ê Bîst Hezâr Mesel û Hikmet û Istılâh-ê Fârsî*, Dânişgâh-ê Tahran 1382 hş., 493; Şehrî, Ca'fer, *Qand û Nemek: Żerbulmeselhâ-yi Tehrânî be Zebân-ê Muhâvere*, İntişârât-ê Mu'în, Tahran 1378 hş./1999, 397, 470; Hazrâ'î, 724
[9] Şehrî, s. 301; Vekîliyân, II, 57; Albayrak, 126.

Bu ortak deyimlerle ilgili Kurmancî, Zazakî, Farsça ve Türkçe bazı ayrıntılar müstesna hemen hemen aynı olup aşağıda verilecek bazı hikâyeler mevcuttur. İlave olarak Türkçe ilgili iki mesel ve "Merdi Kıpti şecaat arz ederken sirkatin söyler" manasında Farsça bazı deyimlerin hikâyeleri de eklenecektir.

a)Kurmancî hikâye

Şîrîn şîrîn were

K1.Tatlı tatlı gel: Bu deyim ve hikâyesine yer veren Mehmet Oncu şöyle der: "Sosyal ilişkilerde her şey açık ve doğrudan söylenmez. Birçok şey vardır ki açık ve doğrudan söylenmesi insanlar arasındaki ilişkileri bozar. Bu sebeple bazı şeyleri ifade etmek için sanatlı bir dil kullanılır. Kürtler arasında şu deyimler pek yaygındır:

Sêrek sêrek bê. Herçeğ, bêçağ neyî.

Tama çûn û hatine nelewitîne.

Ger mala birayê te be jî şîrîn şîrîn biçe.

Kürtlerin kültüründeki bu deyimin kaynağı bir baba ile kızının şu hikâyesine dayanmaktadır:

Şîrîn şîrîn were

[Tatlı tatlı gel]

Dibêjin: Mirovekî ku keçika wî ya ku bi delalî mezin kirî hebû. Keça wî mezin û berbext bû, qeder ji wê ve bû, zilam keça xwe kire bûk. Lê ji berk u keç bi nazenînî mezin kiribû, her roj du roj dihate mala bawê xwe, rojekê bav ji keça xwe ra got:

-Keçâ min şîrîn şîrîn were.

Keçê gotina bavê xwe fêhm nekir, bû roja din, keç dîsa hate mala bavê xwe, vê carê bi denek dims hatibû, bavê got:

-Keça mine ew çî ye?

Keçê got:

-Bavo, te got, şîrîn şîrîn were, min jî ji te re denek dims anî.

Bavê wê serê xwe hejand, got:

-Keça min şîrîn şîrîn were.

Keçê dîsa fêhm nekir, dema bû roja din bi satilek hingiv hate mala bavê xwe. Dema bav hingivê di destê keçê de dît, zârê xwe tirş kir û got:

-Keça min, min got şîrîn şîrîn were!

Lê mixabin keçê dîsa fêhm nekir, bû roja dîn. Vê carê ku keç hat, bi xwe ra gelek şîranîyên din ên weke kesme pastix û benî anîn li pêşîya bâvê xwe danîn. Bavê wê got:

-Keça min ez ji te re dibejim, şîrîn şîrîn were, tu diçî ji min re şîraniyê tînî!

Keçê got:

-Yanê çawa şîrîn şîrîn?

Bavê got:

-Keça min, keça min şîrîn şîrîn, yene tama hatine nelewitîne, sêrek sêrek bê, ku em bêrîya te bikin, ku tu bi me şîrîn bêyî.

Li ser vê keçika xwe rast kir û xwe û xwe ra digot:

-Dera ku tu çûyê, ger mala bavê te be jî, lazim e tu şîrîn şîrîn biçî…[10]

K2.*Çûn û hatina bişîrani*

Tatlı tatlı gidip gelmek

Pîrek hebû keça xwe da mêr. Lê belê keç her rojek du rojan, carekê dihat mala diya xwe. Rojek, dido, sisê, em bêjin çar, pênc werhasil mêrê wê jî û diya wê jî, ji wê rêveçûna wê gelek nexweş dibûn û bêzî dikirin. Ji bo ku dilê wê nemîne, diya keçê rasterast nedigotê ku hewqas gur newe, û wê ji ber xwe ve jî, fam nedikir ku hewqas neçe û nê! Rojek diya wê were sergirtî dibêjê:

-Keça min! Cara ku tu hatî jî, bi şîranî were!

Keçik têdigihîje ku diya wê doza şîranîyê lê dike. Çimkî gelek rez û bostanê mala mêrê wê hebûne. Roja din keçikê barek tije helîl, bastêq, mewîj, şaran û helawî dike û davêje ser pişta kerekê, berê xwe dide riya mala diya xwe, diçe.

Diya wê dibîne ku di pey gotina ku ji keça xwe re gotibû de, bi rojekê şûnde, waye hat û barek sax jî şîranî bi xwe re hanîye!

Dê ji keçê pirsî:

-Keça min! Ev çî ye ku te ji diya xwe re hanîye?

Keçê gotê:

-Dadê! Ne te gotibû min, ku tu hatî bi şîranî were![11]

K3.*Peyvên gir*

Büyük laflar (etmek)

Zilamekî rîspî yê xwîyanî hebû, timî li kurê xwe şîret dikirin û digotê:

[10] Oncu, Mehmet, *101 Biwêj 101 Çîrok*, Avesta İstanbul 2015, s 129-130.

[11] Zinar, Zeynelabidîn, *Xwençe I: Gotinên Pêşîyan, Kilam-Dîlok û Çîrok*, Stockholm 1987, 123.

-Kurê min! Êdî tu mezîn î, zilam î û bûyî peya. Sibe çaxê ku bavê te bimre, tu yê bikevî şûna wî. Divê ku tu li wê gorê bilivî û timî peyvên mezinan bikî. Da ku xelk nebêje, lawê filakes sûtalekî sêlekan e!

Piştî şîretên bavê, kur roj bi roj êdî xwe dixist şûfê zlamên mezin û diçû li jora civatan rûdinişt, peyvên wisa bêteşe dikirin ku xelk tev pê dikenîya. De ji xwe bavê wî gotibû "peyvên mexinan bike". Îcar jêwetirê ku dê ew peyvên gir bike yan navên heywanên gir beje, wê di nava xelkê de zilam bê hesibandin.

Rojekê di civatekê de yek dipeyive û yên din lê guhdarî dikirin. Lawik jî hema ji nedî ve dibêje: "Deve!" Îcar bi wê gotina wî re, dibe pilqîna civatê û tev pê dikenin. Lawik bi wî kene bi xwe, pir fedî dike û liber xwe dikeve. Piştre ew difikire û xwe bixwe dibêje: "Mîna ku ji deve mezintir, tiştine din jî hene. Îcar ez ê navê tiştekî din bêjim jê mezintır be!" Piştre ew difikire û dide aqılê xwe, gelo çi ji deve mezintir heye, çi tune. Wê gavê hema navê fîl tê bira wî.

Di demekê de dîsa ciwat bêdeng dibe. Îcar ew ji nedî ve dibêje: "FîÎll!" Dîsan dibe pilqîna civatê û her kes pê dikene.[12]

b)Zazakî hikâye

Yukarıda geçen Kurmancî hikâye ile büyük ölçüde aynı olan bu Zazakî hikâye Umer Farûq ERSOZ tarafından şiir şeklinde anlatılmıştır.

Keynê mi şîrin şîrin

[Kızım! Tatlı tatlı]

Babî, keyna kerd gird, ûmê zewaci

Ûmê, hey yê wazenî, bayk ya da ci

Bîb veywê şar' ya, girot xemilna berd

Ma veyw bî, dest bigîr bêr key mêrde verd

Hûmay ra, ya key babî ra dûr nîya

Yew ling ha uca'd, va, ez uca d' bîya

Mêrde ho ken warî, veywa newe va

Hema nimusa îtya, wa şêr dew a

Ina şîn ûmên, va, sebir bid Rebî!

Va, şîrin şîrin bî, in kîyê babî

Keyna va, temûm baw, ez yen pê şîrin

[12] Zinar, Zeynelabidin, *Xwençe IV: Kılam, Lavija Mesîh, Meselok û Çîrok*, Stockholm 1990, 149.

Ti heq vûnî, niben tim-tim fekşîrin

Ya şî viraşt tepsî tepsî qedayif

Va, wa fêk yi şîrin bo, babî mi heyf

Şî bêr babî kuwa, babî ber kerd a

Pey tepsî qedayif, keyna ha ver da

Va, hu bawo, qedayif mi viraşta

Ti qet mereq mekir, ez tu rî paşta

Babî ûwna, keyna wi fehm nikerdo

Keyna hunc ûmeya, ha vêr bêr ver do

Ber kerd a, keyna delal koti zerre

Vatey mi qedayif niyebi ere

Keynê min a, cayê mi teng nikena

Yena şina, îna ti ha se kena?

Ti bîya veywê şar' vacên tu dima ra

Yî tu şenik vînen' ti kuwna çim ra

Mi va byi şû keynê mi, sêr girûnî xwu

Aqil bi, biterekn ti herûnê xwu

Keynek hema newe fehm kerd, yi va se

Ma z' qalê bayk yê ra xwu r' vecî hise

Her çî hed yi esto, ti hed ra mevec

Qal ki nigina tu, xwu ra men, medec

Lew' ki bî a, tira vecyên tikî qal

Her qal peto nîya, îna vûn pîr-kal

Şîrin-şîrin gûm b'erz, ti poşman mebi

Tim şîrin ti b'eysi, şîrinî de bi[13]

[13] Ersoz, Umer Farûq, *Kekû*, Roşna, Diyarbakır 2013, s. 13-14.

c)Farsça hikâyeler

سنگین برو سنگین بیا!

F1.*Sengîn berow sengîn biyâ./ Ağırbaşlı git, ağırbaşlı gel!*

(Türkçe: *Tatlı git, gel./ Zırt gelip zırt giden sevgisini yitirir.// Ağır ol batman gelsin.*)[14]

Sık sık gidip gelme, kendini özletmeye çalış. Şunun bunun evine sık sık gidip gelen ve insana sıkıntı veren kişiler için söylenir.

Kaynağı: Bir kız varmış. Evlenip koca evine gittikten sonra her gün anne babasının evine gelip gidiyormuş. Annesi de yeni gelin olmuş kızının kendi evine ve yeni hayatına alışması için, onu incitmeyecek şekilde kinaye ile "Ağırbaşlı gel, ağırbaşlı git!" demiş.

Annesinin amacını anlamamış olan kız ertesi gün annesinin evine elbisesinin dört yanına çakıl taşlarını bağlayarak gitmiş. Annesi kızının ne demek istediğini anlamadığını kavrayınca "Kızım, tatlı tatlı gel, tatlı tatlı git!" demiş. Kızı ertesi gün annesinin evine giderken bir tepsi tatlı da götürmüş. Annesi kızının yine anlamadığını kavrayınca demiş: "Canım kızım! Az gel, az git!"[15]

بالا بالا بنشین حرفای گنده گنده بزن!

F2.1.*Yüce yüce otur, büyük büyük laflar et!*

Bâlâ bâlâ bi-nişîn, herfhâ-yê gunde gunde be-zen.

(Türkçe benzer: *Akılsız kafaya söz kâr etmez./ Merdi Kıpti şecaat arz ederken sirkatin söyler./ Deli kız düğün etmiş, kendi baş sedire geçmiş.*)[16]

Kişiye gücü ve yeteneğini aşan bir iş verildiği yahut bir kişi zekâsı ve yeteneğini aşacak şekilde övüldüğü zaman söylenir. Yahut kişinin büyüğüne zarar verecek ve küçük düşürecek bir söz söylemesi, bir davranışta bulunması yahut büyüğün öğüdünün tersini yapması durumunda söylenir.

Yüce yüce otur, büyük büyük laflar et!

Bir kadının evlilik çağına gelmiş bir kızı varmış. Kadın gittiği her yerde kızını över dururmuş. Bir gün kızı için görücülerin geleceğini haber vermişler. Kadın evini temizleyip dizdikten sonra kızına, "Ben hamama gidiyorum, üstün başın düzgün olsun, görücüler gelince ağır başlı (ağır ağır) otur büyük (büyük) laflar et, onları ağırla; bir tavuk kesmiş ocağa koymuşum, dikkat et ateşi sönmesin" der ve yapması gereken her şey hususunda kızına sıkı tembihte bulunduktan sonra çıkıp gider.

Anne gittikten sonra kızı ilkin arpa ile buğday çuvallarını üst üste yığar, çuvalların üstüne çıkar yüce yüce oturur. Bir süre sonra görücü kadınlar gelirler. Ne kadar seslenirlerse de bir

[14] Yurtbaşı, 2; Aksoy, 1, 121.
[15] Vekiliyân, II, 135.
[16] Vekîliyân, II, 57-58; Yurtbaşı, 13

cevap alamayınca evin odalarına bakarlar, kızı çuvalların üstüne oturmuş şaşkın şaşkın kendilerine baktığını görürler. “Annen nerede?” derler. Ama kız cevap yerine “Deve, öküz, eşek” der. Şaşkına dönen görücüler “Kız delidir” deyip evden çıkıp giderler. Tam o sırada köpek de ocaktaki tencerenin içinden tavuğu kapıp kaçar. Kız kılını kıpırdatmaz. Annesi gelir o da kızını, üst üste yığmış olduğu çuvallar üstünde görünce “Allah canın alsın, delirdin mi? Orada ne işin var? Görücüler gelmedi mi?” der.

Kız annesine “Kendin ağır ağır otur büyük büyük laflar et demedin mi? Ben de aynısını yaptım...” der ve olanları anlatır. Annesi saçını başını yolar, kıza da iyi bir dayak atar.

Bir varyantta da evlilik çağına gelmiş olan bir oğlan annesiyle kız görmeye gider ve annesinin benzer öğüdünü kız evinde yığılan yatakların üzerine çıkarak uygular.[17]

دختره رو مادرش برای سنگین رنگین بودن نصیحت کرد:

«خونه شوور که رفتی بالا بالا بیشین حرفای گنده گنده بزن.»

رَف سرِ بخاری نشس، گُف : ستر، فیل، گرگدن!

F2.2.*Yüce yüce otur, büyük büyük laflar et!*

Anne kızına ağırbaşlı çekingen olması için nasihat etti:

“Koca evine gidince yüce yüce otur, büyük büyük laflar et.”

Kız gitti sobanın üzerine oturdu; “Deve, fil, gergedan” dedi.

Duxtre ro mâdereş berâ-yê sengîn rengîn bûden nesîhet kerd:

“Xone şûver ki reftî Bâlâ bâlâ bêşîn, herfâ-yê gunde gunde be-zen”

Ref ser-ê buxârî nişes gof: “Sutur, fîl, gergeden![18]

بالا بالا بنشین حرفای گنده گنده بزن!

F2.3.*Yüce yüce otur, büyük büyük laflar et!*

Bâlâ bâlâ bi-nişîn, herfhâ-yê gunde gunde be-zen.

(Türkçe benzer: *Merdi Kıpti şecaat arz ederken sirkatin söyler./ Akılsız kafaya söz kâr etmez.*)

Bir adamın bir oğlu varmış, ilk defa büyüklerin bulunduğu bir mekâna davet edilmişti. Babası oğluna sıkı sıkı tenbihte bulundu: “İçeri girince en yüksek yerde otur; büyük laflar et; şöyle yap böyle yap ki herkes senin büyük bir aile ortamında terbiye edildiğini bilsin.”

[17] Vekîliyân, II, 57-58; Yurtbaşı, s. 13
[18] Şehrî, s. 301; Vekîliyân, II, 57.

Oğlan babasının bütün sözlerini can kulağıyla dinledi ve davete icabet etmek üzere yola düştü. Babası heyecanla onun dönüşünü bekledi. Sonunda oğlan döndü. Babası heyecanla karşıladı ve sordu: "Ne yaptın, ne söyledin?"

Oğlan dedi: "Rahat ol, ne söylediysen aynısını yaptım. İçeri girer girmez, odanın en üst tarafında bulunan sekiye oturdum ve sadece fil, gergedan ve aslandan konuştum. Öyle ki orada bulunan herkes şaşkınlıktan parmağını ısırdı."[19]

1.Bu mesel şaka etmek veya eleştirmek amacıyla, büyüklerle ortak nitelikleri olmadığı halde onlarla bir arada bulunan kişiler hakkında söylenir.

2.Sürekli kendini öven ve saçma sapan konuşan kişileri eleştirmek amacıyla söylenir.

d)Türkçe hikâye

T1. ***Tatlı gel tatlı git***

Pek yaygın olmasa da Türk kültüründe de bazı yörelerde bu konuyla ilgili iki hikâye mevcuttur. Ahmet Özdemir bu konuda şöyle der:

"*Tatlı gel tatlı git*, deyiminin teması aynı olmak üzere türlü hikâyeleri var. Kiminde yeni evli kız, babasına "Baba, tatlı gel, tatlı git!" diyordu. Birinde kayınvalide damat adayına "Damat, tatlı gel, tatlı git," demişti. Bir başkasında da yeni evli çiftten erkeğin annesi, gelinin annesini "Dünürüm, tatlı gel, tatlı git," diye uyarmıştı. Ben yıllar önce yazdığım ve Bordo Siyah Yayınlarının 100 Temel Eser dizisinde yayınlanan "Türkçe'de Deyimler" kitabıma son varyantı almışım:

Kadın, yeni evlendirdiği kızının evine sık gidiyor, gidince duygusal davranıyor, olur olmaz şeylere karışıyormuş. O gittikten sonra yeni evlilerin arasında bir tartışmadır başlıyor ve hoş olmayan anlar yaşanıyormuş. Bunu anlayan oğlanın annesi, kızın annesini tatlılıkla uyarmak için: "Dünürüm tatlı gel," demiş.

Kadıncağız bunu anlamamış. Kendisinden tatlı istenildiğini sanarak ertesi gün baklavalar yapmış. Yine aynı davranışları sergilemiş, yine aynı aile kavgaları çıkmış. Oğlanın annesi yine aynı uyarıyı yapmış. Bu kez kızın annesi daha değişik tatlılar yaparak gitmiş.

Kadının anlamadığını gören, öbür dünür açık konuşmuş: "Dünürüm, tatlı gel derken tatlı getir demek istemedim. Biraz az gel" demiş.[20]

T2.*Oğlum şirin gel*

Geçmiş zaman içinde Kilis'te, adamcağızın birinin nazlı bir kızı varmış, kız büyümüş, gelinlik çağına gelmiş ve nihayet kısmetli birisi çıkıp onu isteyince, adamcağız da kızını vermiş, kız da gelin olup gitmiş.

[19] Rahmandûst, Mustafa, *Fovt-ê Kuzegerî*, Tahran 1390 hş., I, 226-227.
[20] Özdemir, Ahmet (http://www.avgader.com/deyimler-arasnda-tatli-gel-tatli-git/: erişim: 30.11.2021: 08:30)

Birkaç ay sonra damat, hanımının canı sıkılmasın diye bir akşam ona, "Kalk da anangile gidek!" demiş, kızcağız da bir şey demeyip bu isteğe uymuş, kalkıp gitmişler. Bu durum haftada iki üç geceye çıkar olmuş. Hep kalkıp kızın anasıgile akşamları oturmaya gitmişler, damat bakmış ki her gittiklerinde izzet, hürmet iyi, oldukça yerinde, "Bunlar gelmemizden çok hoşlanıyorlar!" deyip her akşam gitmeye başlamışlar. Kaynana bu duruma hiç ses etmemiş, çünkü her akşam kızı yanında memnun; damatsa bakmış ki karşıdan ses seda çıkmıyor, bu sefer hanımını gündüzden kayınpederinin evine yollamış, kendisi de işten çıkar çıkmaz doğru oraya gelmiş ve akşam yemeğini de beraber yemeye başlamışlar. Bu hal böyle günlerce sürmüş, "Ooh nasıl olsa sarı saman, sallama ahır; yi iç kudur!" derler ya ulularımız, işte öyle... Gece ikramı bitince de kalkıp evlerine giderlermiş.

Kayınpederinin evdeki düzeni bozulmuş, akşam yorgun argın eve geldiğinde ayağını uzatıp da istirahat edecek bir fırsat bulamamış, Bu geliş ve gidişi rayına oturtmak için bir akşam mecazî anlamda damadına: 'Oğlum şirin gel!' demiş. Damat da "kayın pederim benim gelip gitmemden memnun ki herhalde gönlü de tatlı istiyor ve bana şirin gel diyor" diyerek, bu sefer akşamları eve giderken bir tepsi tatlıyla gitmeye başlamış. Kayın peder bakmış ki damadı sözlerindeki dokundurmadan habersiz ya da yanlış anlamış, bu sefer bir akşam aile sohbetinde otururken, damadı kırıp incitmeden nazik bir şekilde ona: "Oğlum, datlından, sohbetinden, saygından, yakınlığından, nezaketinden aile yapından memnunum ama sana “şîrîn gel” dedimse, tatlı getir demedim; yani sık sık gelme, usandırma, bıktırma, seyrek gel dedim" demiş. Bu uyarıya damat anlayış göstermiş, kayınpederine nefes aldırmış ve artık seyrek gelmeye başlamış. Ama bu mesel, kulaktan kulağa fısıltılı halinde Kilis halkına yayılmış. Bu olaydan sonra Kilis'te herhangi bir kimse, konuk olarak birine (arkadaşı, akrabası veya komşusuna) sık gelmeye başladığında "şirin gel" uyarışı ile karşılaşırsa, bu mecazî anlam anlaşılır olmuş. Bugün bile bu latife halk arasında yaşamaktadır.[21]

Sonuç

Ortadoğu halkları arasında ağırbaşlı, ölçülü ve kişilikli büyük insanlar birçok ortak atasözü ve deyimde doğal olaylar karşısında yerinden teprenmeyen ağır taşa; bazısında da hafif, kararsız ve ölçüsüz davranan kişiliği oturmamış insanlar da hafif taşa benzetilmiştir. Farsça, Kurmancî, Zazakî, Soranî ve Türkçe birçok ortak atasözünde büyük ölçüde taş metaforunun kullanılması ayrıca dikkat çekicidir. Söz konusu nitelikleri taşıyan makul şahsiyetler, gençlerin sosyal hayatta ve aile hayatında örnek alması gereken büyükler olarak görülmüştür. Deyimlerde de en yakın akraba veya dostlar da olsa insanların sosyal ilişkilerde dengeli ve ölçülü olmasına dikkat çekilmiştir.

Kurmancî ilk iki hikâye ve Zazakî hikâye ile Farsça ve Türkçe hikâyeler (K1 ve K2; Z1 temsil-i meseller) şekil, kurgu, içerik, motifler, kahramanlar ve vermek istenen mesajlar hemen hemen aynıdır. Toplumsal hayatta ve sosyal ilişkilerde yaşanan tecrübe ve deneyimlerden çıkan sonuçlara dayalı adet ve geleneklere göre kişilere, bilhassa evlilik ve benzeri yollarla oluşan

[21] Mısırlı, Ökkeş (http://www.kilispostasi.com/irin-gel/206366, erişim: 30.12.2021: 20:30)

akrabalık ve dostluklarda ölçülü ve makul davranışlar önerilmektedir. En yakın akrabalar da olsa onları rahatsız edecek yersiz, zamansız ve ölçüşüz davranışlardan sakınmak lazımdır.

Kurmancî son hikâye (K3) ile Farsça son üç hikâyede (F2.1, F2.2 ve F2.3) şekil, kurgu, içerik ve kahramanlar ve vermek istenen mesajlar da hemen hemen aynıdır. Bu hikâyelere göre kişinin aklını, zekâsını, gücünü ve yeteneğini aşan beklentiler daima gülünç ve trajik komik sonuçlar doğurur. Beklenen olumlu sonucun ortaya çıkması için, sağlıklı bir iletişimin sağlanması ve bu iletişimin iki tarafın aklı, zekâsı, seviyesi ve yeteneğine göre olması lazımdır.

Kaynaklar ve Kısaltmalar

Aksoy, Ömer Asım, *Atasözleri ve Deyimler Sözlüğü*, I-II, İnkılâp İstanbul 1988.

Akyalçın, Necmi, *Türkçemizin Anlamsal Zenginlikleri Deyimlerimiz*, Ankara 2012.

Albayrak, Nurettin, *Türkiye Türkçesinde Atasözleri*, Kapı Yayınları, İstanbul 2009.

Azîmî, Sâdıq, *Ferheng-ê Bîst Hezâr Mesel û Hikmet û Istılâh-ê Fârsî*, Dânişgâh-ê Tahran 1382 hş.

Behmenyâr, Ahmed, *Dâstânnâme-ê Behmenyârî*, İntisârât-ê Dânisgâh-ê Tehrân, 1381 hş./2002.

Dêhxodâ, Ali Ekber, *Emsâl û Hikem*, I-IV, Emîr Kebîr, 1363 hş.

Emînî, Emîr Kulî, *Ferheng-ê ‘Avâm yâ Tefsîr-ê Emsâl o Istılâhât-ê Zebân-ê Fârsî*, I-II, Dânişgâh-ê Isfahân 1369 hş./1990.

Enverî, Hasan ve diğerleri, *Ferheng-ê Emsâl-ê Suxen*, I-II, İntişârât-ê Soxan, Tahran 1384 hş.

Hazrâ’î, Emîn, *Ferhengnâme-ê Emsâl u Hikem-ê Îrânî*, İntişârât-ê Nuvîd, Sîrâz 1382 hş.

Hesen, Bîlal, *Ji Wêjeya Gel: Pend û Peng*, Marburg 2006.

Heblerûdî, Muhammed, *Kulliyât-ê Câmi‘u’t-temsîl*, Tahran ts.

https://tr.wikiquote.org/wiki/Zazaca_atasozleri (erişim erişim 23.11.2021: 12:00)

Lezgîn, Roşan, *Ferhengê Îdyomanê Kirdkî (Zazakî)*, Roşna, Diyarbakır 2017.

Mazî, Çiya, *Ferhenga Gotinên Pêşiyan*, İstanbul 2005.

Mısırlı, Ökkeş: (http://www.kilispostasi.com/irin-gel/206366, erişim: 30.12.2021: 20:30)

Oncu, Mehmet, *Gotinên Peşîyan*, İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları 2009.

__________, *101 Biwêj 101 Çîrok*, Avesta İstanbul 2015.

Özdemir, Ahmet: (http://www.avgader.com/deyimler-arasnda-tatli-gel-tatli-git/: erişim: 30.11.2021: 08:30)

Rahmandûst, Mustafa, *Fovt-ê Kuzegerî*, I-II, Tahran 1390 hş.

Ruxzâdî, Ali, *Guwârey Kûrdewârî: Pend-ê Peşînîyân*, Senendec 1385 hş.

Seccâdî, Seyyid Abdulhamid Hayret, *Pendê Peşîniyân*, Hevlêr 2010.

Selcan, Zılfi, *Qese u Qesê Vırênu Leksikon*, Dersim 2013.

Şehrî, Ca‘fer, *Qand û Nemek: Żerbulmeselhâ-yi Tehrânî be Zebân-ê Muhâvere*, İntişârât-ê Mu‘în, Tahran 1378 hş./1999.

Şekûrzâde, İbrahim, *Deh Hezâr Mesel-ê Fârsî*, Meşhed 1372 hş.

Tîgrîs, Amed, *6762 Gotinên Peşîyan*, Weşanên Rewşen, Stockholm 2001.

Vekîliyân, Ahmed, *Temsîl o Mesel*, I-II, İntişârât-ê Surûs, Tahran 1375 hs./ 1996.

Veroj, Said: (http://www.kovarabir.com/2012/10/seid-veroj-vateye-verenan-ye-dimiliZazakî/: erişim 30.11.2021: 09:00)

Yurtbaşı, Metin, *Sınıflandırılmış Türk Atasözleri*, Ankara 1994.

Zinar, Zeynelabidîn, *Xwençe I: Gotinên Pêşîyan, Kilam-Dilok û Çîrok*, Stockholm 1987.

————, *Xwençe IV: Kilam, Lavija Mesîh, Meselok û Çîrok*, Stockholm 1990.

________, *Dâstânhâ-yi Emsâl*, İntişârât-ê Mâzyâr, Tahran 1385 hş.

Zûlfiqârî, Hesen, *Ferheng-ê Bozorg-ê Żerbu'l-Meselhâ-yê Fârsî*, I-II, Tahran 1388 hş.

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ

Yıl: 7, Cilt: 7, Sayı: 14 *ISSN: 2147-5679*

بنەماڵەی مەولانا خالیدی نەقشبەندی لە بەڵگەنامەکانی عوسمانیدا

Hemin Omar Ahmad*

Makale Türü/Article Types: Araştırma Makalesi/Research Article
Makale Geliş Tarihi/Received: 26.01.2022
Kabul Tarihi/Accepted/: 28.02.2022
Atıf: Ahmad, H. O. (2022).
"The Familiy of Mawlana Khalid Naqshabandi in the Ottoman Archives",
Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 14, 38-68.
Orcid: 0000-0003-1985-9512

پوختە

بێگومان تا ئێستا بە زۆر لە زمانان چەندین تێز و توێژینەوەی ئەکادیمی و کتێب لەسەر ژیان و بەرهەمەکانی مەولانا خالیدی نەقشبەندی نووسراون و چەند لایەنی ژیانی ئەو ڕابەر و کەسایەتییە ڕوونکراوەتەوە، بەڵام وەك پێویست ئاوڕ لە خێزان و منداڵ و کەس و کارەکەی نەدراوەتەوە. بەو پێیەی کۆتایی ژیانی مەولانا لە شام بووە و بەشێکی دیاری بنەماڵەکەی لەوێ نیشتەجێ بوونە، ئەو دەڤەرەش بەشێکی ژێر دەستەڵاتی عوسمانییەکان بووە، بۆیە زانیاری لەبارەی کەس و کار و بنەماڵە و بەشێك لە خەلیفەکانی و خانەقاکانی لە شوێنە جیاوازەکانی وڵاتانی ئیسلامی لەناو ئەرشیڤخانەی عوسمانی دەبینرێت. لەم ڕووەوە چەند لایەنێکی ژیانی هەر یەکە لە مەحموود ساحێبی برای، محەمەد ئەسعەدی برازای، نەجمەددین ئەفەندی کوڕی، فاتیمەخانی کچی و ستی خانمی هاوسەری لەبەر ڕۆشنایی بەڵگە ڕەسمی و کارگێڕییەکانی ئەرشیڤخانەی عوسمانی خراونەتەڕوو و بە گوێرەی پێویستی زانستی، زانیارییەکانی پێشووتر ڕاستکراونەتەوە یان پشتگیری کراون و یانیش زانیاری تازەیان خراوەتەسەر.

وشەی کلیلی: بنەماڵەی مەولانا خالیدی نەقشبەندی، مەحموود ساحێب، کچی مەولانا، کوڕی

The Family of Mawlana Khalid Naqshbandi in the Ottoman Archive

Abstract

Undoubtedly, so far, many researches, academic studies, and books have been written in many languages on Mawlana's life and works shedding a light on several aspects of this leading figure. However, yet, there have not been enough studies on his family, children and other members. As far as, Mawlana spent his last part of his life in Levant (Sham), a great number of his family members lived there, and a large part of this area were ruled by Ottoman authorities, an excessive deal of information on his family members, his Khalifs, and Shrines in various Islamic countries were preserved in Ottoman Archives. In this respect, some aspects of the life of his brother Mahmud Saheb, his nephew Muhamad Asaad, his son Najmaddin Afandi, his daughter Fatima Khan, and his wife Sti Khanim, based on the official Ottoman administrative documents and archives were either amended, supported or other extra information added to them.

Key Words: Daughter of Mawlana, Family of Mawlana Khalid Naqshbandi, Mahmud Saheb, Mawlana's wife Sti Khanim, Son of Mawlana.

* Dr. Öğr. Üyesi, (heminahmad40@gmail.com)

1-1پێشەکی

مەولانا خالیدی نەقشبەندی (1779-1827/6/9ز)[1] کە لە بەڵگەنامەکاندا بە پاشناوی نەقشبەندی نەك بەغدایی هاتووە، یەکێك لە ڕابەرە گەورەکانی تەریقەتی نەقشبەندی و کەسایەتییەکی گەورەی کوردە، کە کاریگەرییەکەی تا ئێستاش لەناو کوردستان و دەرەوەی کوردستانیشدا هەر ماوە. سەبارەت بە مێژووی ژیانی ئەو ڕابەرە بە زمانی جیاجیا نووسراو و توێژینەوەی جۆربەجۆر هەن. ئەرشیڤخانەی عوسمانییش لە ئیستەنبوڵ وەك یەکێك لە گەورەترین ئەرشیڤخانەکانی ناوچەکە سەرچاوەیەکی گەورەی ژیانی سیاسی و کۆمەڵایەتی و ئایینی و کارگێڕیی هەموو ئەو شوێنانەیە کە ڕۆژێك لە ڕۆژان لەبن قەڵەمڕەوی عوسمانییەکاندا بوونە. هەر ئەمەش بووە یەکێك لە خاڵە گرنگەکانی ئەم توێژینەوەیە بەو پێیەی تا ئێستا نە لەسەر خودی مەولانا و نە لەسەر کەسە نزیکەکانی بەڵگەنامەی ئەوتۆ نیشان نەدراون.

باسەکە وێڕای سوودوەرگرتنی لەو کتێب و سەرچاوانەی کە کەم تا زۆر باسی مەولانا و بنەماڵەکەی دەکەن، بەڵگەنامەکانی ناو ئەرشیڤخانەی عوسمانی کردۆتە سەرچاوەی سەرەکی و لەو ڕوانگەوە زانیارییەکانی پێشووی ناو کتێب و سەرچاوە نووسراوەکانی هەڵسەنگاندووە و زانیاری بۆ زیادکردوون و ڕاستی کردوونەتەوە، وێڕای ئەوەی هەندێ گومانیشی خستوونەتە ڕوو بەڵکو لە ماوەی دادێ و لە توێژینەوەی دیکەدا توێژەران زانیاری زیاتر پەیدابکەن، بەتایبەتی سەبارەت بە کوڕ و خێزانەکانی مەولانا.

توێژینەوەکە بەشی زۆری ئەو بەڵگانەی خستۆتەڕوو لەبارەی مەحموود ساحێبی برای مەولانا و یەکێك لە خەلیفە و جێگرەوەکانی کە دوای مەولانا ڕۆڵێکی گرنگی لە کوردستان و لە شام و لە حیجاز هەبووە و ڕوانینی عوسمانییەکان سەبارەت بەم کەسایەتییە دەخاتەڕوو، هەروەك ئەسعەد ساحێبی کوڕیشی کەسایەتییەکی دیکەی کاریگەری ئەو بنەماڵەیەیە و ئامادەکاری کتێب و نامەکانی مەولانایە و لەم ڕووەوە بە نامەی تایبەتی مەقامی سەدارەت لە نووسراو و کتێبەکانی مەولانا ئاگاداردەکاتەوە. هەروەها ستی خانمی خێزانی مەولانا کە یەکەم ناوی لە ڕێی ئەم توێژینەوەیە دەکەوێتە نێو ناوان و نامەی تایبەتییەکەی بۆ مەقامی سەدارەت و تەمەن و ساڵی وەفاتەکەی دەستنیشان دەکات، وێڕای زانیاری لەبارەی نەجمەددینی کوڕی پاش مەرگی مەولانا و فاتیمە و سارا خانی کچی. بە ئومێدی ئەوەی ئەم زانیارییانە چەند لایەنێکی ژیانی ئەو بنەماڵەیە ڕوون بکەنەوە و ببێتە دەسپێکێك بۆ ئەوەی زانیاری دیکە چ لەبارەی خودی مەولانا و چ لەبارەی بنەماڵە و خەلیفەکانی بکەوێنە بەردەست و دیواری توێژینەوەی ژیان و بەرهەمەکانی ئەو ڕابەرە پتەوتر بکەن.

2- برای مەولاناخالید:

1-2 مەحموود ساحێب:

ناوی (مەحمود ساحێب کوڕی ئەحمەد بووە لە ساڵی 1197-1783ی میلادی لە قەرەداغ لەدایك بووە، ناوبراو پێش باڵغبوونی لەلای مەولانا پەروەردە و گەورە بووە و قورئان و دەسپێکی زانستەکانی فێرکردووە، پاشان لەسەر دەستی ئەو خوێندن تەواو دەکات و دەگاتە ئاستێکی بەرزی ڕۆشنبیری و زانستی و حاڵ و مەقامەکانیش تەواو دەکات و مەولانا ئیرشادی دەکات و دوای ئەو دەبێتە خەلیفە..... کە مەولانا دەچێتە بەغدا ئەو دەبێتە شوێنگرەوەی لە خانەقای سلێمانی، هەروەها کە مەولانا دەچیتە شام ئەو بە نوێنەرایەتی مەولانا دەچێتە حیجاز و پاشان دەگەڕێتەوە دیمەشق و بە فەرمانی مەولانا دەگەڕێتەوە سلێمانی بۆ ئەوەی پەرە بە تەریقەت بدات، بەو جۆرە بەردەوام دەبێت تا مەولانا وەفات دەکات و دوای پینج ساڵ لە وەفاتی براکەی، دەچێتە دیمەشق لە مزگەوتی عەداس دەمێنێتەوە و لەسەر بەرماڵی ئیرشاد دادەنیشێ و هەموو موڵکە وەقفەکانی براکەی دەکەونە بن دەستی ئەو، پاشان دەچێتە حیجاز و حەفت ساڵان دەبێتە دراوسێی کەعبە، دوای ئەوە دەگەڕێتەوە

---

[1] سەبارەت بە ساڵی لەدایکبوونی، بۆچوونی جیاواز هەن، بەڵام د. عەبدولجەبار کاڤاك لە تێزی دکتۆراکەی خۆیدا دوای هێنانەوەی هەموو ئەو بۆچوونانە، ئەو بۆچوونە بەڕاست دەزانێ کە لە ساڵی 1779 لەدایك بووە. بڕوانە:
Abdulcebbar KAVAK, Mevlânâ Hâlid-İ Bağdadî Ve Hâlidî Tasavvuf Geleneğinin Tarihi Gelişim Süreci, Doktora Tezi, Atatürk Üniversitesi, Erzurum 2013 2013,s. 32

دیمەشق و خەلیفەکانی خۆی دەنێرێتە وڵاتانی وەك هیند، بوخارا، دیاربەکر، سنە و بەغدا. سوڵتان عەبدولحەمید ڕێزی دەگرێت و تەکیەیەکی بۆ دروست دەکات لە شام بەناوی تەکیەی سلێمانیە، هەروەها وەکیل و وەزیفەداری بۆ دەرسدانەوە بۆ دادەمەزرێنێ، لەو شوێنە دەمێنێتەوە تا لە تەمەنی 86 ساڵی و لە ساڵی 1283-1866 وەفاتی کردووە. ناوبراو ڕێزی زۆری هەبوو لە دڵی خەڵکیدا و خەلیفەکانی بە زۆری لە دیمەشق بوون وەك شێخ ئەحمەدی سمینی بەغدادی و مەلا ئەبوبەکری کوردی گەلاڵی و موحەممەد القرمشلی و عەبدولفەتاح ساحێب. ناوبراو دوو کوڕی لەدوای خۆی جێهێشتن ئەوانیش شێخ محەمەد ئەسعەد ساحێب و مەولاناخالید ساحێب بوون.[2]

لەو کاتەی مەولانا وەسیەت دەکات ژنبراکەی خۆی وەك خەلیفە و سەرپەرشتیاری ماڵ و منالّی دیاردەکات (مەولانا هێشتا کە ساغ بووە سەیید ئیسماعیلی غەززی کە ژنبرا و خەلیفەی بووە بانگ ئەکا، هەروا چەند کەسێکیش لە خولەفا و مەنسووبین بانگ ئەکا و ئەیانکا بە شاهید کەوا لەپاش وەفاتی خۆی شێخ ئیسماعیلی هەنارانی خەلیفەی موتڵەقی بێ بۆ ڕێپیشاندانی مسوڵمانان و بەسەر هەموو خەلیفە و مریدەکانیا فەرمانڕەوا بێ و وەصییش بێ بەسەر ماڵ و مناڵەکەیەوە بۆ خزمەتکردن و بەڕێوەبردنیان لە هەموو بابەتێکەوە تا بمێنێ و پاش ئەویش شێخ عەبدوڵڵای هەرانی و پاش ئەویش شێخ عەبدولفەتتاحی عەقرەیی. مەولانا ئەفەرموێت مادەم ئیسماعیل هەبێ، من وەکوو مردبم وایە. هەروەها وەسیەت ئەکا کە هەموو موڵکەکانی کوردستانی بۆ شێخ مەحموود ساحێبی برای بن)[3] دوای ئەوەی بە هۆی نەخۆشی تاعوونەوە بەشی زۆری خەلیفەکانی مەولانا وەفات دەکەن، (لە سەردەمی سوڵتان عەبدولمەجیدی عوسمانیدا ڕێ و شوێنی کاری ئیرشاد و دەرسوتنەوەی عولوومی دینی ئەگۆڕێ و فەرمانی سوڵتانی دەرئەچێ کە شێخ مەحموود ساحێب ببێ بە مورشیدی تەکیەی خالیدییە لە شام و ئەو جێگەکەی شێخ عەبدولفەتتاح ئەگرێتەوە)[4].

مەحموود ساحێب برای هەرە بچووکی مەولانا بووە، سەبارەت بە دەسپێکی ژیانی، مامۆستا عەبدولکەریمی مودەڕیس پێی وابووە ناوبراو دەسپێکی ژیانی لە کوردستان بووە، چونکە (مەولانا تا سەفەری یەکەمیشی لە سولەیمانییەوە بۆ بەغدا بە ماڵەوە، دایکیشی لە ژیانا بووە و دوو برای بووە گەورەکەیان ناوی حەمەخان (موحەممەد خان) بووە و بچووکەکەیان ناوی "مەحموود" بووە کە مەشهووورە بە "مەحموود ساحێب"، ئەم برا بچووکەیان تەریقەتی لەسەر دەستی مەولانا وەرگرتووە و سولووکی لا کردووە و بووە بە خەلیفەی و یەکێکیش بووە لە خەلیفە بەهرەدارەکانی.[5]

لەبارەی مەحموود ساحێبەوە چەند بەڵگەیەکی بابەت جیاواز هەن، دەکرێت لە ڕوانگەی جۆراوجۆری بابەتەکانەوە پۆلێنیان بکەین:

1-1-2: ئەو زانیاریانەی سەرەوە کە باسیان لەوە دەکرد مەولانا ماوەیەك لە حیجاز ماوەتەوە، بەڵگەنامەکان پشتڕاستی دەکەنەوە، دیارە لە مەککەش بڕێك ئازووقەی بۆ تەرخانکراوە و کە دەگەڕێتەوە مەملەکەتیش دەوڵەت هاوکاری ناوبراو دەکات و بە کەسێکی ئەهلی کەرامەت و ڕێزلێگیراو هەروەها خاوەن مورێدێکی زۆر ناوی دەنێت:

حەزرەتی مەزن و بەهیممەت و ڕەوشت جوان و بەرەحم و پایەدار[6]

بڕی 250 قرووش مووچە و چوار خرار گەنم بۆ شێخ ساحیب ئەفەندی برای حەزرەتی مەولاناخالید (قدس سره الواحد کە لە شامێ ئەسپەردەی خاك کراوە) تەرخانکرابوو. لەگەڵ ئەمانەدا 5 باتمان (هەر باتمانێك هەشت کیلۆیە) ڕۆنی سادە، پازدە باتمان گۆشتی مەڕ، برنج، ڕۆنی زەیتوون، نیسك و چوار باتمان سابوون، پەنجا باتمان ڕەژوو و سێ باتمان سووتەمەنی، کە پێشتر لە مەککە دەماوە و پاشان کە هاتە شامێ بۆی تەرخانکرابوو. شێخی ناوبراو خاوەن مەسرەفێکی زۆرە و مورێدەکانی زۆرن و ئەو مووچە و گەنمەی باسکرا بەشی ئەو ناکات و بەو هۆیەوە تووشی تەنگاسی و گوزەران خراپی دەبێت. ناوبراو لەبەرئەوەی شایستەی چاکەلەگەڵکردنی ئێوەی مەزنە، ئەو هەشت خاڵانەی باسکران با وەك جاران لە ئێستاوە بۆی تەرخان بکرێت و ئەمەش بە نووسین

---

[2] مولانا خالد النقشبندی ومنهجه فی التصوف، الدکتور جواد فقی علی الجوم حیدری، دار الکتب العلمیة، بیروت، بدون سنة الطبع، ص 34

[3] یادی مەردان (مەولانا خالیدی نەقشبەندی)، مەلاعەبدولکەریمی مودەڕیس، بەرگی یەکەم، بڵاوکراوەکانی کۆڕی زانیاری کورد، بەغدا، 1979، ل 54

[4] یادی مەردان، سەرچاوەی پێشوو ل 56

[5] یادی مەردان، ل 57

[6] I_DH_00079_003935_001_001

بۆی بنێردرێت. لەبارەی دانی ئەو شتانە، ئەو ڕەوشە وەك پەراوێزێك بۆی بنێردرێت. بۆ دانی ئەو شتانەش دەبێ بەڵگە (سەنەد)ی دەوڵەتی لەدەست دابێ، بەڵام چونکە هیچ بەڵگەیەکی لەدەست دا نییە هاوپێچ لەگەڵ ئەو شتانەی باسکران بیدرێنێ. ئەو کەسە لەو زاتانەیە کە ئەهلی حاڵن (خاوەن کەرامەت) و بە دوعایەکانی بەرەکەت دروست دەبێ و لەو زاتانەیە کە دەبێتە دوعاگۆی ئەشرەفی ملوکانە(پادشا)، ئەو شتانەی کە باسی ئەوان بوون بیدرێتێ[7].

2-1-2: ئەو مووچەیەی کە بۆ مەحوود ساحێب تەرخانکراوە، دیارە بە گوێرەی بەڵگەنامەکان بەشی زۆری بۆ خانەقا و سۆفی وموریدان و نەدارانی تەرخانکردووە و ئەنجومەنی دادگا پەسنی ناوبراو دەدات و داوا لە وەزارەتی دارایی دەکەن مووچەکەی نەبڕدرێت:

وەزیری دارایی[8]

نووسراوی ئەنجومەنی ژمێریاری دارایی کە بە نووسراوی پادشای بەڕێزەوە بۆ ئەنجومەنی مەزن نێردراوە، وەها دەڵێت: شێخ محەمەد ساحێب ئەفەندیی برای حەزرەتی مەولاناخالید (قدس سره الواحد کە لە شامێ ئەسپەردەی خاك کراوە) لەبەر نەداری و گوزەران خراپی، لە گەنجینەی شامی شەریف و والیی مەزن بڕی 650 قرووش مووچەی بۆ تەرخان کردبوو، لە ئێستاوە بۆ لەمەودوا لەلایەن گەنجینەی شامی شەریفەوە بدرێت. پێش ئێستا لە هەرێمی ئەوەوە دەستوور درابوو و لەو بوارەشدا بە پێی فەرماننامەی سەدارەت، ناوبراو ئەو دوو مۆرەی کە پێیان دابوو ناردوویە. ئەو بڕە مووچەیەی کە باسی لێوەکرا، تێیدا 250 قرووشی لە ساڵی 57دا لە گەنجینەی شامی شەریف و 400قڕووشیش لە ساڵی 59 دا ڕەوان کراوە. ئەو مووچەیەیی والیی شامێ پێشتر خوالێخووشبوو عەلی پاشا تەرخانی کردبوو.

ئەیالەتی ناوبراو، دوای ئەوەی کەوتە ناو تەنزیماتەوە[9] بۆ ئەوەی ئەو پشێوی و کەس بە کەس نەبوونە نەمێنێ، مووچە نادرێ. یانیش شیخی ناوبراو بە گوێرەی ئەوەی لە نووسینەکە ئەوەی لێ دەفامرێتەوە، کە گوزەرانی خراپە و ئەویش زانایەکی خاوەن وەجد و حاڵە، لەبەر هەندێ شایستەی چاکەلەگەڵ کردنە. ئەو موچەیەی کە باسی لێوەکرا، وەك هاوشێوەکانی لە هاتنی بۆ هەرێمی وی، مانگ بە مانگ بیدرێتێ. یەك لەم دوو خاڵانە کامەیان جێی ڕەزامەندیی ئیرادەی پادشایی بێ دەبێ، بەو شێوەیە ئێمە تکا دەکەین.

لە نووسراوەکەدا ئەوەی لێ دەخوێندرێتەوە کە، شێخی ناوبراو برای حەزرەتی مەولاناخالید (قدس سره الواحد)ە و بەخۆیشی لەو زانایانەیە کە گومانی باشی پێ دەبردرێت. دەرهەق زاتی وەك ئەمانە، موساعەدەی سەنییەی حەزرەتی شەهەنشاهی (پادشا) کە شایستەی ئەوانە، ئەو مووچەیەی کە دەیدرێتێ، چەندەی لەسەر ناوی ئەویش بێ، بەو پێیەی لێی ڕیوایەت دەکەن، لە نەدار و دەروێشی خانەقا سەرف دەکرێت. بڕینی ئەو مووچەیە دەبێتە هۆی گوزەران خراپی نەدار و دەروێشان و دڵشکانیان. ئەوەش ڕاستییەکەی دەرهەقیان کارێکی ناڕەوایە. ئەو بڕە پارەیە بۆ جەنابی سەنییەی مەکانەتی حەزرەتی شاهانە دەبێتە دوعای بەخێر و سەدەقەی سەری شەوکەت ئەفسەری حەزرەتی ملوکانە (پادشا)، ئەو پارەیەی باسکرا 650 قڕووش وەك لە مەزبەتەی ناوبراو باسکرا، خاڵی دووەم قبوڵ بکرێت و بۆ ئەفەندیی ناوبراو مانگ بە مانگ لە هاتنی مووچە بۆ هەرێمەکەیان، بیدەنێ. هەروەها ئەو دەستوورنامە (بەرات)ی کە پێویستە بینێرین و تا گەنجینەش ئەوە جێبەجێ بکات، ئەوا ئێمە بۆ گەنجینەی ڕەوان دەکەین. ئێمە ئەو ئەمرە بۆ وەزارەتی ناوبراو دەنێرین، ئەمەش لە ئەنجومەنی مەزنەوە قبوڵ کراوە کە ئێوەش پێی ئاگادارن. ئەمر و فەرمانی حەزرەتی (من لە الامر)ە.

لە 15ی زولقەعیدەی ساڵی 1262ی کۆچی

لە 4ی کانونی یەکەمی ساڵی 1846ی ڕۆمی

مۆر: ئەنجومەنی دادگا

---

[7] سوپاس بۆ بەڕێز (Nurettin ERTEKİN) کە لە وەرگێڕانی بەڵگەنامەکان هاوکار بوو.

[8] I_MVL_00078_001507_001_001

[9] دوای ئەوەی کە فەرمانی تەنزیمات خوێنرایەوە-ئەم مێژووە لە دیرۆکی عوسمانییەکان گرنگە- بە پێی ئەو تەنزیماتە دەبێ دەوڵەت لە نوێوە دابمەزرێتەوە.

2-1-3: باسکردنی هەندێ لەو موڵك و زەوییانەی کە لەبن سەرپەرشتی خانەقای مەولاناخالید بوون لە شاری سلێمانی و بەغدا، دیارە کێشە و گرفتییان بۆ ئەو ئاش و بیر و موڵکانە دروست کردووە کە لە چەند گوندێکی نزیك سلێمانی بوون، پێشتریش خودی مەولانا خالید ئاگاداری ئەم موڵکانە بووە و دوای مردنی مەولاناش مەحموود ساحێب داوای لە ئەیالەتی بەغدا کردووە کە ئەو گرفتانە چارەسەر بکات:

بۆ والیی بەغدا[10]

ئەو کاتەی حەزرەتی مەولانا خالید لە ژیاندا بوو و لە ئیالەتی بەغدا و لە سلیمانییێ لە خانەقادا (لەو شوێنەی کە بۆ ڕەزامەندی خودایە و ئەو شوێنەیە کە تا مێوان نەکەونە بەر منەت و تێیدا دەروێش و هەژار و فەقێ تێیدا دەخەون و خواردن دەخۆن و) و خەلیفایەتی و ئیرشادی تێدا دەکرد، بۆ خەرجیی ئەو خانەقایە گوندەکانی کەدان، دارکۆ، کرالی و حالە، لە چەمی کورەکچییان دوو، لە ناو چەمی کرالیدا دوو، بەگشتی چوار ئاش، لە خوار شاری سلێمانیش وێڕای زەوییەك بیرێکیش و لە هەرێمی خەراجییانیش وێرای زەوییەکە بیرێکیش و ئەوانە هەموویان لە تەرەفی خانەقاوە ئیدارەدەکران. دواتر لەلایەن هەندێك کەسەوە گرفت و ئاستەنگی بۆ ئەو ئیش و کارانە هاتنەپێش، بۆیە بۆ لابردنی ئەو گرفت وئەو ئاستەنگییانە نووسراویش بۆ خوالێخۆشبوو نەجیب پاشا ڕەوانکرابوو، بەڵام پێویستییەکانی ئەو نوسراوە و ئەمر و فەرمانی مەزن جێبەجێ نەکران. مەحموود ساحێب ئەفەندی برای مەولانا خالیدیش عەرزوحاڵێکی دابووە مەقامی پادشایی بۆ ئەوەی ئەو ئاستەنگییانە نەمێنن و وەك جاران ئەو موڵکانە بکەونەوە بن دەستی خانەقا و داهاتەکانیان بۆ خانەقا بچێتەوە کە پێشتر بۆ خانەقا تەرخانکرابوون. ئەم عەرز و حاڵەش بە دەست پێشکەشی وەزارەتی دارایی کراوە. لەو سۆنگەوە لە هەرێمی مەحمود ساحێب ئەفەندییەوە تا ئیستا هیچ نوسراوێك بۆ ئێمە نەهاتووە، حەقیقەتی ئەو بابەتە چییە، هێشتا ئێمە هیچی لێ نازانین، بۆیە بۆ ئەوەی پێویستییەکانی ئەم عەرزو حاڵە جێبەجێ بکرێت، لە هەرێمی خاوەن ئەو عەرزو حاڵەوە و لەلایەن شەریعەتی شەریف و ئەنجومەنەوە لێکۆڵینەوە بکرێت و بە مەزبەتەیەك ڕاستیی بابەتەکە بۆ ئێمە شرۆڤە بکرێت و بنێردرێت. وەزیری داراییش ئەمەی ڕاگەیاندووە و بە نوسراوێك روونی کردۆتەوە، لەبەرئەوە دەرحەق ئەمە بەم شێوە دەست و برد و جێبەجێ کردن پێویستییە.

2-1-4: مەحموود ساحێب لە شام گرفتی بۆ دروست دەکرێت و ئازار دەدرێت، دەگاتە ئەو ڕادەیەی کەوا لە خانەقا دەریبکەن، وێڕای ئەوەش دزی لێدەکەن و دواتر بە شاهیدی دانی بە درۆ مافەکەی لێ زەوت دەکەن و ناهێڵن مافی خۆی وەربگرێت، لەبەرئەوە نووسراو بۆ ویلایەتی شام دەنێردرێت و داوای ئەوەی لێ دەکرێت کە ناوبراو بگەڕێندرێتەوە سەر خانەقاکەی و پەسن و ستایشێکی زۆر دەکرێت و نیگەرانبوونی ئەو بە نیگەرانبوونی خەلیفە و خەلافەت دادەنێن:

بۆ حەزرەتی والیی شامی شەریف[11]

خانەقای خالیدییە کە لە ئەسەری بەهەشتی حەزرەتی سوڵتان سلێمان خانە و لە شامی شەریفەیە، شێخ ساحێب ئەفەندی کە هەم جێنشین و خەلیفەی ئەو خانەقایەیە و هەم برای حەزرەتی مەولانا خالیدە و لە خانەقا دەرکراوە و لە جێی ویدا یەکێکی دیکەیان دامەزراندووە. لە هەندێك لە ژوورەکانی خانەقادا کەرەستەی سەربازی داندراوە، پێش ئێستا هەندێك پارەی ئەو (شیخ ساحێب) دزرابوو، لەسەر ئەو دزییە هەر وەك ئاشکرایە مافەکەی دیارە، بەڵام لەلایەن دوژمنەکانییەوە بە شاهێدیدانی بەدرۆ مافەکەی ون کرا و سەرەڕای ئەوە ڕقیشیان لێ هەڵگرتووە. جا بۆ ڕاییکردنی پێویستییەکانی، عەرزو حاڵ نێردراوە. ناوبراو لە مەشایخانی مەزنی تەریقەتی نەقشبەندییە، ئەسحابی قلووبە و بەتایبەتیش برای دایبابی کەسێکی وەك مەولانا خالیدی قەدر بڵندە. بە لادانی ئەو لەو خانەقایەدا، کە دەرحەقیشی بێڕێزی و بێفەرمانی کراوە. مافی بەرچاوی بە شاهیدانی درۆزن لێسەندراوەتەوە، ئەوەش بە دڵنیایی کارێکی ناشایستەیە. ئەو پەیوەستی و رابیتە باشەی و بە نەسەبێکی دروست و بە زاتێکی وەك مەولانا خالید کە سەرۆکی ویلایەتییە پەیوەندیدارە. ئەو ڕووداوە کە بۆتە هۆی دڵشکانی ئەو زاتە بێگومان جێی ڕەزامەندیی پادشا نییە. لەسەر ڕێبازی نرخدانان و بە پێی پێویستی کار و خەباتی دەوڵەت دەرحەق ناوبراو، لیژنەیەکی بەحورمەت و بەڕێز پێك بهێنن، ئەو خانەقایە وەك پێشووتر ڕادەستی ناوبراو بکەنەوە. ئەو پارانەشی

[10] A_}MKT_MHM__00031_00025_001_001

[11] A_}MKT_UM___00378_00021_001_001

کەوا دزراون دیاربکەن و بۆ ئەوەی شکانی دڵی ئەو چاك بکرێتەوە و دڵخۆش بکرێتەوە دەبێ وەسیلەی تەواو بگرنەبەر. دەربارەی جێبەجێکردنی ئەو کارانەش مەزبەتەیەك بنێرن بۆ ئەوەی خانەقا وەك جاران بتوانێت وەزیفەی خۆی ببینێت و بۆ خەواندنەوەی نەدار و دەروێشانیش دەست و بردێکی بکەن. لەو بوارەشدا نووسراو (شوقە).

5-1-2: دابینکردنی چوار خرار گەنم لە ساڵێکدا و مووچەی مەحموود ساحێب لە شام:

حەزرەتی مەزن و بەهیممەت و رەوشت جوان و بەرەحم و پایەدار [12]

ساحێب ئەفەندی برای مەولانا خالید ئەفەندی کە لە گەورە مەشایخانە و لە شامێ ئەسپەدرەی خاك کراوە، ئەو زاتە ئێستا لە شامێ دادەنیشێت و لە گەنجینەی ئەوێدا 250 قرووش مووچەی بۆ تەرخانکرابوو، ئەو مووچەیە بەشی ئەو ناکات. ناوبراو لەو کەسانەیە کە خاوەن فەزڵن و بە دوعای مرۆڤ خەڵك بەرەکەتدار دەبن و دوعاگۆی سەڵتەنەت (پادشا)یە. بۆ هەندێك کەسی هاوشێوەی ناوبراو، ساڵانە لە عەنباری زەخیرەی ئەو دەڤەرەوە بڕێك گەنمیان دەدرێتێ. لەو سۆنگەیەوە بۆ ئەوەی ببێتە سەدەقەی سەری شەوکەتی شاهانە (پاشا) بۆ کەسی ناوبراویش لە عەنباری شامێ ساڵێ چوار خرار گەنمی بۆ ببڕێتەوە و بۆی تەرخان بکرێت. هەروەها مووچەیەکیش کە باسکرا کە پادشا فەرمان بکات و ئەو فەرمانەش وەك نووسراوێکی بچووك بە ئێمە ڕابگەیەنێت، پێشتریش نەجیب ئەفەندیی بە بەزمیی والیی بەغدا نووسراو ناردبوو، کە بۆ ناوبراو ئەو مووچەیەی کە تەرخانکراوە بڕیاری بۆ دراوە کە وەك پێشووتر بدرێت و لە پەراوێزی نووسراوەکەشدا بە ڕوونی لێی دەفامرێتەوە کە ناوبراو لەبەرئەوەی شایانی چاکەگەڵکردنی پادشا بووە، وەك ئەوەی ئێوە گوتوتانە دامەزراندن و تەرخانکردنی چوار خرار گەنم لە ساڵێك و بۆ مووچەکەش باسکراوە، بۆیە نووسراوێك لە فەرمانی پادشاوە بنووسرێتەوە و بنێردرێت.

6-1-2: پیرۆزباییینامەی مەحموود ساحێب بۆ سەدری ئەعزەم

ئەم نامەیەی مەحموود ساحێب مێژووی 1269/1/15ی کۆچی (بەرامبەر 1852/10/29ی میلادی) لەسەر نووسراوە، تێیدا بە زمانێکی پەخشانئامێزی پڕ لە ڕەوانبێژیی و بە زمانی تورکی بە بۆنەی هاتنە سەر کاری سەدری ئەعزەمی تازە، پیرۆزباییینامەیەك لە جیاتی خۆی و ساداتی نەقشبەندی و پیرانی تەریقەتەکە ڕادەگەیەنێت، تێیدا ئەوە نیشان دەدات کە ئەو بەندە بێدەسەڵاتە شەو و ڕۆژ بەردەوام دوعای دەوامی دەوڵەت دەکات و لە کاتی گەڕانەوەی لەگەڵ موریدانی بۆ شامی شەریف هەواڵی هاتنە سەر کاری سەدری ئەعزەم دەبیستێت، لەگەڵ هاوەڵانی زۆر کەیفخۆش بوونە و هیوای سەرکوتنیان بۆ خواستووە. لە کۆتایی پیرۆزباییینامەکەشیدا خۆی بە (مەحموود ساحێب خالیدی نەقشبەندی پۆستنشینی خانەقای سوڵتان سلێمان لە شامی شەریف) ناساندووە[13].

7-1-2 بەرهەمێکی مەحموود ساحێب ئەفەندی:

لە کتێبی (وسیلە-سادات سلسلەء نقشبندیەنك احوال تاریخیە وشمائل شریفەسنی متضمندر) ی (محمد لەتیف ئەربیللی) یە و لە ناسنامەی کتێبەکەدا لە کتێبخانەی زانکۆی ئەتاتورکی ئەرزەڕۆم نووسەرەکەی بە ناوی خلوصی زادە شێخ عەبدولقادر نووسراوە، کتێبەکە بە تورکی نووسراوە وەها باسی مەحمود ساحێب کراوە، کە برای مەولانا خالیدە و واریسی ئەحوال و مەحرەمی ئەسراری ئەوە، خاوەنی عیلم و عیرفان و فەزڵێکی زۆرە و کتێبێکی هەیە بە ناوی (نور الهداية والعرفان)[14]. بەڵام تا ئێستا ئەو کتێبەمان دەست نەکەوتووە.

---

[12] I_DH_00064_003197_001_001

[13] A.}TŞF. 00014.00030.001

[14] وسیلە-سادات سلسلەء نقشبندیەنك احوال تاریخیە وشمائل شریفەسنی متضمندر، خلوصی زادە شیخ عبدالقادر، سلانیك مطبعەسی، 1891، ص 88.

3-برازای مەولانا

3-1- ئەسعەد صاحێب

تا ئێستا زانیارییەکی تەواو و ورد لەسەر ژیانی شێخ ئەسعەد ساحیب دەستنەکەوتووە، بەڵام ئەوەی زانراوە ئەوەیە (ئەسعەد کوڕی مەحمود ساحێب سۆفییەکی بە ڕەسەن کورد، بنەچەکەی لە شارەزوورەوە بۆ دیمەشق هاتووە و هەر لەوێ لەدایك بووە و هەر لەوێش کۆچی دوایی کردووە.) [15] ئەم زاتە هەروەك خۆی لە پێشەکی کتێبەکەی باسی دەکات برازای مەولانا خالیدە:

(محەمەد ئەسعەد لە ساڵی 1271ك-1855ی میلادی لەدایك بووە. لای باوکی و چەند شێخێك تەریقەی نەقشبەندی وەرگرتووە، لەوانە: ئەحمەد سمین بەغدادی، عەلی ڕەزا خەرپووتی، ئەبوبەکر ئەربیلی، عیسا کوردی، ئەحمەد خالیدی زەملکانی کە چل ڕۆژ لای ئەو خەلوەی کردووە. ناوبراو سەرپەرشتی ختمی خواجەگانی لە تەکیەی سوڵتان سلێمان خان لە دیمەشق کردووە، ناوبراو لە ساڵی 1347ك-1928ی میلادی لە دیمەشق وەفاتیی کردووە و ئەم بەرهەمانەی بەجێ هێشتووە:

-الجواهر المکنونة الانیقة فی آداب الذکر والطریقة

-نور الهدایة والعرفان فی سر الرابطة والتوحد وختم الخواجکان

-الفیوضات الخالدیة نسبة الی عمه الشیخ خالد ذی الجناحین

-بغیة الواجد فی مکتوبات مولانا خالد.) [16]

3-1-1 یارمەتی عەتییەی سەنییە بۆ ئەسعەد ساحێب

لە بەڵگەنامەیەکدا کە مێژووی 9ی شەعبانی ساڵی 1301ی کۆچی (بەرامبەر 1884/6/4ی میلادی) لەسەر نووسراوە، تێیدا لە نووسراوێکی ڕەسمیی مابەینی هومایۆندا یارمەتیی سەنییەیان بۆ هەر یەك لە شێخ مەحموودی ابو الشامات ی شێخی تەریقەتی شازلی و ئەسعەد ساحێب خالیدی برازای مەولانا خالید بە شیاو زانیوە و بۆ یەکەمیان بڕی 1200 قڕووش و بۆ دووەمیان 300 قڕووش تەرخان کردووە[17].

3-1-2 کتێبەکەی ئەسعەد ساحێب بە دیاری بۆ خەلیفە دەنێردرێت

کتێبی (**بغیة الواجد فی مکتوبات مولانا خالد**) کە ژمارەیەك نامەی مەولانای تێدا کۆکراوەتەوە و ئەسعەد ساحێب لێکۆڵینەوەی لەسەر کردووە و ساغی کردۆتەوە، دوای ئەوەی ئەم بەرهەمەی ناوبراو چاپ دەبێت، ئەسعەد ساحێب نامەیەك بۆ خەلیفە دەنێرێت و چەند شتێکی تێدا باس دەکات، گرنگترینیان:

-دڵخۆشی خۆی دەردەبڕێ کە سەرۆك وەزیر گەیشتۆتە مەقامی سەدارەت و پێی وایە دڵخۆشییەکەی ئەوەندە زۆرە ناتوانێ دەریببڕێت و بینووسێت.

-ناوبراو باسی ئەوە دەکات کە پێش ماوەیەك تووشی نەخۆشی تا و حەمەماڵتا بووە و نەخۆشییەکە بڕستی لێ بڕیبوو و خستبوویە ناو جێگا، بەڵام هەر بەوەوە نەوەستاوە و بە دڵسۆزییەوە دوعای بۆ سەرۆك وەزیر کردووە و پێی وایە ئەو کات نەیتوانیوە پیرۆزبایی بنێرێ و ئێستا وەك قەرزێك پێویستە پیرۆزبایینامەکە بنێرێ.

-دەیەوێت بۆ سەرۆك وەزیری ڕوون بکاتەوە کە ئەو بە شەو و بە ڕۆژ خەریکی ڕێکخستنی نامەکانی مەولاناخالید بووە بەتایبەتی بەشە عەرەبییەکەی و هەروەها زیادکردنی پەراوێزەکان، بۆیە دوو دانەی لەو کتێبە بۆ ناوبراو ناردووە و داوای لێدەکات یەکێکیان بۆ مەقامی خەلیفە و ئەویتریشیان بۆ کتێبخانەی گشتی بارەگای ئیخلاسی دەوڵەتی بنێرێت تا لەوێ تۆماربکرێت.

---

[15] مکتوبات حضرة مولانا خالد المسمی بغیة الواجد، محمد اسعد صاحب زاده العثمانی النقشبندی، مکتبة سیدا، دیاربکر بدون سنة الطبع، ص 6

[16] الطریقة النقشبندیة واعلامها، الدکتور محمد احمد درنیقة، دار جروس برس، بدون سنة الطبع ومکانه، ص 126

[17] İ..DH.00919

-ئەسعەد ساحێب لە نامەکەدا دەڵێت من چاوەڕوانی ئێوەم هەر ڕەخنەیەکتان هەبێت.

-نامەکە لە شامی شەریفەوە نووسراوە و مێژووی 11ی نیسانی ساڵی 1333ی کۆچی بەسەرەوەیە کە دەکاتە 11ی نیسانی ساڵی 1917ی میلادی.

نامەکە لە ڕێگەی وەزارەتی ناوخۆوە بۆ سەرۆك وەزیر نێردراوە.

ئەم نامەیە دوای ئەوەی دەگاتە مەقامی سەدارەت، مەقامی سەدارەت دوای مانگێك لە 12ی مایسی ساڵی 1333[18]و بە ژمارەی 135/3894 داوا لە والی سووریا دەکات بەڵام بە ڕێگەی نووسینگەی وەزارەتی ناوخۆوە و لە لەلایەن تەڵعەت پاشای وەزیری کاروباری ناوخۆوە بۆ تەحسین بەگی والیی سووریە هەواڵ دەنێردرێت کە " ئەو نامەیەی کە بە ئیمزای ئەسعەد ساحێبی برازای حەزرەتی مەولانا خالیدی نەقشبەندیی بوو، بۆ ئێوەمان نارد، داواتان لێ دەکەین دەرحەق ئەم کەسە ئاگاهی و زانیاریی تەواومان بۆ بنێرن."

والی سووریاش دوای زیاتر لە بیست ڕۆژ لە 15ی شەعبانی ساڵی 1335 و 5ی حوزەیرانی 1333 بەرامبەر 5ی حوزەیرانی ساڵی 1917 بەم شێوەیەی خوارەوە باسی ناوبراویان بۆ دەنێرێت:

"ئەسعەد ساحێب ئەفەندی برازا و خەلیفەی حەزرەتی مەولانا خالیدە ، ئەو زاتە کەسێکی بە عیلم و فەزڵە و لە وڵاتدا شکۆ و ئیعتیباری هەیە، ئەخلاقێکی گەورە و هەمیشە ڕاستگۆی هەیە و پشتیوانی حکومەتیشە. لە داواکارییەکەی پێشووی ئێوەوە، کە باسی کتێبێ دەکات، لەو کتێبە نوسخەیەکی بۆ مەقامی مەشیخەتی شەیخولئیسلام ناردووە و بۆ ئەو مەبەستەش گەیشتە پایەی حەرەمەینی موحتەرەمەین. لەبەرئەوەی ناوبراو فەقیرە، پاداشتێکی نەقدی (خەڵاتێکی پارە)ی بۆ دابنرێت، تا ئەوە ببێتە هۆکاری دوعای خێر. لە هەر حاڵدا ئەمر و فەرمانی ئێوەیە."

لە وەڵامەکەی تەحسین پاشای والی سووریا ئەوەی لێ دەفامرێتەوە کە کتێبەکە پێشتر بۆ شەیخولئیسلام نارداروە و داوای بڕە پارەیەکیش دەکات وەك خەڵات بۆ ئەسعەد ساحێب تا لە دوعای خێر بێبەشیان نەکات. سەرنجەکە ئەوەیە ئەسعەد خۆی لە نووسراوە ئیمزاکراوەکەدا ئەو داوایەی نەکردووە، بۆیە بۆی هەیە زۆر جاران والییەکان لە جیاتی کەسە ناودارەکانەوە و بە ناوی ئەوانەوە داوای پارە و پوول بۆ خۆیان بکەن.

3-1-3 ئەسعەد ساحێب دەیەوێ بگەڕێتەوە وڵاتی خۆی

دیارە لە یەکێك لە سەفەرەکانی ئەسعەد ساحێب بۆ ئەستەنبوڵ، دەیەوێت بگەڕێتەوە وڵاتی خۆی، بۆ ئەو مەبەستە لە ئەنجومەنی وەزیرانەوە داوا دەکرێت کە خەرجیی چوونەوەی بۆ دابین بکرێت، تێیدا شەش هەزار قرووشی لە وەزارەتی دارایی بۆ دەرچووە:

زەبتنامەی تایبەتی نوسراوی ئەنجومەنی نوێنەران[19]/ 98

ساحێب زادە محەمەد ئەسعەد ئەفەندی کە برازا و خەلیفەی حەزرەتی مەولاناخالیدە دەگەڕێتەوە شامێ، جا بۆ ئەوەی خەرجی ڕێگا وەربگرێت، لەو خەرجییەی حیسابکراوە 6 هەزار قرووش و ناردنی ئەو بڕیارە بۆ وەزارەتی دارایی بڕیاری لەسەردراوە.

ئیمزا یوسف، عەبدولرەحمان، عارف حیکمەت، مەحموود، محەمەد ڕەفعەت.

4-1-3 چاپی دیوانەکەی مەولاناخالید

وەك زانراوە مەولانا خالید تا لە ژیاندا بوو، دیوانەکەی خۆی بە چاپکراوی نەدیوە، دوای مردنەکەی هەوڵدراوە بەشێك لە بەرهەمەکانی چاپ بکرێن، یەکێکیش لەو بەرهەمانە دیوانە شیعرییەکەی بووە کە زیاتر شیعرەکانی بە فارسی نووسراون، بۆ ئەو مەبەستە داواکاریی پێشکەش کراوە، هەر وەك لە فەرمانەکەدا هاتووە

[18] کە دەکاتە 12ی مایسی ساڵی 1917ی میلادی

[19] MV__00214_00049_001_001

داوای چاپکردنی 1200 دانە لە دیوانەکە دەکرێت، نووسراوەکەش لە مەجلیسی ڤالاوە بەرزدەکریتەوە، بەڵام بە تەواوی نازانریت بۆ سەرۆك وەزیرە یان بۆ کەسایەتییەکی تر نێردراوە و تێیدا ئاماژە بەوە دەدات کە بۆ هەر دانەیەك پێنج قرووشی خەرجی دەوێت و داوای ڕەزامەندی نواندن دەکات:

حەزرەتی مەزن و بەهیممەت و رەوشت جوان و بەرەحم و پایەدار[20]

حەزرەتی مەولاناخالید (قدس سرە الواحد کە لە شامێ ئەسپەردەی خاك کراوە) و لە گەورەکانی تەریقەتی بەرزی نەقشبەندییە، بۆ چاپکردنی بەرهەمێکی بە ناوی (دیوانی بەلاغەت) وەك 1200 دانە، بۆ بەرگکردنیان و چاپکردنێکی نموونەیی گرێبەستێك بە پێنج قرووش کراوە. دیوانی ناوبراو هەر دانەیەکی بە خەملاندن پێنج قرووشی خەرجی دەبێت و بەم شێوەیە بریاری لەسەر دراوە. بەو شێوەیە جێبەجێکردنی ئەم کارە کەوتۆتە ناو بەرنامەی تەقویمی وەزارەت و وەك راپۆرتێك دەستوورەکەیان داواکردووە. بۆ جێبەجێکردنی ئەم کارە پێویستمان بە دەستووری ئێوە هەیە.

5-1-3 چەند کتێبێکی تری ئەسعەد ساحێب:

1- بغیة الواجد فی مکتوبات حضرت مولانا خالد:

ئەم کتێبە لە باسی مەکتووباتەکانی مەولانا خالیدی نەقشبەندییە و تێیدا وێڕای باسکردنی تەریقەت و زنجیرەکەی و ئاداب و سیماکانی بەدرێژی، زیاتر لە سەد نامەی مەولاناشی لە خۆ گرتووە و پاشان چەند ئامۆژگارییەك و هەروەها بۆچوونی مەلا یەحیای مزووری لە کێشەی نێوان مەولانا و شێخ مارفی نۆدەیی لەخۆگرتووە، لەگەڵ چەند بابەتێکی تر. وا دیارە لە سەردەمی سوڵتان محەمەد ڕەشادەوە ئەم کتێبە نووسراوە، بۆیە لە کۆتاییدا پێشکەشی ناوبراو کراوە. کتێبەکە 320 لاپەڕەیە و ساڵی 1334ی کۆچی لە چاپخانەی الترقی لە دیمەشق چاپ کراوە. نوسخەی کتێبەکە لە کتێبخانەی شارەوانی گەورەی ئەستەنبوڵ بە ژمارە 0346 پارێزراوە.

2- الفیوضات الخالدیة والمناقب الصاحبیة

ئەم کتێبە ساڵی 1307ی کۆچی نووسراوە و لە ساڵی 1311 لە میسر چاپ کراوە.

3- نور الهدایة والعرفان في سر الربط والتوجه وختم الخواجکان

ئەم کتێبەش لە ساڵی 1305 نووسراوە و لە 1311 لە میسر چاپ کراوە.

لە دەستختەتێکیشدا کە کتێبی (العقد الجوهری فی الفرق بین کسبی الماتریدی والاشعری) ی مەولانا خالیی نەقشبەندی، شەش لاپەڕەی دەسپێك هی محەمەد ئەسعەدی کوری شێخ مەحموود صاحب نەقشبەندییە. کە وێڕای پێشەکییەکە لە سووچی چەند لاپەڕەیەکیشی سەرنجی خۆی نووسیون.[21]

4- لەبارەی خێزانەکانی مەولاناوە

هەموو سەرچاوەکان باس لەوە دەکەن کە مەولانا سێ ژنی هەبووە، تەنیا ریچ لە گەشتەکەیدا بۆ کوردستان، ئەوە نیشان دەدات کە چوار ژنی هەبووە: (ئەم بەیانییە شێخ خالیدی بەناوبانگ هەڵهات. لەگەڵ ئەوەشدا کە ڕاکردنەکەی لەناکاو و بەنهێنی بووە، بەڵام توانیبووی هەر چوار ژنەکەیشی لەگەڵ خۆی بەرێ.)[22] بەڵام تا ئێستا ئەمە نەسەلمێنراوە. سێ ژنەکانی مەولانا ئەمانەی خوارەوە بوون:

[20] I_DH_00083_004154_001_001

[21] بڕوانە دەستختەتی (*العقد الجوهری فی الفرق بین کسبی الماتریدی والاشعری*) لە کتێبخانەی مجلس شورای ملی، ژمارە 12386.

[22] *گەشتنامەی ریچ بۆ کوردستان 1820*، کلۆدیوس جەیمس ریچ، وەرگێڕانی محەمەد حەمە باقی، چاپی چوارەم، دەزگای موکریانی، دهۆك 2012، ل 299.

ژنێکیان کە خزمی خۆی بوو کەریمە یوسف ئاغای میکایەلی بە ماوەیەك دوای وەفاتی مەولانا کۆچی دوایی کردووە. ژنێکیان لە بەغدا بوو، لە سەفەری یەکەمی بۆ بەغدا دوای گەڕانەوەی لە هیند بۆتە ژنی لە ساڵی 1811ی میلادی. ژنێکی خەڵکی غەززەی فەلەستین بوو ناوی عائیشە بوو، دەکاتە خوشکی سەید ئیسماعیل غەززی خەلیفەی مەولانا، لەو کاتەی مەولانا لە بەغداوە دەگاتە دیمەشق لەوێ لە ساڵی 1822 دەبێتە ژنی.[23]

1-4 خاتوو عائیشەی خێزانی مەولانا

لەبارەی عائیشەخانمی خێزانی مەولاناوە، لە سەرچاوەکاندا بەو شێوەیە هاتووە کە ناوبراو "خەڵکی غەززەی فەلەستین بوو ناوی عائیشە بوو، دەکاتە خوشکی سەید ئیسماعیل غەززی خەلیفەی مەولانا، لەو کاتەی مەولانا لە بەغداوە دەگاتە دیمەشق لەوێ لە ساڵی 1822 دەبێتە ژنی[24].ئەوەی مەبەستە لێرەدا لە بەڵگەنامەکانی ئەرشیڤخانەی عوسمانی لەبارەی عائیشەوە زانیاری دەدات، کە ئەم عائیشەیە لە شام ماوەتەوە و دوای مردنی مەولانا خۆی و دوو کچەکانی بە ناوەکانی "فاتیمە" و "سارا"ن لەگەڵ حەوت کەس لە خانەوادەکەیان، دیارە لە مانگی مایسی ساڵی 1853 کە (26) ساڵ دوای وەفاتی مەولانا، ئەو خانەوادەیە تووشی هەژاری و دەستکورتییەکی لە ڕادەبەدەر دەبن و بەو هۆیەوە ناچار دەبن کە داوای بڕینەوەی مووچەیەك لە وەزارەتی دارایی خەلافەتی عوسمانی بکەن، بەڵام مەرجی ئەوسای مووچەی ناو دەوڵەتی عوسمانی ئەوە بووە تا شوێنی مووچەی مووچەخۆرێك بەتاڵ نەبێت، ناتوانرێت مووچە بۆ کەسی دیکە دابین بکرێت، لەو بارەشدا خانەوادەی مەولانا زانیویانە کە زەینەب خانمی کچی خلوسی بەگی برای راغیب پاشا وەفاتی کردووە و شوێنی موچەکەی بە بەتاڵی ماوەتەوە، بەڵام بە گوێرەی یاسای عوسمانی گرفتێك لەو مووچەیەدا هەیە، بۆیە تەنیا پەنجا قڕووش هەیە بۆ ئەوەی بدرێتە ئەو خانەوادەیە، بەمەش بڕیاری ئەوە دەدرێت کە ئەو پەنجا قڕووشەیە بە یەکسانی لە نێوان عائیشەی دایك و فاتیمە و سارای کچدا دابەش بکرێت، بەڵام لیژنەکەی دارایی ئەمەشی پێ کەمە و داوا دەکات سەرنج بدەنە مووچەی واڵا هەر کاتێك مووچەیەك بە واڵایی مایەوە دەست و بڕدێك بکەن و خەمێك لە خانەوادەی مەولانا بخۆن.

دارایی[25]

ئەو نووسراوەی کە لەلایەن داراییەوە بۆ ئەنجومەنی باڵا نێردراوە وەها دەڵێت کە: عائیشەی هاوسەری حەزرەتی مەولانا خالید(قدس سره الواحد) و فاتمە و سارا خانمی کچەکانی لەگەڵ حەفت کەس لە خانەوادەکەیان لە شامێ دەمێننەوە. لەبەرئەوەی ئەوانە دووچاری هەژاری بوونە، تەرخانکردنی مووچەیەکی گونجاو بۆیان، تا بێتە پێویستی ئیرادەی پادشایی، لە هەریمەکەیان ئەگەر مووچەیەك واڵا بوو ئەوا بیاندرێتێ. ئەمرنامەکەی ئێوە بە بەراتی مەزن کە گەیشتە دەستی ئێمە لەو کەسانەی کە لە شامی شەریفە دادەنیشن باسی ئەوە دەکات کە: بۆ زەینەب خانمی کچی خلوسی بەگی برای راغیب پاشای ڕەحمەتی، مانگانە خاوەنی 75 قڕووش و نەقشی خانمیش کە مانگانە خاوەنی 150 قڕووش بوو وەفاتیان کردووە، بۆ جێبەجێکردنی ئەو ئەمرنامەیە بۆ هەرێمێ نووسراو نێردراوە. ئەو مووچەیەیی کە نەقشی خانم وەریدەگرت لەبەرئەوەی تایبەت بوو و لە گەنجینەدا تۆماری نەبوو و ئەگەر بدرێتە کەسی تر ئەوا دژی سیستەمی دەوڵەتییە، دەبێت ئێمە ئەو مووچەیە نەخەینە بەرچاوی خۆمان. ئەو مووچەیەی کە زەینەب خاتوونیش وەریدەگرت کە 75 قرووشە، بەو پێیەی کە سیستەمی دەوڵەت ڕێگا دەدات لە 37.7 قڕووش هەتا 50 قڕووش دەبێ تەرخان بکرێت، بەو پێیە بێت:ئەو 150 قڕووش مووچەیەی باسکرا، تەرخانکردنی ئەو مووچەیە دژی سیستەمی دەوڵەتییە، ئەو مووچەیەش دەبێت لە گەنجینە بمێنێتەوە. ئەو 75 قڕووشەشی باسکرا، لەبەرئەوەی سیستەمی دەوڵەت ڕێ دەدا 50 قڕووشی هەر ئێستا لە نێوان عائیشە و فاتیمە و سارا خان دا بە یەکسانی دابەش بکرێت و با گەنجینەش جێبەجێی بکات. بەڵام مووچەی باسکراو زۆر شتێکی کەمە و ئەو کەسانەی شایستەی مەرحەمەتن بە خێری چاکەی حەزرەتی پادشاوە دەبێت زیادکردنێك کە بەشی ئەوان بکات جێبەجێ بێت. بۆ ئەم مەبەستەش زوو بە زوو لە مووچە واڵا بووەکان، چۆن هەر واڵا بوو لە هەریمەوە نووسراوێك بۆ ئێمە بنێرن. ئەو ڕەوشەش لە ئەنجومەنی باڵا بۆ وەزارەتی ناوبراو نێردراوە. لەو بوارەشدا ئیرادەی سەدارەتیش دەستوور بدات و ئێمەش بە گوێرەی ئەو ئەمرەکە جێبەجێ بکەین. لەو حاڵەشدا ئەمر و فەرمانی حەزرەتی (من له الامر)ە.

[23] *مولانا خالد النقشبندی ومنهجه فی التصوف*، جواد فقی علی الجوم حیدری، ص 33.

[24] سەرچاوە و لاپەڕەی پێشوو.

[25] İ_MVL_00262_009910_001_001

له شه‌عبانی ساڵی 1269ی کۆچی[26]

مۆر/ السيد محمد جه‌ماله‌ددین، خه‌یروڵلا ئه‌فه‌ندی نامیزاج. مۆر/ ئه‌حمه‌د شوکرو. مۆر/ مومتاز. مۆر/ السيد عه‌لی ره‌زا. مۆر/ شه‌کیب ئه‌فه‌ندی له لیژنه‌دا. مۆر/ محه‌مه‌د عارف. مۆر/ محه‌مه‌د ساڵح عه‌بد. مۆر/ مسته‌فا. مۆر/ السيد ابراهیم. مۆر/ السيد محمد نائیل، محه‌مه‌د ئه‌فه‌ندی له لیژنه‌که‌دا.

2-4 ستیی خێزانی مه‌ولانا

له‌باره‌ی ئه‌م هاوسه‌ره‌ی مه‌ولانا چه‌ند سه‌رنجێك هه‌ن:

1-دکتۆر جه‌واد چۆم حه‌یده‌ری له کتێبه‌که‌ی خۆیدا (مولانا خالد النقشبندی ومنهجه فی التصوف) گوتویه‌تی که مه‌ولانا چه‌ند ژنێکی هێناوه و تێیدا ته‌نیا باسی سێ ژن ده‌کات، ئه‌گه‌رچی ریچ له گه‌شته‌که‌ی خۆیدا بۆ سلێمانی ئاماژه به‌وه ده‌دات که مه‌ولانا چوار ژنه‌که‌ی له‌گه‌ڵ خۆی بردۆته سلێمانی، ئه‌و سێ ژنه‌ی باسکران تا ڕاده‌یه‌ك لای مێژوونووسان و توێژه‌ران ناسراون، به‌ڵام ئه‌وه‌ی له به‌ڵگه‌کان ناوی هاتووه (ستی)یه و دایکی نه‌جمه‌ددینه، به‌مه‌ش بۆ یه‌که‌م جار ئاشکرا ده‌بێت که ژنی یه‌که‌می مه‌ولانا کورده و ناوی ستی بووه. هه‌روه‌ها ئه‌م ژنه ده‌بێت له‌دایك بووی ساڵی 1780ی میلادی بووبێت، چونکه له‌و کاته‌ی ده‌یه‌وێت سه‌ردانی ئه‌سته‌نبوڵ بکات، له‌به‌ر پیرییه‌که‌ی ناهێڵن بچێت و له به‌ڵگه‌نامه‌که‌دا ئاماژه به‌وه ده‌که‌ن که ته‌مه‌نی زیاتر له 110 ساڵه، ئه‌و کاته‌ش ساڵی 1890 بووه. جا ده‌رده‌که‌وێت که ئه‌م ژنه هه‌مان ئه‌و ژنه نییه که له سه‌رچاوه‌کاندا باس ده‌کرێت (ژنێکیان که خزمی خۆی بوو که‌ریمه یوسف ئاغای میکایه‌لی به ماوه‌یه‌ك دوای وه‌فاتی مه‌ولانا کۆچی دوایی کردووه.)[27]. چونکه ستی خانم زیاتر له شه‌ست ساڵ دوای وه‌فاتی مه‌ولانا هه‌ر له ژیاندا بووه. ئه‌مه‌ش ئه‌وه‌مان نیشان ده‌دات که ناوبراو دایکی نه‌جمه‌ددینه و ژنی یه‌که‌می مه‌ولانایه و کوره‌کان هه‌موویان له ستینه.

له به‌ڵگه‌نامه‌که‌دا هاتووه: *ستی خانمی هاوسه‌ری حه‌زره‌تی مه‌ولاناخالید که له شامێ ئه‌سپه‌رده‌ی خاك کراوه، داواده‌کات ته‌وێل و هه‌نیه‌ی خۆی بخاته به‌ر ئاستانه‌ی ئێوه‌ی پیرۆز و موعه‌لا و به‌و شێوه‌یه به‌ندایه‌تی خۆی نیشان بدات و پێ ببێته خاوه‌ن شه‌ره‌ف. داواده‌کات خۆی بێته ئه‌سته‌نبوڵێ. جا بۆ ئه‌و هاتنه‌ی بۆ ئه‌سته‌نبوڵ بۆ ئه‌وه‌ی ده‌ستووری پادشایی وه‌ربگرێت سه‌ردانی ئێمه‌ی کردووه. ئێمه‌ش بۆ ویلایه‌تی سووریه‌مان ناردبوو، ناوبراو (ستی خانم) که ته‌مه‌نی گه‌یشتۆته 110 ساڵ و ته‌ندروستییه‌که‌ی دژواره و زۆر زه‌حمه‌ته بتوانێن. ئه‌گه‌ر داواکارییه‌کی هه‌بێت و عه‌رزی ئاستانه‌ی شاهه‌نشاهی بکات هاوپێچ له‌گه‌ڵ سه‌لامی ئه‌و ده‌نێرین. له‌سه‌ر ئه‌و ڕاگه‌یاندنه ئه‌و دوعاگۆیه‌ی که ناوی له سه‌ره‌وه هاتووه وازی له هاتنی بۆ ئه‌سته‌نبوڵ هێناوه. ئه‌و عه‌رزوحاڵه‌ی که داویه‌تی به نووسراوی ویلایه‌تی ناوبراو بوو، ئێمه‌ش پێشکه‌شی ئێوه‌ی ده‌که‌ین. له‌و بواره‌دا ئیراده و فه‌رمانی حه‌زره‌تی (من له الامر)ه.*

له 16ی ره‌بیعولئاخیری ساڵی 1308 و له 17ی تشرینی دووه‌می ساڵی 1306

له 29ی تشرینی دووه‌می ساڵی 1890

به‌نده‌تان یاوه‌ری ئه‌کره‌م/ ده‌روێش/ شام[28]

له وه‌ڵامی نامه‌ی ناوه‌ندیش بۆ والیی سوریه ئه‌وه هاتووه، که حه‌زره‌تی ستی خانم له‌به‌ر ته‌مه‌نه‌که‌ی دیاره ناتوانێ بێته ئه‌سته‌نبوڵێ، بۆیه ئه‌گه‌ر داواکارییه‌کی هه‌یه ئێوه بۆی بنووسن:

بۆ والیی سووریه[29]

حه‌زره‌تی ستیی هاوسه‌ری حه‌زره‌تی مه‌ولاناخالید داواده‌کات بێته ئه‌سته‌نبوڵێ، به‌ڵام ده‌رکه‌وتووه که ئه‌و پیر بووه و زۆر زه‌حمه‌ته له‌به‌ر ته‌ندروستییه‌که‌ی ته‌حه‌ممول بکات و ناتوانێت. ئه‌گه‌ر داواکارییه‌کی هه‌بوو که عه‌رزی خاکی به‌ر پێی پادشا بکات، له لایه‌ن ئێوه‌وه با بۆی بنووسرێت. ئه‌وه‌ی پێ بڵێن و پێی ڕابگه‌یه‌نن.

---

26 ئه‌م مێژووه ده‌بێته به‌رامبه‌ر مانگی مایسی ساڵی 1853ی میلادی.

27 *مولانا خالد النقشبندی ومنهجه فی التصوف*، جواد فقی علی الجوم حیدری، ص 33

28 Y__PRK_BŞK__00019_00091_001_001

29 Y__PRK_UM___00018_00053_001_001

له 25ی ئابی ساڵی 1306

له 6ی ئەیلوولی ساڵی 1890

2-دەقی نامەکەی ستی خانم کە بە خەدیجەش ناوی هاتووە و چەند داواکارییەکی هەیە و داوا دەکات دەستەڵاتدارانی عوسمانی بۆی جێبەجێ بکەن:

داواکاریی دوعاگۆتان[30]

خودای من، شاهەنشاهی بنکەی بەزەیی و ڕەحمەت کە بە منئەتەوە نیعمەتی داوەتە ئێمە و پادشای عالەمپەناهمان، گەورەمان هەتا هەتایە تەمەنەکەی، تەندرووستییەکەی، بەزەیی و بەخشندەییەکەی، مەرحەمەتی حەزرەتی ضل الله هەر زیاد بێت و بە سێبەری خەلافەتپەناهی هەموو بەندەکانمان بگەنە بن ئەو سێبەرە، ئامین.

ئەو کەنیزەتان، بۆ ئەوەی بگاتە ئامانج و ئاواتەکانی خۆی، لەبەر قاپی پیرۆزی ئێوەدا دانیشتووە و مژوولی تاعەت و عیبادەتە. لەبەر حورمەتی تەمەنم کە گەیشتۆتە کەماڵ، ئەو ئیستیرحامانەی کەنیزەکتان، لەسەر ئەو تیلگرافەی گەیشتۆتە دەروێش پاشا و دەڵێت: ئەو عەرزو حاڵ لە تەڕەف سەدارەت پێشکەشی پادشا دەبێ، ئیمە جەسارەتمان کرد کە لە ژێرەوە هەندێك شتان داوابکەین.

یەکەمین: نیشتەجێیی بەهەشتی بڵند، مەرحووم و مەغفوور السلطان الغازی حەزرەتی عەبدولمەجید خان، خودا جێیەکی پاکی بداتێ. بە مەرحەمەتی خۆی لە سالحییەی شامێ لە کەناری سەفحی جەبەل ئەو تەکیەی کەوا لە بۆ غوس الواصلین، قطب العارفین مەولاناخالیدی دروست کردبوو. ئەو تەکیە لەو ڕۆژەوەی کە دروستکراوە هەتا ئەمڕۆ هیچ جار نۆژەن نەکراوەتەوە. لەبەرئەوە وەك وێرانەیەکی لێهاتووە. هاوپێچ لەگەڵ ئەمەدا دەرماڵەی ساڵانە و خۆراکی مانگانە کە لەلایەن سندووقی دارایی ویلایەتی شامەوە وەك پێنجیەك و بە تەنزیلاتی دیکە دەبوونە چواریەکی بۆ تەرخاندەکرا.

لەبەر هەندێ تەکیە لەبیرکراوە و لەناو تەکیەشدا ئەو دەروێشانەی کە بۆ زێدەبوونی قودرەت و ئیقبال و ئیجلالی وەلیبونیعمەتمان، پادشای بە مینئەتمان ،حەزرەتی گەورە و شاهەنشا، بە دوعاکردنی وەزیفەداران دڵشکاو بوونە. جا بۆ نۆژەنکردنەوەی ناچاربی تەکیە، تەخسیساتی ساڵانە وەك بڕە پارەی جاران بیدرێتێ. مووچەی خۆراکیش وەك جاران 1500 قرووش بدرێت و بۆ کوڕەکەشم شێخ نەجمەددین ئەفەندی بەڵگەیەکی ڕەسمی بدرێتێ. ئەوانە لە داواکارییەکانی منن.

دووەم: هەردوو بان و زەوی گوندەکانی ئەفتەریس و عەین تەرما کە سەر بە قەزای دومانە و ئەویش سەر بە ویلایەتێیە، بۆ تەکیەی قینوان و ماڵی مەولاناخالید وەقفکرابوون. ئەوانە وەك هاوشێوەکانیان لە باج هەڵاوێردکرابوون، ئەمساڵ لەلایەن گەنجینەوە جێگیرکراوە. بە داهاتی ئەو بان و عەردانە ئەو کەسانەی لە تەکیە دەمیننەوە و هەژار و ئەو ماڵانەی کە ژمارەیان دەگاتە 35 کەس و زۆربەی زۆریان پیرەژنێ بێ چارە و بەستەزمانن و بەو داهاتە ئیدارەی خۆیان دەکەن. دوای ئەو جێگیرکردنە ئەو بانە و عەردانە بێ چارە و بێ بەرهەم ماونەتەوە. باجی ئەو عەردو بانانە 200 قرووش خەمڵێنرابوو. بەلام موزایەدەکەیان دوو مانگی بەردەوام بوو و بە 3000 قرووش ئیحالەکرا. هەر چەندە باجی ئەوقاف وەك ئەو بانەیە ئیستا دەستووری فرۆشتنی ئەو باجانە نەشمێنێ، ئەو نرخی (3000 قرووش)ەی باسکرا وەك ئەوەی دیارە شتێکی زۆر کەمە. خانەقا و ماڵ لەلایەکی دی هیچ داهاتیان نییە. ئێوەش لە زیادبوونی هەژاران تەماشایەك بکەن، بۆ حورمەتی ڕۆحانیەتی مەولاناخالید وەك جاران لە باجێیان هەڵاوێرد بکەن.

مانگێ دە لیرەی عوسمانی کە لە 9ی جەمادولئەووەلی ساڵی 1292 لە ئەوقافی مەرحوومە و مەغفوورە دایکی حەزرەتی سوڵتان عەبدولعەزیزی ساکینی جەننەت تەرخانکرابوو و ئێستا ئەو هۆبە تایبەتە کە ئیستا بۆتە پاشکۆی وەزارەتی ئەوقافی پادشایی، لەسەر ناوی شێخ نەجمەددین ئەفەندی کوڕم وەردەگیرا، لەلایەن وەزارەتی ناوبراوەوە ناوی دەرچووە و دوای مامەڵەی پێویست لە لایەن ئەوقافی شامی شەریف بدرێت. بەو شێوەیە ئەو

[30] Y__PRK_BŞK__00019_00091_004_001

هەژار و نەدارانەی زۆر موحتاجن موحتاجیەکەیان نامێنێ و بە سایەی مەرحەمەتی پاشا پێویستییەکانی تەکیە دابین بکرێن.

سێیەمین: شەهەنشا کە نەسلی گەورەیە و پادشاش مەرحەمەتی بۆ هەبووە و خاوەن تەبیعەتە بۆ شەرەفی گەورەمان و سەییدمان عەبدولقادر گەیلانی و وەلییەگەورەکان منداڵەکانیان لە سەربازی دەبەخشن. مەولاناخالید لە موجەددیدەکانی تەریقەتی نەقشبەندییە، وەسیلەی حەیاتی ئەبەدییە، جگە لە کەرامەتی زاهیری و باتینی، ئەویش لە نەسلی عوسمانی کوڕی عەففانی کۆکەرەوەی قورئانە و یەك لە چوار یاری هەڵبژێردراوی حەزرەتی رەسولورەببیلعالەمینە. لەبۆ حورمەتی باپیرانی ئەو کەریمە و بۆ فەیزی رووحانیەتی، ئەولادەکانی لە سەربازیی ئازادبکە. ئیستیرحام و مەعرووزاتی من موحتاجی عینایەت و مەرحەمەتی حەزرەتی خەلیفەتپەناهییە کە جیهانی لەسەر خۆدا گرتووە. بێزەحمەت، بە کەرەمی خۆت، لەسەر ئەو داخوازینامەیەی من، بۆ نۆژەنکردنەوەی تەکیەی سالحییە، ئەو پارانەی کە بۆ نۆژەنکردنەوە تەرخانکراوە و خەملێنراوە و تەخسیساتی سالانە و مانگانەکەی وەك جاران بدرێت. هەروەها بۆ ئەو بانەو عەردانەی کە باسکران، هەڵاوێردکردنیان لە باجێ بە موتالەعەیەك کە لە سەدارەتتان دەرچووبێ بۆ دەروێش پاشا بنێردرێت. ئەو دە لیرەی عوسمانی (بانکنۆد-وەرەقە) لەلایەن بەڕێوەبەرایەتی ئەوقافی شامێ بدرێت و ئەولاد و نەوەکانی من لە خزمەتی سەربازی هەڵاوێرد بکرێن. تا ببێتە هۆی دوعای بەردەوامی تەمەن، عافیەت، مەرحەمە و رەئفەتی ضل الله و شەهریاری پڕ بە مەرحەمەت، ئێمە ئاواتەخوازین ئەو ئیستیرحانامەمان قبوڵ بکرێن. لە هەر بار و کاتێکدا ئەمر و فەرمانی حەزرەتی(من لە الامر)ە.

دوعاگۆ: هاوسەری مەولاناخالید

مۆر: خونچەی گولی باغی جینان

خەدیجە

3-ستی خانم سوورە لەسەر ئەوەی ئەگەر ئەویش نەتوانێ بچێتە ئەستەنبوڵ، دەبێ کوڕەکەی بنێرێت، بۆیە والیی سوریە عیصام نامە بۆ ناوەند دەنێرێت و بۆچوونی ئەوان وەردەگرێت ئاخۆ کوڕەکەی مەولانا بنێرن یاخود نا؟ :

ئاشکراکردنی ئەو کۆدەی کە لە ویلایەتی سووریەوە هاتووە[31]

لە پێشدا ئێمە ئەوەمان خستبووە ڕوو کە هاوسەری مەولاناخالید، نەمانهێشتووە بێتە ئەستەنبوڵ. هەندێك داواکاریی ئەو نزیکن بنێردرێن. ئەویش داوادەکا و ئیسرار دەکات کە کوڕەکەی بنێرێتە ئەستەنبوڵ. سەبارەت بەو حەرەکەتە، فەرمانمان بۆ بنێرن.

لە 28ی تشرینی یەکەمی ساڵی 1306

9ی تشرینی دووەمی سالی 1890

عاصم: والیی سوریە.

4-کوڕەکەی مەولانا داوای تەرخانکردنی مووچە بۆ شێخ ئەسعەد ساحێب دەکات:

دیارە یەك لەو داواکارییانە تەرخانکردنی مووچەیەك بووە بۆ شێخ ئەسعەد ساحێب، بۆیە والیی سوریا کۆدێك بۆ ناوەند دەنێرێت و ئەو هەواڵەیان پێ ڕادەگەیەنێت، کە:

ئەو کۆدەی کە لە ویلایەتی سووریەوە هاتووە[32]

---

[31] Y__PRK_UM___00019_00051_001_001

[32] Y__PRK_BŞK__00019_00091_003_001

لە1ی تشرینی دووەم ساڵی 1306، ئیرادەی سەدارەت، بە کوڕی حەزرەتی ستیی هاوسەری مەولاناخالید ڕاگەیەنراوە. بەڵگەی ڕەسمی لە نووسراوی ئێوەی مەزنەوە دەرچووە و سەبارەت بە تەرخانکردنی مووچەی شێخ ئەسعەد ئەفەندی گەیشتە دەستمان. پێویستییەکانی ئێوەمان جێبەجێ کرد.

لە 4ی تشرینی دووەمی ساڵی 1306

لە 16ی تشرینی دووەمی ساڵی 1890

محەمەد عاصم/ والیی سووریە

5-والیی سوریا عاصم وەڵامی داواکارییەکەی دەروێش پاشا دەداتەوە، کە نامەکەی خێزانی مەولانا و داواکارییەکەی تێدا هاوپێچ کرابوو، بەم شێوەیەی خوارەوە:

ویلایەتی سووریە[33]

بەڕێوەبەری نووسین

بۆ یاوەری حەزرەتی شەهریار دەروێش پاشا

حەزرەتی خاوەن شکۆی مەزن

تەلەگرافنامەی سەدارەتی مەزنتان بە کۆد و مێژووی 25ی ئاب بۆ هاوسەری مەولاناخالید پێشکەش کرا. لەو تەلەگرافەدا جەنابتان گوتوتانە: ستی خانمی هاوسەری مەولاناخالید داوادەکات بێتە ئەستەنبوڵ، بەڵام لەبەرئەوەی پیرە و بەو لەشە ناسکەوە بەرگەی ئەو بارەگرانەی سەفەرکردنێ ناگرێت. لەبەرئەوە پێی بڵێن: ئەگەر هەر داواکارییەکی هەبێت با عەرزو تەقدیمی پادشای بکات، لەگەڵ سەلامتان دەتوانین بنێرین. لەو تەلەگرافنامەیەتان بە مێژووی 27ی ئابی ساڵی 1306 دا وەك وەڵامی تەلەگرافنامەی پێشوو، عەرزو تەقدیمتان کردبوو کە ستی خانم وازی لە هاتنە ئەستەنبوڵێ هێناوە و عەرزوحاڵەکەی سەبارەت بە هەندێك شتە و ئێمە بە پۆست بۆتانی دەنێرین. عەرزوحاڵەکەی ستی خانم لە پەراوێزێدا پێشکەش کراوە. لە موتاڵاکردنی ئەو عەرزوحاڵەدا وەك چۆن کە مەعلوومی جەنابتان ببێ:

داخوازی یەکەم ئەوەیە کە نۆژەنکردنەوەی خانەقای مەولاناخالید کە کەناری جەبەل قیونی سالحییەیە و تەخسیساتی ساڵانە و خوردوخۆراکی مانگانە کە پێشتر کەمکرابوویەوە، با وەك جاران بدرێتەوە، جا بۆ ڕەسمیبوونی لەسەر ناوی نەجمەددین ئەفەندی کوڕیەوە بەڵگەیەکی ڕەسمی ئامادەبکرێت.

دوو: ئەو دوو باخ و عەردانەی کە بۆ خانەقا و ماڵی مەولاناخالید وەقفکرابوون و ئەمساڵیش وەك گوند و خەڵکی گوندی وەك وان لەسەر ناوی گەنجینەوە تۆمارکراون و جێگیرکراون، با لە باج هەڵاوێردبکرێن. هەروەها 10 لیرە ئەو پارەیەی کە نەجمەددین ئەفەندی مانگانە لە هۆبەی تایبەت کە ئێستا بۆتە پاشکۆی ئەوقافی پادشایی وەریدەگرت، با ئێستا لە لایەن بەڕێوەبەرایەتی ئەوقافی شامەوە بیدرێتێ.

سێ: ئەولادەکانی مەولاناخالید وەك هاوشێوەکانیان با خزمەتی سەربازییان پێ نەکرێت. خانەقای شەریفیش لە سالحییە بەراستی پێویستی بە نۆژەنکردنەوە هەیە. بەڵام وەك ئەوەی لێی دەفامرێتەوە خەرجیی نۆژەنکردنەوەیان نییە. جا بە گوێرەی لێدوانی خاوەنی عەرزوحاڵێ ئەو شتانەی پێویستن بۆیان بکرێت. سەبارەت بەوانە ئێمە چاوەڕێی بۆچوونی ئێوەی مەزنین. لەو بوارەدا ئەمر و فەرمانی حەزرەتی من لە الامره.

لە 4ی ڕەبیعولئاخەری ساڵی 1308 و لە 4ی تشرینی دووەمی ساڵی 1306

لە 17ی تشرینی دووەمی ساڵی 1890

بەندە/ والیی سوریا

مستەفا عاصم حوسێن

6- داواکارییەکان لەلایەن خەلافەتەوە جێبەجێدەکرێن:

---

[33] Y__PRK_BŞK__00019_00091_002_001

لە ڕێکەوتی 30ی تشرینی دووەمی ساڵی 1890دا بە نامەیەکی ڕەسمی لە نووسینگەی سەدارەتەوە فەرمانی پێ دەرچووە، بەم شێوەیەی خوارەوە:

بەو داخوازینامە (ئیستیرحامنامە)ی وەزارەتتان و پەراوێزتان موتالاکراوە. نۆژەنکردنەوەی خانەقای حەزرەتی مەولانا ئەو تەخسیساتی ساڵانەی خانەقا، خۆراکی مانگانە کە دەدرێن، بڕەکەیان وەك جاران بدرێت. دانی بەڵگەیەکی ڕەسمی ڕاوێژپێکردنتان بۆ شێخ نەجمەددین ئەفەندی کوڕی مەولاناخالید، ئەو زەوی و زارو باخەی کە بۆ خانەقای مەولاناخالید وەقفکرابوو، ئێستا دارایی خستویەتیە بن دەستی خۆی و با وەك جاران لە باج هەڵاوێرد بکرێت. حەواڵەکردنی 10 لیرە مووچەی شێخ نەجمەددین ئەفەندی[34] بۆ بەڕێوەبەرایەتی ئەوقافی شام، بەخشینی منداڵەکانی مەولاناخالید لە سەربازی داواکراوە. نۆژەنکردنەوەی خانەقا لەلایەن گەنجینەوە و زیادکردنی تەخسیسات و خورد و خۆراکیان، با بۆ حەوالەکردنی مووچەی شێخ نەجمەددین ئەفەندی لەلایەن بەڕێوەبەرایەتی بە گوێرەی عەرزو حاڵی جێبەجێکردنی ئەو کارە سەبارەت بە عەرد و زەوی و باخان وەك هاوشێوەکانی حەرەکەت بکرێت. ئەو خاڵانە بە ئیرادەی جەنابی خەلیفەتپەنای خاوەن شەرەف ڕاگەیەندراوە. لەو بوارەدا ئەمر و فەرمانی حەزرەتی من لە الامرە.

لە 6ی ڕەبیعولئاخەری ساڵی 1308 و لە 18ی تشرینی دووەمی ساڵی 1306

لە 30ی تشرینی دووەمی ساڵی 1890

سەرنووسەری حەزرەتی شەهریار/ سووریا

5-مردنی ستی خانم

تا ئێستا هیچ سەرچاوەیەکی مێژوویی باسی لە مێژووی وەفاتی ستی خانم و دوا خێزانی مەولانا نەکردووە، هەر وەك لە بەڵگەکانی پێشوو ئەوە ڕوون کرایەوە کە ستی خانم تەمەنی زیاتر لە 110 ساڵە و دایکی کوڕەکانی مەولانایە، بە گوێرەی بەڵگەیەکی تر دوای ئەوەی کە لەبەر پیرییەکەی ناتوانێ سەردانی ئەستەنبوڵ بکات، ساڵێك دوای ئەوە بە گوێرەی نووسراوی والیی سوریا ستی خانم لە 20ی ئابی ساڵی 1307 بەرامبەر 1ی ئەیلولی 1891 کۆچی دوایی دەکات:

بۆ سەرۆك نووسینی هومایۆن[35]

ج. لە 20ی ئابی ساڵی 1307، جەنازەی هاوسەری مەولاناخالید بە گوێرەی ئیرادەی حەزرەتی خیلافەتپەناهـ وەك ئەوەی شایستەی مەقامی مەولاناخالید بوو نەقڵ و ئەسپەردەی خاك کراوە.

لە 24ی ئابی ساڵی 1307، بەرامبەر 5ی ئەیلولی ساڵی 1891

مستەفا عاسم

والیی سوریا

5- لەبارەی کچەکانی مەولانا خالیدەوە

1-5 فاتیمە

فاتیمە لە ژنە فەلەستینییەکەیە و بەناوی فاتیمەی زەهرا کراوە، بە ساڵێك پێش وەفاتی مەولانا لەدایك بووە واتە ساڵی 1241ی کۆچی بەرامبەر 1825ی میلادی. فاتیمە ئافرەتێکی زیرەك و زانا و تێگەیشتو بووە، لەسەر ڕێباز و تەریقەتی باوکی بووە، زۆر لە ژنان لەسەر دەستی سوودیان وەرگرتووە، قورئانی هەموو لەبەرکردووە و فێری شیعر و نووسین بووە و قسەی بە چوار زمانی عەرەبی، کوردی، تورکی و فارسی کردووە، لە ساڵی 1280 بۆتە ژنی محەمەد خانی و کچێکی لێ بووە ناوی بەهیە بووە، فاتیمە لە ساڵی 1286

[34] Y__PRK_BŞK__00019_00091_001_002
[35] Y__PRK_UM___00022_00111_001_001

بەرامبەر ساڵی 1869 سەفەری حەج و زیارەتی مەزاری پیرۆزی پێغەمبەر دەکات و لە مینا کۆچی دوایی دەکات.[36]

1-1-5 نامەی فاتیمەخانی کچی مەولانا

هەر وەك پێشتر روونکرایەوە لە عائیشەی خێزانی مەولاناوە، دوو کچ بە ناوەکانی فاتیمە و سارا بەجێ مابوون، دیارە هەشت ساڵ دوای داواکردنی مووچە بۆ دایك و ئەو دوو کچانە، جارێکی دیکە فاتمە خانم دووچاری دەستکورتی و نەداری دەبێتەوە، بە گوێرەی بەڵگەکە ئەوەی لێ دەفامرێتەوە کە پێش ئەم هەشت ساڵە فاتیمە شووی نەکردبێت، بۆیە لەگەڵ دایکی و سارای خوشکی مووچەکەی بۆ دابەش دەکرێت، بەڵام ئەمجارە بە تەنیا داوای یارمەتی و برینەوەی مووچەی کردووە و وەك خاوەن موڵکێکی زۆر خۆی نیشان دەدا کە هەمووی لەبەر نەدارییان فرۆشتوونە. جا ناوبراو چۆتە ئەستەنبوڵ و لەوێ نامەیەك بۆ مەقامی سەدارەت دەنووسێت و باسی خراپی حاڵ و گوزەرانی خۆی تێدا بەیان دەکات و دیارە تاقیبی کەسێکی بەناوی شەرەف خانم کردووە کە مردووە و مووچەکەیشی 700 قرووشە، بۆ ئەوەی یاساکە بیگرێتەوە ناوی ئەو دێنێت و داوا دەکات ناوی بخەنە شوێنی ئەو پیرەژنە، لە هەمان کاتیشدا داوای ئەوە دەکات لەبەر ڕێز و حورمەتی خاکی مەولانای باوکی دەبێ ئەم کارەی بۆ بکەن. ئەمەش دەقی نامەکەیە:

داواکاریی بەندەی هەرە سووك و حەقیرتان[37]

ئەو کچەی دوعاگۆتان کە کچی حەزرەتی مەولاناخالید قدس سره الواحد کە لە شامێ ئەسپەردەی خاك کراوە، لەبەرئەوەی ماوەیەکە من دووچاری گوزەران خراپی بووبووم و ئەو موڵکانەی باجێ کە لە بن تەسەروفاتی مندا بوون، فرۆشتنم و پارەکانیانم لە خەرجییەکانی شتی پێویستدا خەرج کردووە. هەر لەبەر هەندێ بۆ گوزەرانەکەم شتێکم لەبەر دەست نەماوە. لەلایەنی گوزەرانەوە حاڵم خراپە و دووچاری پێویستی بوومەتەوە و دونیایەك قەرزم کەوتوتە ئەستۆ. بە متمانەی چاکەلەگەڵکردنی ئێوە ئەم جارە دەرحەق چاکەی ئێوەوە هاتومەتە ئەستەنبوڵ. لەبەرئەوەی شەرەف خانم کۆچی دوایی کردووە و 700 قرووش مووچەکەی واڵا بووە و بە چاکە و مەرحەمەتی خۆتانەوە لەبەر حورمەتی خاکی باوکی بە شەرەفم حەزرەتی مەولاناخالید و بۆ خێری تاجی جەنابی شاهەنشا، لەو مووچەی واڵابووی ئەو پیرەژنەی چۆتە بەر رەحمەتی خودا، برە مووچەیەکی گونجاو بۆ ئەو کەنیزەکەی خۆتان تەرخان بکەن و ئەو چاکەیش هەر لایقی جەنابی سەدارەتتانە. لە هەر بارێکدا ئەمر و فەرمانی حەزرەتی(من له الامر)ە.

دوعاگۆ

فاتیمەی کچی مەولانای ناوبراو

ئەنجومەنی باڵاش لە 31ی ئاداری ساڵی 1861 وەڵامی وەزارەتی دارایی دەداتەوە و وا نیشان دەدات کە موتاڵەعەی ئەو عەرز و حاڵەیان کردووە و بڕیاریان داوە: مەولانا خالید یەك لە ئەولیایانی مەزنە، لەبەر خاتری خاکی پیرۆزی ئەو، ڕزگارکردنی کچەکەی لەو گوزەران خراپییە پێویستییەکی گەورەیە. بۆیە ئێوە لێکۆڵین بکەن کە بەڕاستی ئەگەر ئەو مووچەیە واڵا بووە، بۆ تەرخانکردنی بۆ فاتمە خان بە زوویی ئەو بارودوخە بۆ وەزارەتی ئێوە بنێردرێت. بەو شێوەیە بۆ جێبەجێکردنی ئەو کارە و دەرحەقی ئەو بابەتە بە دەست و برد تەزکیرەیەکتان بۆ ڕەوان دەکەین.[38]

لە بەڵگەیەکی دیکەدا کە مێژووی لەسەر نەنووسراوە و پێدەچێت پێش ئەو بەڵگەیەی سەرەوە بووبێت، مەقامی سەدارەت داوا لە وەزارەتی دارایی دەکات کە فاتمە خانمی کچی مەولانا، لەبەرئەوەی برایەکەی کە نەجمەدین ئەفەندییە لە ژیاندا نەماوە و هەموو موڵکەکان لە بن سەرپەرشتیی فاتمە خانمن، بۆیە پێویستە لەم کاتەدا کە ناوبراو دەستی کورتە لەلایەن گەنجینەوە برە پارەیەکی وەك مووچە بۆ تەرخانبکرێت. لەگەڵ ئەوەشدا باسی خانیزادە محەمەد ئەفەندی دەکات کە زاوای مەولانا خالیدە، واتە مێردی فاتیمەتوززەهرایە، ئەویش داواکارییەکەی لەگەڵ داواکاریی فاتیمە هاوپێچ کردووە. وەك لەم بەڵگەیەدا هاتووە:

---

[36] مولانا خالد النقشبندی ومنهجه فی التصوف، جواد فقی علی الجوم حیدری، ص 33

[37] I_MVL_00448_019950_001_001

[38] A_}MKT_NZD__00348_00050_001_001

له حەزرەتی ڕیاسەتپەناهی خاوەن شەرەفەوە بۆ وەزارەتی دارایی[39]

فاتیمەتولزەهرا خانمی کچی حەزرەتی مەولاناخالید قدس سره الواحد کە لە شامی شەریفە ئەسپەردەی خاك کراوە، عەرزوحاڵی پێشکەشی مەقامی مەرحەمەتی جەنابی ملوکانە (پادشا) کردووە، لە عەرزوحاڵەکەیدا: لەبەر ئەوەی تووشی نەداری و موحتاجیێ بووە و داوای بڕە مووچەیەکی گونجاو دەکات بۆی تەرخان بکرێت. لە عەرزوحاڵێکی دیکەی خانیزادە محەمەد ئەفەندی زاوای مەولاناخالید تەزکیرەی سەدارەت کە ڕاگەیاندنی بەڕێوەبەرایەتی مەشیخەتە، دوای موتاڵاکردنمان بۆ ناردنی ئەنجومەنی باڵادا بە هاوپێچی بۆتانی دەنێرین. لە عەرزو حاڵەکە ئەوەی لێ دەفامرێتەوە کە نەجمەددین ئەفەندی برای فاتیمەتولزەهراخانم وەفاتی کردووە و ئەو موڵکانەش لە دەستی ئەودا ماونەتەوە، بۆیە پاراستنی ئەوان (فاتیمەتولزەهرا خانم) لەو هەژاری و موحتاجییەدا تەنیا شایانی مەزنی پادشایە. لەبەرئەوە بۆ سەردانی گەنجینە و پێویستی ئێوە لە ئەمر و فەرمانی ئەفەندیمانە.

جێگەی باسە لە بەڵگەکاندا تەنیا بە وردەکاری باسی فاتیمە دەکات و هیچ شتێك لەبارەی ساراوە نەهاتووە، جگە لەو بەڵگەیەی کە مووچە بۆ دایك و سارا و فاتیمە دەبڕدرێتەوە.

6- لەبارەی کوڕەکانی مەولانا خالیدەوە

سەبارەت بە کوڕەکانی مەولانا، ئەگەر چی لە بەڵگەنامەکانی عوسمانیدا ناوی هەموویان نەهاتووە. بەڵام ئەو سەرچاوانەی دەربارەی بنەماڵەی مەولانا خالیدن، باس لە چوار کوڕی دەکەن، لە کاتێکدا منداڵی ژنەکانی تری زۆر بە کەمی باس کراون. ئەوەی تا ئێستا هەیە ئەوەیە کە (مەولانا لە ژنی یەکەمیان چوار کوڕی دەبن، ئەوانیش هەر یەك لە: عەبدولرەحمان لە شەش ساڵی و لە ساڵی 1826 بە پەتای تاعوون لە دیمەشق وەفات دەکات. کوڕی دووەمیان بەهائەدین بووە ئەویش لە پێنج ساڵی بە هەمان پەتا و چەند ڕۆژ پێش براگەورەکەی وەفات دەکات و زمانەکانی عەرەبی و فارسی و کوردی زانیوە، هەندێك پێیان وایە لەدایکبووی بەغدا بووە. کوڕی سێیەمیان ناوی شەهابەددین بووە و لە ئورفا ئەو کاتەی لە بەغداوە بەرەو دیمەشق لە ڕێگا بوونە لە ساڵی 1822 وەفاتی کردووە. کوڕی چوارەمیان ناوی نەجمەددین بووە و پاشەبەرەی مەولانا بووە و دوای وەفاتی مەولانا لەدایك بووە لەو کاتەی دایکی نەجمەددین ویستویەتی سەفەری سلێمانی بکات بە هاوەڵی شێخ ئەحمەد هەولێری، لە ڕێگای گەڕانەوەی سلێمانی ئەم نەجمەددینە لەدایك دەبێت و لەلایەن دایکی و شێخ ئەحمەدەوە ناودەنرێت نەجمەدین و ماوەیەك لە سلێمانی لای مەحمود ساحێب دەبن و پاشان بە ڕێگەی هەولێرەوە دەگەنەوە شام. نەجمەددین گەورە دەبێت و کامڵ دەبێت ئەنجا تەریقەت لەسەر دەستی عەبدولفەتاح ئاکرەیی و شێخ مەحمود ساحێب وەردەگرێت و ژن دێنێت و کوڕێکی دەبێت ناودەنرێت محەمەد. ناوبراو لە تەمەنی 27 ساڵیدا و لە ساڵی 1853 کۆچی دوایی دەکات.)[40]

ئەوەی لە بەڵگەنامەکانی عوسمانی هاتوون، بریتین لە باسکردنی ئەم کوڕانەی:

1-6 محەمەد سەعید ئەفەندی:

ئەم کوڕەی مەولانا لە هیچ سەرچاوەیەکی مێژووییەوە پشتڕاستنەکراوەتەوە، تەنیا ئەوە ڕوونکراوەتەوە کە لە دوای وەفاتی مەولانا تەنیا نەجمەددین لە ژیاندا ماوە، بەڵام بە گوێرەی بەڵگەیەك ناوی محەمەد سەعید ئەفەندیش وەك یەکێك لە کوڕەکانی مەولانا هاتووە لە ساڵی 1867ەوە، بێگومان لەم مێژووەش هیچ کوڕێکی مەولانا لە ژیاندا نەماوە، ئێمە گومانی ئەوە دەکەین کە ئەمە یەکێك لە نەوە یان برازاکانی مەولانا بێت:

دیوان[41]

ئەو نووسراوەی کە دیوانی ژمێریاری نووسیوەتی و وەزارەتی داراییش پەراوێزی بۆ کردووە و پێشکەشی ئەنجومەنی باڵای کردوە، وەها دەڵێت کە: شێخ محەمەد فیراقی ئەفەندی کە مەزارگەوانی گۆڕی حەزرەتی

---

[39] MVL_00483_00097_001_001

[40] *مولانا خالد النقشبندی ومنهجه فی التصوف*، جواد فقی علی الجوم حیدری، ص 33

[41] I_MVL_00574_025767_001_001

مەولاناخالید قدس سرە الواحدە کە لە شامێ ئەسپەردەی خاك کراوە. ئەو شوێنەی کە ناوەکەی لەسەرەوە هاتووە بیدەینە دەستی کوڕەکەی مەولاناخالید کە ناوی محەمەد سەعید ئەفەندییە. ئەو مووچەو دامەزراندنانەی تەرخانکراون بۆ نەدار و دەروێشان ئەو وەربیگرێت و بە پێی سیستەمی دەولەت کە هەر کێ شیخایەتی بکات بۆی پێویست کراوە.

لەبەر هەندێ ئەو تەخسیساتەش دەبێ بدرێتە ئەو ئەفەندییەی ناوی لەسەرەوە هاتووە. لەو بوارەدا دەستوور دەدرێت کە ئەو داواکارییەی لەناو نوسراوەکەدایە بە گوێرەی سیستەمی دەوڵەت و بە گوێرەی هاوشێوەکانی داوادەکرێت. جا بۆ جێبەجێکردنی ئەو کارە و ناردنی نووسراوەکە لە لایەن گەنجینەوە بۆ وەزارەتی دارایی قبوڵ کرابێت و لەو بوارەشدا ئەمر و فەرمانی حەزرەتی(من لە الامر)ە.

لە 25ی موحەڕەمی ساڵی 1284 و لە 17ی مایسی ساڵی 1283

لە 29ی مایسی ساڵی 1867

مستەفا ئەفەندی (لە لیژنەکەدایە)، مۆر: عەلی. مۆر: عبداللطیف سوبحی، مۆر: سەید مستەفا عیززەت. محەمەد پاشا (نەهاتووە). مۆر: عەبدولرەحمان شامی، مۆر: مەحمود جەلالەدین، مۆر: السید محمد ادهم، مۆر: یوسف کامیل، مۆر:مۆسیۆ یانکۆرۆس.

2-6 نەجمەددین

ئەوەی تا ئێستا لەبارەی نەجمەددینی کوڕی بچوکی مەولانا زانرابێت، ئەوە بووە کە (کوڕی چوارەمی مەولانا ناوی نەجمەددین بووە و پاشەبەرەی مەولانا بووە و دوای وەفاتی مەولانا لەدایك بووە لەو کاتەی دایکی نەجمەددین ویستویەتی سەفەری سلێمانی بکات بە هاوەڵی شێخ ئەحمەد هەولێری، لە ڕێگای گەڕانەوەی سلێمانی ئەم نەجمەددینە لەدایك دەبێت و لەلایەن دایکی و شێخ ئەحمەدەوە ناودەنرێت نەجمەدین و ماوەیەك لە سلێمانی لای مەحمود ساحێب دەبن و پاشان بە ڕێگەی هەولێرەوە دەگەنەوە شام. نەجمەددین گەورە دەبێت و کامڵ دەبێت ئەنجا تەریقەت لەسەر دەستی عەبدولفەتاح ئاکرەیی و شێخ مەحمود ساحێب وەردەگرێت و ژن دێنێن و کوڕێکی دەبێ ناودەنرێ محەمەد) [42].

ئەو بەڵگانەی لەبارەی نەجمەددین ئەفەندی هاتوون و کۆمەڵێك زانیارییان تێدایە و بەشێك لە مێژوو ڕاستدەکەنەوە بریتین لەم بابەتانەی خوارەوە:

یەکەم: بەڵگەکان ئەوە پشتڕاست دەکەنەوە کە نەجمەددین ئەفەندی دوای مردنی باوکی لەدایك بووە، ئەوەش لە بەڵگەیەکدا دێت کە مژارەکەی میراتە و ئەوە ڕوون دەکاتەوە کە ناوبراو ئەگەرچی پاش مەرگی باوکی لەدایك بووە بەڵام مافی میراتی هەیە:

" نەجمەددین ئەفەندی کە دوای باوکی خۆی هاتۆتە دونیاوە و لەبەرئەوەی میراتگری باوکی خۆیەتی، ئەمەش بەشدارە و بەشی هەیە" **[43]**

دووەم:سەبارەت بە وەفاتی نەجمەددین ئەفەندی:

بۆ کۆچی دوایی ناوبراو، سەرچاوە مێژووییەکان سەرچیخ چوونە، چونکە ئەوان پێیان وایە (ساڵی 1270ی کۆچی وەفاتی کردووە)[44]. کە دەبێتە بەرامبەر ساڵی 1853-1854ی میلادی و واتە ئەو کاتە تەمەنی ناوبراو 27-28 ساڵی بووە. کەچی لە بەڵگەنامەکاندا وێڕای ئەوەی بەڵگەی دوو ساڵ دوای ئەم مێژووەش ناوبراو هەر لە ژیاندا بووە، بەڵگەی دیکەش نیشانی دەدەن تەمەنی زۆر لەوە زیاتر بووە. لە بەڵگەکانیشدا بێ ئەوەی مێژووەکە دیار بێت، ئاماژە بەوە دەکرێت کە نەجمەددین ئەفەندی پێش فاتیمەی خوشکی وەفاتی کردووە، چونکە هەموو

---

[42] مولانا خالد النقشبندی ومنهجه فی التصوف، جواد فقی علی الجوم حیدری، ص 33

[43] I_MVL_00329_014072_002_001

[44] الحدائق الوردیة فی حقائق اجلاء النقشبندیة، عبد المجید بن محمد الخانی، دار آراس للنشر، مطبعة وزارة التربیة، اربیل 2002، ص 343

موڵك و سامانی مەولانا لەژێر سەرپەرشتی نەجمەددین دابووە و دواتر داوادەكرێت كە فاتیمە خانم سەرپەرشتی ئەو موڵك و ماڵیە بكات.[45]

لە بەڵگەیەكی دیكەدا كە نزیكەی چل ساڵ دوای ئەو مێژووە و هێشتا ستی خانمی خێزانی مەولانا و دایكی نەجمەددین لە تەمەنی 110 ساڵی دایە ناوی نەجمەددین دێت و ستی خانم داوای مووچەكەی دەكات، بەڵگەكەش فەرمانی سەرۆك وەزیرە بەم شێوەیەی خوارەوە:

سەدری ئەعزەم (سەرۆك وەزیر)

گەرەكی یەلدز پاشا

بەڕێوەبەرایەتی سەرۆك نووسین[46]

خانەقای حەزرەتی مەولانا خالید كە لە سالحییەیە، بە هۆی ئەوەی كە وێران بووە و پێشتر لەبەر كەمكردنەوەی تەخسیسی ساڵانە (ئەو مووچەیەی كە لە ساڵێكدا دەدرا) و دانی خواردنی مانگانە كە ببووە چارەگێك و دەبێ وەك پێشتر ئەو كەمكردنەوەیە نەمێنێ و ***بەڵگەیەكی ڕەسمی بۆ نەجمەددین ئەفەندی كوڕی مەولانا خالید بنێردرێ*** *و ئەو هەردوو موڵك و باغە ئەوانەی كە بۆ نەجمەددین ئەفەندی و گوزەرانی خانەقا و خانەوادەی حەزرەتی مەولانا خالید وەقفكرابوون، ئەمساڵ لەسەر ناوی گەنجینەی دارایی تۆماركراوە، با وەك پێشتر لە باج ئیستیسنا بكرێن و حەوالەكردنی 10 لیرەشی مووچەی مانگانە بۆ سندووقی ئەوقافی شامێ كە بۆ نەجمەددین ئەفەندی تەرخانكرابوو و بە ئیستیدعای داواكاری ستی هاوسەری حەزرەتی مەولاناخالید كە داوای كردووە: ئەو خانەقایەی ناوی پێشتر هات لە لایەن گەنجینەی پادشا بە تایبەت نۆژەن بكرێتەوە و تەرخانكردنی خواردن بێ زیادكردن و دەرختنی مووچەی نەجمەددین ئەفەندی لەلایەن بەڕێوەبەرایەتی كە دەبێ بدرێت، بە گوێرەی ئەو داخوازینامەیەی كە دراوە دەبێ جێبەجێی بكەن. دەرحەقی ئەو دوو بانەیان وەك هاوشێوەكانی وان ڕەفتاریان لەگەڵ بكرێت، لەو بابەتانەشدا ئیرادەی جەنابی خەلافەتپەناهی شەرەفموتەعالی ئەمر بكرێ و خاڵی نۆژەنكردنەوەی تەكیەی ناوبراو بۆ وەزراەتی گەنجینەی پادشایی بە تایبەت بۆیان بنێردرێ و ئاگاداربكرێنەوە. لەو بوارەشدا ئەمر و فەرمانی حەزرەتی (ولی الامر)ە.*

لە 17ی ڕەبیعولئاخیری ساڵی 1308 و لە 18ی تشرینی دووەمی ساڵی 1306

لە 30ی تشرینی دووەمی ساڵی 1890

سەرۆكی نووسەرانی حەزرەتی شەهریاری سورەییا

ئێمە لەم بەڵگەنامەیەدا گومانمان هەیە و دەگونجێت مەبەست محەمەدی كوڕی نەجمەددین ئەفەندی بێت و وەك زۆربەی جاران بانگكردنەكە بەناوی باوكە و ناوی كوڕ فەرامۆش دەكرێت، چونكە لە بەڵگەنامەیەكی دیكەدا كە دەكاتە مێژووی 9ی ئابی ساڵی 1855، واتە چەند مانگێك دوای بەڵگەنامەی تایبەت بە باجی گوندی گەرنەك، ئاماژە بەوە دەدرێت كە نەجمەددین و عەبدولرەحمان ئەفەندی وەفاتیان كردووە: " لە نووسراوی وەزارەتی دارایی و هاوپێچ مەزبەتەی ئەنجومەنی ژمێریاری كە بۆ ئەنجومەنی باڵا نێردراوە، وەها دەڵێت كە: نەجمەددین و عەبدولرەحمان ئەفەندی وەفاتیان كردووە. منداڵەكانیان و سەروەتەكانیان و هەردوو گوند بە ناوەكانی دوغان و گردعازەبانی سەر بە ئیلایەتی شارەزوور و قەزای هەولێرن داوادەكەن بیاندرێتەوە"[47]

كەواتە ڕوون بوویەوە كە لە ساڵی 1855ی میلادی نەجمەددین ئەفەندی كۆچی دوایی كردووە.

سێیەم: فەرمانی سەرپەرشتیكردن و خزمەتكردنی مەزاری مەولانا

بە گوێرەی بەڵگەكان ئەوە دەردەكەوێت كە ماوەیەك وەزیفەی خزمەتكاری و چاولێبوونی مەزاری مەولانا، ئەركی شێخ فیراق ئەفەندی بووە، بێ ئەوەی مێژووەكە دیار بێت ئەو وەزیفەیە لە ناوبراو دەسەندرێتەوە و

[45] MVL_00483_00097_001_001

[46] İ__DH___01206_094395_001_001

[47] MVL_00346_00037_001_001

ڕادەستی نەجمەددین ئەفەندی دەکرێت، لەم ڕووەوەش ئەنجومەنی لێپرسینەوە و وەزارەتی دارایی نامە بۆ شێخولئیسلام دەنێرن و لەوبارەوە ئاگاداری دەکەنەوە:

بۆ جەنابی حەزرەتی شێخولئیسلام[48]

مەزبەتەی ئەنجومەنی لێپرسین لەگەڵ نووسراوی وەزارەتی دارایی، کە سەبارەت بە خزمەتکاری مەزارگەی حەزرەتی مەولاناخالیدەوەیە کە لە شامی شەریفدایە، ئەو خزمەتکارییەیان لە دەستی شێخ فیراقی ئەفەندییەوە ستاندۆتەوە و داویانەتە نەجمەددین ئەفەندی کوڕی مەولاناخالیدەوە. لەو بارەوە ئێمە بۆ بۆچوون و نێرینی مەشیخەتی مەزنتانمان ڕەوان کردووە. بۆیە ئەمر و فەرمان هەر هی حەزرەتی (من لە الامر)ە.

چوارەم: نێوانی نەجمەددین ئەفەندی و عوسمانییەکان هەمیشە خۆش نەبووە، دیارە پێش ئەوەی عوسمان نووری ببێتە سەرۆکی ئەنجومەنی باڵا و قائیمقامی شام، نەجمەددین ئەفەندی کێشە و گرفتی زۆر بووە، بۆیە لەگەڵ هاتنی ئەو قایمقامە تازەیە، لە بەڵگەیەکدا و لە 12ی مارتی ساڵی 1851 ئەوە بۆ خەلافەت ڕوون دەکرێتەوە کە کوڕەکەی مەولانا دەبێت ڕێزی بگیرێت و ئەگەر پێشتر هەر شتێکیش دەرحەق وی کرابێت یان ئەو بووبێتە جێی نارەزایەتی دەوڵەت، ئەوا ئێستا هیچ جێگەی نارەزایەتی ئێمە نییە:

"بۆ زانینی ئێوەی مەزن ئەو کەسە(نەجمەددین ئەفەندی) لەو زاتانەیە کە کە شایستەی ریعایەتە. لەبارەی مەشایخان ئوسول و دەستوور چۆن جێبەجێ دەبێت، بەو شێوەیە پێشوازییەکی بەڕێزەوە لێبکەن و حورمەتێکی باشی بگرن و ئەو تەنگاسیی و دژوارییەی لەسەر ئاسان بکەن و لە جێبەجێکردنیشدا دیققەت بکەن. وەك ئەو ئەمر و فەرمانەی نیشانی مەرحەمەتتانە، ئێمەش بە ئاگادارییەوە هەڵسوکەوت دەکەین و دەرحەق ئەمسالی ئەو ئوسول چۆنە بە بێ مافداری بەڕێوەی دەبەین، سەبارەت بەویش بزاڤ و جوڵەیەکی خۆش پێك بێت. هەرچی سەبارەت بە پەلەکردن لە جێبەجێ کردنی حورمەت و ڕێز کە ئەگەر لە پێشتریشدا شتێکیش بووبێت، لێرە لە میانەی مەئمووریەتی مندا سەبارەت بەو کەسایەتییە شتێك سەبارەت بە نارازیبوونتان دەرنەکەوتووە." [49]

پێنجەم: داوای بەخشین لە باجی خانوو و عەردی خانەقای مەولانا:

دیارە لە بەشێك لەو ناوچانەی کە خانەقای مەولانا خالیدی لێبووە، زۆرجار ئەگەر خانوو یان عەردێك کرابێتە وەقف بۆ خانەقاکە، دەوڵەت ئەو موڵکانەی خانەقای لە باج بەخشیوە، بەڵام لەگەڵ هاتنی یاسای تازە و یان فەرمانڕەوایی نوێی ناوچەکە، گەلەك جاران باجیان خراوەتە سەر. لەو سۆنگەیەوە لە گوندی کەنەکرەدا خانوو و عەردێکی خانەقا لەبن سەرپەرشتی نەجمەددین ئەفەندی بووە و دیارە پێشتر گرفتی نەبووە، لەگەڵ هاتنی باج نەجمەددین ئەفەندی داوادەکات لە باج ببەخشرێن چونکە بە گوێرەی ئیفادەی ئەو داهاتی موڵکەکە زۆر کەمە، داواکارییەکەش لە ڕێگەی ئیدارەی ناوچەکەیە بۆ مەقامی سەدارەت:

"نەجمەددین ئەفەندیی پۆستنشینی خانەقای حەزرەتی مەولاناخالید (قدس سرە الواحد-کە لە شامی ئەسپەردەی خاك کراوە)، عەرزوحاڵی داوە و لەو عەرزوحاڵەدا وەها نیاز و داخواز دەکات، کە بۆ گوزەرانی خانەقای حەزرەتی مەولاناخالید (قدس سرە الواحد) ئەو خانوو و باخەی کە پێشتر کڕدرابوو هەندێك باجی لێ وەردەگیرا. بەڵام لەبەرئەوەی داهاتی ئەو باخە بەشی گوزەرانی خانەقا ناکات، بۆیە داوادەکەین کە لە باج ببەخشرێت. گوندی کەنەکر کە پێشتر لە دەستی نەجمەددین ئەفەندی دابوو، هەتا ئێستا باجی لێ نەدەسەندرا و ئێستا هەندێك باجیان لێ داواکردووە، ئێمە داوامان ئەوەیە وەکو پێشتر باجی لێ نەسەندرێت. لەو سۆنگەیەوە با فەرمانێك بنووسرێت.

لەو چین و توێژە خاوەن عیززەت و کەرەمن و ئەو دەورێشەی کە هیچ ماڵ و موڵکێکیان بە ماڵیانەوە پەیوەست نەکراوە، دەبێ باجیان لێ نەسەندرێت، هەر وەك چۆن ئێمە دەزانین لە کەسانی هاوشێوەی ئەوان فەرمانی مەزنیان بۆ دەرکراوە و باجیان لێ ناسەندرێت گوندی کەنەکرێ کە پێشتر باجیان لێ وەرنەدەگرتن و با وەك پێشتر باجیان لێ نەستێنین و ئەگەر ئێوە ئەمر و فەرمان بکەن بۆ ئەو مەسڵەحەتە. ئەو باخ و عەرەدەی کە باسی لێوەکرا لەمێژە باجی لێ داواکاربوو، چونکە داهاتەکەشی شتێکی کەمە بۆ ئەو کەسەی کە ناوی

[48] A_}MKT_MHM__00045_00086_001_001
[49] A_}MKT_UM___00051_00025_001_001

لەسەرەوە هاتووە، بە دەستووری ئێوەی مەزن کە ئێوە بە شایستەی بزانن و ئەو باخ و زەوییە با لە باجێ ببەخشرێ و مووەفەقی ئیرادەی شاهانەتان بێ، تا ئێمەش ئەو ئەمرە جێبەجێ بکەین." [50]

شەشەم: داوادەکرێت گوندی کەنەکر بگەڕێتەوە سەر سەرپەرشتیی نەجمەددین ئەفەندی، دیارە لەناو بەڵگەکاندا سەبارەت بە ناوی کەنەکر بۆچوونی جیاواز هەیە و دەوڵەت دەیەوێت دووبارە تۆماری گوندەکە بەناوی کوڕی مەولانا بکرێتەوە، وەك ئەوەی پێشتر لەسەر ناوی باوکی بووە و ئەویش میراتگری باوکیەتی. لەو بارەوە بەڵگەکە باسی جۆری داهاتەکەش بەم شێوەیەی خوارەوە دەکات:

حەزرەتی ئەفەندیی زۆر بە بەزەیی[51]

ئەو نووسراوەی کە ئەنجومەنی باڵا هاوپێچ لەگەڵ نوسراوی وەزارەتی دارایی بۆ بۆچوونی حەزرەتی پادشایی و عەرزو تەقدیمکردنی وەهای لێ دەفامرێتەوە کە: گوندی کەنەکر کە لە ساڵی 70 ەوە تا ئێستا بۆ خانەقای نەجمەددین ئەفەندی کوڕی حەزرەتی مەولاناخالید قدس سرە تەرخانکرابوو، ئەو گوندە سەر بە شارۆچکەی حەورانە و ساڵانە 150 قرووش سەروەت (ماڵ) و 18 قرووش بۆ قەلەمییەی هەیە و لەبن دەستی کەس دا نییە. داهاتی ساڵانەی 29200 و چەند قرووشێکە و ساڵ بە ساڵ بۆ گەنجینەی شامێ دەبێت. بۆ ئەو گوندە ئەوەی لە نووسراوەکەدا هاتبوو هەڵەیە. بۆ ڕاستکردنەوەی ئەو هەڵەیە دەبێ لەلایەن دەفتەرخانە (تۆمارگە) هەندێك نووسراو بنووسرێت. بۆ تەرخانکردنی بەشێك بۆ خاوەنەکەی (نەجمەددین ئەفەندی) بچێتە دیوانی ڕەزامەندییەوە کە تا ئێستا ڕەزامەندی لەسەر نەدراوە. خاوەنەکەی لەبەرئەوەی پێشتر لەناو بڕیارەکەدایە، دانی بەشێك بەو لە ڕێرەوی مەسلەحەتێ دایە. وەك ئەمە دەبێ نەجمەددین ئەفەندی کە دوای باوکی خۆی هاتۆتە دونیاوە و لەبەرئەوەی میراتگری باوکی خۆیەتی، ئەمەش بەشدارە و بەشی هەیە، بۆ جێبەجێکردنی ئەو کارە لەلایەن گەنجینەوە دەبێت ئێمە نووسراوێك بۆ وەزارەتی دارایی بنێرین. لەو بوارەدا بە چ شێوەیەك دەبێت ئەمر و فەرمانی جەنابی پادشایە، ئەو چۆن فەرمان بکات و بە گوێرەی فەرمانەکەی حەرەکەت دەکرێت، بەو زانیارییانەوە نووسراومان پێشکەش کرد.

لە 23ی ڕەجەبی ساڵی 1271ی کۆچی

بەرامبەر 11ی نیسانی ساڵی 1855ی میلادی

حەفتەم: ئەو باجەی کە لە نەجمەددین ئەفەندی و منداڵەکانی مەولانا وەرگیراوە، دەبێ وەك مووچە بۆیان بگەڕێندرێتەوە، ئەمەش دوای ئەوە هات کە ماوەیەك دەوڵەت باجی لەم بنەماڵەیە وەرگرتبوو، بۆیە مەقامی سەدارەت والیی شام ئاگاداردەکاتەوە کە چەندە باجیان لێ وەرگیراوە لەم چەند ساڵەی ڕابردوودا، هەموو باجەکەیان وەك مووچە بۆ بگەڕێندرێتەوە، لەم ڕووەوەش ناوی کوڕەکانی مەولانا (محەمەد خالید و نەجمەددین) هاتووە، بە گوێرەی بەدواداچوون و زانیاری ئێمە هیچ کوڕێکی مەولانا بەناوی محەمەد خالید نەبووە، ئەمە زیاتر لێی دەفامرێتەوە محەمەد خالید کوڕی شێخ ئەسعەد ساحێبی برازای مەولانا بێت، بەشێکی مژاری بەڵگەنامەکەش لابردنی ئەو ئاستەنگییەیە کە مانگانە زەیتوون لە گوندی ئاین تەرمانەوە بۆ خانەقای مەولانا دەهات، دیارە لە ڕێگەدا ئاستەنگیان بۆ دروست دەکرێت:

بۆ والیی شامی شەریف[52]

بۆ خانەقای (حەزرەتی مەولانا خالید کە لە شام ئەسپەردەی خاك کراوە) لە گوندی ئاین تەرمان مانگانە زەیتوونیان بۆ تەرخانکراوە، ئەوانە لە باج بەخشراون، هەروەها خانووی ئەوان کە لە شامە ئەویش لە باجێ بەخشراون، هەردوو کوڕی حەزرەتی مەولانا خالید کە ناویان محەمەد خالید و نەجمەددینن عەرز و حاڵیان داوە کە ئەو کەسانەی مانگانە زەیتوون دەهێنن لەلایەن دوو کەسان کە ناویان مستەفا و ئەحمەدن ئاستەنگیان بۆ دروست دەکرێت، ئەگەر شتێکی وا هەبێ، ئەوا بە ڕەزامەندی پاشا نییە. بۆ لابردنی ئەو ئاستەنگییە چی پێویست بێ بکرێت. ئەو ماڵەی کە ئەوان تێدانە لە باج بەخشراوە، هەتا ئەویش تێدابن لە باج دەبەخشرێن. مادەم لە باجیش بەخشراون، باجی ساڵانەش بڕی 349.5 قرووشە بۆ ئەوان بگەڕێننەوە و لە بودجەیەدا ئەو خەرجییە نیشان بدەن. لە ساڵی 68ەوە تا ئێستا کە باج لەوان وەرگیراوە، باجی هەر ساڵێکی وەك مووچە بۆ ئەوان

---

[50] I_DH_00068_003361_001_001

[51] I_MVL_00329_014072_002_001

[52] A_}MKT_MVL__00072_00075_001_001

بگەڕێننەوە. ئەم بڕیارە ئەنجومەنی لێپرسین داویەتیە ئەنجومەنی باڵاش جێگیری کردووە و ئیرادە پاشایەتیش شەرەفصدوور بووە. ئەمرەکەش بۆ وەزارەتی دارایی نێردراوە. لەو بوارەدا دەبێ فەرمانی پادشایی جێبەجێ بکرێت، ئەوماڵەی کە بۆ ئەوان وەقفکراوە نابێ کەس موداخەلەی بکات و ئاستەنگی سەر زینهار مانگانەش لاببرێت. ئێوەش لەو بابەتەدا دەست و برد و هیممەت بکەن.

لە 27ی شوباتی 1271

لە 15ی مایسی ساڵی 1855

7- لەبارەی محەمەد نەجمەددینی نەوەی مەولاناخالیدەوە

هەر وەك پێشتر ئەوە ڕوون کرایەوە کە نەجمەددین یەکێکە لە کوڕەکانی مەولانا، لە چەند بەڵگەنامەیەکیشدا ئەوە بەدیاردەکەوێت کە کوڕێکی ئەو نەجمەددینە ناوی محەمەدە و بە نەوەی مەولانا دێتە ناسین. لە بەڵگەنامەیەکدا کە مێژووی 25ی حوزەیرانی ساڵی 1306ی ڕۆمی لەسەرە و نامەیەکی خەدیجەی خێزانی مەولانایە بۆ دەسەڵاتی عوسمانی، لە پەراوێزدا (محەمەد نەجمەدین) کە وەك نەوەی مەولانا خۆی ناساندووە، داواکارییەکەی بەرز کردۆتەوە و مۆری ناوەکەی خۆیشی لە کاغەزەکە داوە. کەواتە لەوە دڵنیا دەبینەوە کە ناوبراو نەوەی مەولانایە و لە سەردەمی خەدیجەخانم دا ئەو زیندوو بووە و زۆربەی کاروبارەکان ئەو هەڵیسوارندووە.

لە بەڵگەنامەیەکی دیکەدا کە مێژووی 22ی مایسی 1303ی ڕۆمی لەسەرە، تێیدا باس لە دابینکردنی خورد و خۆراك (تەعامییە)ی تەکیەکەی مەولانا خالید دەکات لە شام، بڕە پارەمەتییەکە مانگانە هەزار قرووشە و وا دیارە لە مانگی حوزەیرانی ساڵی 1292وە ئەو پارەمەتییە تەرخان کراوە. ناوی ئەو تەکیە و سەرپەرشتیارەکەشی بە تەکیەی مەولانا خالید لە شامی شەریف و پۆستنشینەکەی محەمەد نەجمەدین بووە. لە ناو مۆرەکەشدا (284) نووسراوە، کە ئاماژەیە بۆ ئەوە ئەم مۆرە لە ساڵی 1284ی کۆچی دروست کراوە.

8- ئەنجام

لەم توێژینەوەیەدا گەیشتینە ئەم ئەنجامانەی خوارەوە:

-مەحموود ساحێبی برای مەولانا خالید دوای مردنی مەولانا کەسایەتییەکی گرنگ بووە و خاوەنی ژمارەیەکی زۆر مورید بووە و سەرپەرشتی بەشێك لە خانەقاکانی کردووە، لەم ڕووەوە عوسمانییەکانیش پەسنیان داوە و بە کەسایەتییەکی گرنگیان حسێب کردووە، تەنانەت حوکمداری ئەوسای شام گرفتی بۆ دروست دەکات و لە خانەقاکە دەریدەکەن، دواتر لایەنی پەیوەندیداری دەوڵەت هەوڵی گەڕاندنەوەی دەدەن و پێیان وایە نیگەرانبوونی مەحموود ساحێب دەبێتە هۆی نیگەرانی خەلافەتیش، بۆیە چ لە سلێمانی و چ لە شام و چ لە حیجاز ئازووقە و مووچەی بۆ دابین دەکرێت، هەروەها پەیوەندی مەحموود ساحێب لەگەڵ والیی بەغداش پەیوەندییەکی باش بووە و سەبارەت بەو موڵك و بیر و ئاشانەی کە سەر بە خانەقای مەولانا بوونە لە سلێمانی، ساحێب نامە بۆ والیی بەغدا دەنێرێت و داوای چارەسەرکردنی ئەو گرفت و ئاستەنگییانە دەکات کە هاتوونەتە سەر ئەو وەقفانە.

-ئەسعەد ساحێب کە برازای مەولانا و کوڕی مەحموود ساحێب بووە، لە زۆر وێستگەی گرنگی ئەو بنەماڵەیە دوای مردنی مەولانا ڕۆڵی هەیە، بەتایبەتی سەبارەت بە نووسراوەکانی مەولانا ئەو سەرپەرشتی چاپیان دەکات و لەم ڕووەوە دیوانی مەولانا و کتێبی بغیة الواجد لەسەر دەستی ئەو ئامادەی چاپ دەکرێن و بە ڕەسمی مەشیخەتی شەیخولئیسلامی لێ ئاگاداردەکرێتەوە و هەوڵی پەیداکردنی خەرجیی چاپەکەش دەدات. لە لایەکی دیکەوە دەوڵەتی عوسمانیش ڕێزی زۆریان لە ناوبراو گرتووە و وەك یەك لە کەسایەتییە گرنگەکانی بنەماڵەی مەولانا و شوێنگرەوەی کاروباری خانەقا مامەڵەیان لەگەڵ کردووە.

-لەبارەی خێزانەکانی مەولاناخالیدەوە، تا ئێستا ئەوەی زانراو بوو مەولانا سێ ژنی هەبووە، ئەوەی لە بەڵگەکان زۆر ناوی دێت و زیاتر لە شەست ساڵ دوای مەولانا دەمێنێتەوە و 110 ساڵ تەمەنی بووە ناوی ستی خانم بووە و کورد بووە و دواهەمین خێزانی مەولانا بووە و لە 1891/9/1ی میلادی لە شام کۆچی دوایی کردووە. هەردوو کچەکانی کە فاتیمە و ساران لەگەڵ ئەو ناویان دێت.

-ستی خانم ڕاستەوخۆ داوای چوونی ئەستەنبوڵی کردووە کە چاوی بە بەرپرسانی عوسمانی بکەوێت، بەڵام لەبەر پیرییەکەی نەیتوانیوە سەفەر بکات، بۆیە داواکارییەکانی خۆی دەنووسێت و داوا دەکات کە کوڕێکی بنێرێت (تا ئێستا ڕوون نییە لەو مێژووە واتە 1890 مەبەستی کوڕی خۆیەتی یان نەوەکەی)، لەگەڵ ئەوەشدا عوسمانییەکان ڕێزێکی تایبەتی دەگرن و وەك حەرەمی مەولانا ناوی دێنن و ئەویش بە نامەی تایبەتی داواکارییەکانی بۆ خەلافەت دەنێرێت.

-تا ئێستا زانراو بوو مەولانا تەنیا فاتیمە خانی کچی لەپاش بەجێ ماوە، بەڵام لە بەڵگەکاندا لەگەڵ ناوی فاتیمە ناوی ساراخانمیش وەك کچی مەولانا دێت.

-خەدیجە ناوێك وەك هاوسەری مەولانا خالید ناوی هاتووە، بەڵام بە پێی ئەم توێژینەوەیە وا ڕوون دەبێتەوە کە هاوسەرێکی مەولانا دوو ناوی هەبوونە ئەوانیش خەدیجە و ستی، چونکە هیچ سەرچاوەیەکی چاپکراو باسی ئەم دوو ناوانەی نەکردووە، بەڵکو لە بەڵگەنامەکاندا هەر دوو ناوەکە هەن.

-نەجمەددینی کوری مەولانا کە پاش مەرگی مەولانایە و بە گوێرەی سەرچاوەکان لە تەمەنێکی زوودا کۆچی دوایی کردووە، بەڵام بە گوێرەی بەڵگەنامەکان تەمەنی لەمە زیاتر بووە و سەرپەرشتی خانەقای مەولانای لە شام کردووە و خاوەنی ڕێز و شکۆیەکی زۆر بووە لەناو دەوڵەتی عوسمانیدا.

-لە بەڵگەنامەیەکدا باسی کوڕێکی دیکەی مەولانا دەکات بەناوی محەمەد سەعید ئەفەندی و محەمەد خالید، ناوی ئەم دوو کوڕە لە هیچ سەرچاوەیەکی چاپکراودا نییە، دوای توێژینەوە لەبارەی نەوەکانی ئەگەری زۆر هەیە کە هەردووکیان نەوە یان کوڕەزای برای مەولاناخالید بن. وێرای ئەوەش بە بەڵگە ڕوون کرایەوە کە محەمەد نەجمەدین نەوەی مەولانا خالیدە.

-بنەماڵەی مەولانا چەند موڵکێکی وەقفکراوی خانەقایان لەبەر دەست بووە و دەوڵەت لە باج سەندن بەخشیونی، بەڵام چەند ساڵێك باجیان دەخرێتەسەر و لەو ڕووەوەش داواکاریی لە بنەماڵەی مەولاناوە بەرزدەکرێتەوە کە ئەو خانوو و عەردانە لە باج ببەخشرێن و هەروەها داواکاریی ئەوەش دەکەن کە نەجمەددین ئەفەندی کوڕی مەولانا یان کوڕەکەی نەجمەددین لە سەربازی ببەخشرێت.

9- سەرچاوەکان:

بە کوردی:

- یادی مەردان (مەولانا خالیدی نەقشبەندی)، مەلاعەبدولکەریمی مودەڕیس، بەرگی یەکەم، بڵاوکراوەکانی کۆڕی زانیاری کورد، بەغدا، 1979.

بە عەرەبی:

- الحدائق الوردية فی حقائق اجلاء النقشبندية، عبد المجيد بن محمد الخانی، دار آراس للنشر، مطبعة وزارة التربية، اربيل 2002

-الطريقة النقشبندية واعلامها، الدكتور محمد احمد درنيقة، دار جروس برس، بدون سنة الطبع ومكانه.

-مكتوبات حضرة مولانا خالد المسمى بغية الواجد، محمد اسعد صاحب زاده العثمانی النقشبندی، مكتبة سيدا، دياربكر بدون سنة الطبع

- مولانا خالد النقشبندی ومنهجه فی التصوف، الدكتور جواد فقی علی الجوم حيدری، دار الكتب العلمية، بيروت.

بە تورکی:

Abdulcebbar KAVAK, Mevlânâ Hâlid-İ Bağdadî Ve Hâlidî Tasavvuf Geleneğinin Tarihi Gelişim Süreci, Doktora Tezi, Atatürk Üniversitesi, Erzurum 2013

دەستخەت:

دەستخەتی (*العقد الجوهری فی الفرق بين كسبی الماتريدی والاشعری*) لە کتێبخانەی مجلس شورای ملی، ژمارە 12386.

کۆدی بەڵگەنامەکانی عوسمانی:

- A_}MKT_MHM__00045_00086_001_001
- A_}MKT_MVL__00072_00075_001_001
- A_}MKT_NZD__00348_00050_001_001
- A_}MKT_UM___00051_00025_001_001
- I_DH_00068_003361_001_001
- I_DH_00083_004154_001_001
- İ..DH.00919
- I_MVL_00329_014072_002_001
- I_MVL_00448_019950_001_001
- I_MVL_00574_025767_001_001
- İ__DH___01206_094395_001_001
- MVL_00483_00097_001_001
- Y__PRK_BŞK__00019_00091_001_001
- Y__PRK_BŞK__00019_00091_001_002
- Y__PRK_BŞK__00019_00091_002_001
- Y__PRK_BŞK__00019_00091_003_001
- Y__PRK_BŞK__00019_00091_004_001
- Y__PRK_UM___00018_00053_001_001
- Y__PRK_UM___00019_00051_001_001
- A_}MKT_MHM__00031_00025_001_001[1]
- A_}MKT_UM___00378_00021_001_001
- A.}TŞF. 00014.00030.001
- I_DH_00064_003197_001_001
- I_DH_00079_003935_001_001
- I_MVL_00078_001507_001_001
- İ_MVL_00262_009910_001_001
- MV__00214_00049_001_001
- MVL_00346_00037_001_001
- Y__PRK_UM___00022_00111_001_001

نموونەی وێنەی هەندێك لە بەڵگەنامەكان



A.}MKT.MVL.00127.00047.001



BEO.004552.341350.002


T.C. BAŞBAKANLIK OSMANLI ARŞİVİ DAİRE BAŞKANLIĞI (BOA)

دائرهٔ صدارت امور اداریه قلمی

اوراق نومروسی | مسودی | تبییضی | قلم نومروسی

قلمه تاریخ توديعی | تاریخ تسوید | تاریخ تبییضی | مقابله ایدنلر

OSMANLI ARŞİVİ
BEO
4553 341474

BEO.004553.341474.001




İDH 79/3935

İ.DH.00079


İ.DH 83/4154
İ.DH.00083


عرضحال يازلق ايچون ورقه در
قيمتي اوتوز پاره در
٣٠

İ.MVL 448/19950

1

İ.MVL.00448

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ

Yıl: 7, Cilt: 7, Sayı: 14 *ISSN: 2147-5679*

KÊŞEYA WERGERA BIWÊJ Û GOTINÊN PÊŞIYAN DI NAVBERA TIRKÎ Û KURDÎ DE

Yakup AYKAÇ[*]

Makale Türü/Article Types: Araştırma Makalesi/Research Article
Makale Geliş Tarihi/Received: 07.02.2022
Kabul Tarihi/Accepted/: 21.02.2022
Atıf: Aykaç, Y. (2022).
"Kêşeya Wergera Biwêj û Gotinên Peşiyan di Navbera Tirkî û Kurdî de",
Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 14, 69-83.
Orcid: 0000-0002-2602-484X

Kurte

Biwêj û gotinên pêşiyan perçeyek ji malê gelê xwe ne. Ji ber ku her neteweyek xwedî taybetmendiyên xusûsî ne, lewma jî di navbera her neteweyekê de ji her aliyê ve cihêtî peyda dibin. Gava ku ew cihêtî bê li ser karê wergerê hingê girîngiya biwêj û gotinên pêşiyan bêtir derdikeve holê. Çunkî yek ji xalên herî girîng di wergerê de kultur e ku divê wergêr vê yekê li ber çavan bigire û bala xwe bide ser. Dikare bê gotin ku yek ji wan cihên kulturî ku wergêr asê dibe, hêmanên wek biwêj û gotinên pêşiyan in. Ji ber vê yekê, armanca vê nivîsarê di çarçoveya biwêj û gotinên pêşiyan de diyarkirina kêşeya wergerê ye. Di biwarê wergerê de gelek rê û rêbaz hene ku ji wan a li ser wergera biwêj û gotinên pêşiyan zîq bûye metodolojiya M. Bakerê ye. Lewma em jî di nav sînorên tirkî û kurdî/kurmancî de li dor metodolojiya M. Bakerê li ser kêşeya wergera biwêj û gotinên pêşiyan hûr bûn. Li gor vê rêbazê, me biwêj û gotinên pêşiyan ên herdu zimanan li gor hevtayiyên xwe bi mînakan dabeş kirin. Di dawiyê de jî ji bo wergereke çêtir hin pêşniyaz û tesbît kirin.

Peyvên Sereke: Werger, wergera tirkî bo kurdî, biwêj, gotinên pêşiyan, Mona Baker.

* Dr. Arş. Gör., Mardin Artuklu Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Mardin-Türkiye. e-mail: yakupaykac@artuklu.edu.tr

The Translation Problems of Idioms and Proverbs between Turkish and Kurdish

Abstract

The idiom and proverbs are a part of their nation. For this reason each nation has its own characteristics and there are differences between each nation. When it comes to translation, the importance of idiom and proverbs becomes even more apparent. One of the most important points in translation is culture so, the translator must take this into account and pay attention to it. It can be said that one of the cultural places where the translator gets stuck is elements such as idiom and proverbs. Therefore, the purpose of this article is to define the certain translation problem in the context of idiom and proverbs. There are many ways and means in the field of translation, one of which is M. Baker's methodology, which focuses on the translation of idiom and proverbs. Therefore, within the Turkish and Kurdish/Kurmanji borders, we were focusing on Baker's methodology on the issue of translation of the idiom and proverbs. According to this method, with examples, we have divided the idiom and proverbs of both languages according to their equivalents. Finally some suggestions and recommendations for a better translation are presented.

Key Words: Translation, Turkish translation into Kurdish/Kurmanji, idioms, proverbs, Mona Baker

Türkçe ve Kürtçe Arasında Deyim ve Atasözlerinin Aktarılması Problemi

Özet

Deyimler ve atasözleri ait oldukları milletlerin önemli birer kültürel parçasıdırlar. Her milletin kendine has birtakım özellikleri olmasından ötürü diğer milletlerle karşılaştırıldığında birtakım farklılıklar da ortaya çıkmaktadır ki söz konusu tercüme olduğunda kültürün, bunun da bir parçası olan deyim ve atasözlerinin önemi daha da belirginleşmektedir. Bu yüzden tercümede, çevirmen bunu dikkatle göz önünde bulundurmak zorundadır. Çünkü çevirmenin takıldığı kültürel nesnelerin başında deyim ve atasözleri gelmektedir. Bu nedenle, sözkonusu bu makalenin amacı, bilhassa edebi çeviri konusunda deyim ve atasözleri çevirisine eğilmektir. Tercüme alanında birçok metod olmakla birlikte M. Baker'ın deyim ve atasözlerinin aktarımına odaklanan metodolojisi bu çalışmanın temelini oluşturmuştur. Bu çalışmada Türkçe ve Kürtçe/Kurmanci sınırları içerisinde deyim ve atasözlerinin tercümesi konusunda Baker'ın metodolojisi baz alınarak bir sınıflandırılmaya gidilmiş ve bu metoda göre karşılıklı olarak deyim ve atasözleri tasnif edilmiştir. Son olarak, özelde Türkçe ve Kürtçe arasında, genelde ise diğer dillerden Kürtçeye olmak üzere, daha iyi bir çeviri için bazı tespitler yapılmış ve öneriler ortaya konulmuştur.

Anahtar Kelimeler: Çeviri, Türkçeden Kürtçeye çeviri, deyim, atasözleri, Mona Baker.

1. Destpêk

Rabirdûya wergerê û karê wergêrî bi qasî hebûna mirovatiyê kevn e. Lewma werger hêj di demên mêj ve derketiye holê. Herçend li rojhilatê zimanê erebî û farisî, li rojavayê zimanê latînî û yûnanî, roja îro zimanê îngîlîzî, îspanyolî, fransizî li dunyayê serdest bûbe jî wek tê zanîn ji berê ve zimanekî hevpar di dunyayê de nebûye. Lewma girîngiya werger û wergêr hatiye dîtin ji bo ragihandin û peywendiyê ya ku di navbera gel û çandên cuda de pêk dihat. Herwiha wisa dixuyê ku hindî ku ziman hebin û hebûna xwe bidomînin werger jî di navbera zimanan de bi awayekî zindî dê her berdewam be.

Pêdiviya wergera nivîskî bi peydabûna nivîsê re, bi daxwaza wergerên metnên dînî û belku bi gelek sedemên din re dest pê kiriye, yan jî wek nêrîneke maqûl wisa hatiye pejirandin. Ji bilî wergera nivîskî helbet wergera devkî jî heye ku mirov nikare jê re destpêkek diyar bike. Ji bo wergerên nivîskî mirov texteberên nivîskî yên sumeriyan wekî mînakên ewil dikare nîşan bide. Di serdemên ewil ên Îslamiyetê de jî wergerên ji zimanê suryankî, yûnaniya kevn, pehlewî, hindî û zimanên din wergerên nivîskî hatine kirin. Di vê serdemê de Bexda bûye navenda wergerê (Gutas, 2003: 23-37). Helbet wergêran tenê zanîn û agahiyên ji zimanên din neqlê zimanê erebî nekirine, herwiha bi wan wergerên xwe di standartkirina zimanê erebî de bûne alîkar. Di vê çarçoveyê de ji bo kurdî em dikarin behsa Îbn Wehşiyye (kd. 908) bikin. Di vê serdemê de behsa çend kitêbên kurdî tê kirin ku wî bixwe wergerên wan bo zimanê erebî kirine. Îbn Wehşiyye ji malbateke keldan bûye ku li herêmeke nêzîkî Kûfeyê hatiye dinê. Ew di warên wekî efsûn, sîmya, çandinî û cotkarî, endezyarî, dîn û dîroka dînan de xwediyê zanyariyek kûr bûye (Fahd, 1986: 963-965). Ew li Beytu'l-Hikmeyê wergêrekî çalak bûye û gelek berhem ji zimanên aramî/keldanî û kurdî wergerandine ser zimanê erebî (Kaya, 1992: 88-90; Macit, 2011: 498-499). Kitêbên ku wî wergerandine ser erebî yek ji wan “Îflahu'l-Kermî we'n-Nexl” û ya din jî “Îlelu'l-Miyah we Keyfiyyetu Îstixraciha we Îstinbatiha mine'l-Eradi'l-Mechuleti'l-‘Esl” e. Li gor diyarkirina Îbn Wehşiyyeyî ji van kitêban a ewil derbarê danîna darên xurmeyan û rezên tiriyan de, ya duyem jî dîtin û derxistina çavkaniyên avê de bûye (Zozanî, 2009). Ji van herdu mînakan mirov dikare bibêje ku di şaristaniya mezin a Îslamiyetê de kurdî jî para xwe ji wergerê girtiye.

2. Çi ye Werger?

Eger em ji bo wergerê bixwazin pênaseyek bikin helbet hinekî zor û zehmet e, çunkî li gor wergêr û lêkoleran ew diguhere. Ji ber ku werger di destpêkê de wekî wergerandina metnekî ji zimanekî (zimanê jêder) ji bo zimanekî din (zimanê armanc) dihate dîtin. Li gor vê pênaseyê jî hê bi sedan sal berê, derbarê wê yekê de hinek metod hatine pêşkêşkirin ka werger çawa bê kirin. Helbet hindî stratejî û teorî ketin nav karê wergerê, bi guherîna stratejî û teoriyên xwe ve werger bixwe jî guherî û pêşve çû.

Bi guherînên stratejî û teoriyên wergerê re mirov di vê serdema modern de dema ku pênaseyeke wergerê pêşkêş dike ne mimkun e ku mirov bikaribe bêyî wergernasiyê, bêyî dîtina guherînên ku di wergernasiyê de çêbûne, bikaribe terîfeke hêsan ji wergerê re bîne. Werger edî ne ew werger e ku bi wateya xwe ya destpêkê, wekî guherandina metnekî ji zimanekî bo yekî din dihate dîtin. Lewma, ji bo pênasekirina têgeha wergerê ji hêla dîsîplînan ve eger mirov lê binêre pênaseyên cihê derdikevin holê wekî ku: Werger ji aliyê zimannasiyê ve bi terîfeke sade, cihguherandina keresteyeke metnî di navbera du zimanan de ye. Nêrîna R. Jacobson ku li gor “Teoriyên hevtayiyê” (equivalence theories) wergerê di navbera zimanê jêder û zimanê armanc de pênase dike ku werger “veguhezîneke zimannasiyê” ye. Jacobson wergerê wekî wergera “navzimanî” (intralingual), wergera “navberzimanî” (interlingual) û wergera “navbersemiyotîk” (intersemiotic) îfade dike ku ev pênaseyên han li ser vê fikr û ramanê ava bûne ku werger di navbera du kodkirinên cuda de du peyamên hevta dihewîne. Herwiha bi nêrîneke sosyolojîk werger çalakiyeke civakî ye ku mirov nikare erkên wê bi navbeynkarî yan jî ragihandinê ve sînordar bike (Yıldırımçakar, 2021: 59-60).

Gelek kesên din jî serê xwe ji bo terîfkirina wergerê re êşandine. Bo nimûne Yücel (2013: 7-11) di pêşgotina xebata xwe de wergerê wek amûrekê dinirxîne ku xwîner bi vê amûrê dikare ji tixûbên zimanekî biyanî derkeve û bêmecaliyê ji holê rake. Dîsa diyar dike ku werger

ne karekî mekanîk e, berevajiyê vê yekê tevgereke dahêner e. Ji ber vê sedemê ye ku werger ne karekî ji rêzê, belkî karekî sereke û bingehîn e. Hinek lêkolîneran jî derbarê vê yekê de gotine, werger çalakiyeke wisa ye ku di hemû serdemên dîrokî de tê dîtin, herwiha pireke wisa ye ku di navbera şaristanî, ziman û çandên cuda de pêwendiyek saz dike. Helbet gelek pênaseyên din jî dikarin bên dayîn lêbelê li vir di van pênasekirinên wergerê de tê dîtin ku herçend werger di navbera herdu zimanan de pêk bê jî divê girîngiya çand û ruhê civatan bê dîtin (Yıldız, 2020: 116-121; Keskin, 2021: 443-452).

Îcar wergerandina metnekê li gor xusûsiyeta zimanê metnê, têgeh û termînolojiya wê, asta wateya wê dikare biguhere. Metnên edebî û felsefîk li gor metnên agahîdêr û danasînê bi nisbet zehmetir in. Bo nimûne, wergera biwêj û gotinên pêşiyan zehmetir e ji wergerandina navdêr, rengdêr û lêkeran. Di vê xebatê de em ê berê bi kurtî pênaseya biwêj û gotina pêşiyan bikin, piştre jî li gor senifandina M. Bakerê di çarçoveya wergerê de wan binirxînin.

3. Biwêj û Gotinên Pêşiyan

Di her ziman û çandê de biwêj û gotinên pêşiyan perçeyên girîng ên çanda gelê xwe ne. Çi devkî û çi jî nivîskî bin, herdu jî axaftin û vegotinê xurtir û dewlemendtir dikin. Ji bo biwêj û gotinên pêşiyan gelek caran pênaseyên cuda hatine kirin. Bo nimûne hin lêkolîner li ser vê meseleyê wiha gotine: Gotinên pêşiyan di jiyana miletekî de encama tecrubeyan in ku bi buhurîna sedan salan çêbûne û hatine der. Dîsa biwêj û gotinên pêşiyan bi nîşana raman, bawerî û helwesta hevpar a neteweyî rêberiya gelê xwe dikin (Aksoy, 1988: 132). Li gor danasîneke din, gotinên pêşiyan anonîm in û bi forma risteyê pêk hatine. Ji wan ên ku em di forma kurt û qalibî de rastî wan tên, bi giştî darizandin û çavdêriyên nifşên berê pêşkêşî me dikin ku bi forma hêmayeke zimanî, wekî rêgezeke rêber di jiyana me de rêya me ronî dikin (Sağlam, 2001: 46). Aksan (2004: 171-189) jî di berhema xwe de diyar dike ku di zimên de wekî gotinên pêşiyan rengeke girîng jî heye ku ew jî biwêj e. Biwêj di heman demê de nîşanderê hebûn û yekûna peyvên zimanekî û raberkerê gelek bûyerên wateyî û retorîkî ye ku vegotinê xurt dike. Biwêj ew qalibê peyvan e ku ji bo vegotina têgeh, hest an jî rewşekê hatine gotin. Di biwêj û gotinên pêşiyan de gelek nîşaneyên civatê hene, lewma mirov di wan de ji rabirdûya wê civatê bigire heya şêwaza jiyana wê, edet û kevneşopiyên wan her tiştî dikare bibîne. Herwiha Oncu (2020: 21) jî derbarê gotinên pêşiyan de pênaseyeke wiha dike:

> Gotinên bav û bapîrên me yên ku ji cerebeya serhatî û serboriyên salên dûr û dirêj hatî darivîn, dipijin, dikemilin û di seyra tarîxî de bi qalibên mayînde teşe digirin, paşê jî bi wan qaliban vediguhêzin raman, pend û şîretên giranbiha. Wê dema ku ji aliyê gel ve tên pejirandin, dibin gotinên berê, gotinên pêşiyan an jî gotinên bav û kalan.

Wekî ku ji wan pênasekirinan jî tê dîtin gotinên pêşiyan û biwêj malê gelê xwe ne, xwediyê wan ne diyar in, anonîm in. Gelek caran rê û rêbazan didine pêşiya me, pend û şîretan li mirovan dikin, rê li ber nîşanî wan didin; darazî û hukmî ne; mecazî, edebî û lihevhatî ne. Gelek caran ji bo derbirina hest û ramanên me dibin derman ku mirov bi rihetî dikare derd û kulên xwe bîne zimên (Bnr. Kaplan, 2020: 1-3).

4. Kêşeyên Wergerandina Biwêj û Gotinên Pêşiyan

Jakobson dibêje ku di wergera navbera du zimanan de, wergêr ji bo gihandina peyama zimanê jêder, di zimanê armanc de gotinên hevwate bi kar tîne. Li gor Jakobson, wergera di navbera kodên herdu zimanan de "hevtayî"yeke rastîn tuneye. Bi gotineke din di navbera zimanan de kêm an zêde, zehf an hindik cudahiyên rêzimanî hene û ev jî nîşan dide ku di

navbera kodên zimên de hevtayiyeke tam tuneye. Herçend wergera di navbera du zimanan de mumkin be jî, dibe ku wergêr hertim bi hinek kêşeyan re rû bi rû bimîne wekî ku di zimanê armanc de peydanekirina hevtayiya wergera frêz yan jî risteyên zimanê jêder. Her ziman di pêşkêşkirina hevtayiyê de xwedan metod û stratejiyên taybet in. Vê axiriyê em dibînin; lêkolînên ku li dor werger û wergernasiyê hatine kirin bi piranî têgeha “hevtayî”yê bi kar anîne. Gelek zimanzan û teorîsyen li ser hevtayiyê sekinîne. Bo nimûne Jakobson li ser hevtayiya rewşê; Nida, li ser hevtayiya fermî û dînamîk; Catford, li ser hevtayiya metnî hin nêrînên xwe diyar kirine. Newmark, Hatim û Mason têgeha hevtayiyê wekî hevtayiya kiryarî/xebitandî, ferhengî/bêjeyî û vegotinê nirxandine. Li aliyê din, Bakerê di wergerê de têgeha hevtayiyê tevde wekî hev hesab kiriye (İli, 2015: 119-120).

Di pêvajoyên têgihiştin û wergerandinê yên freyz an jî koma bêjeyan de, dibe ku hinek caran kêşe peyda bibin. Loma di pêvajoya wergerandina biwêj û gotinên pêşiyan yên ji zimanekî bo zimanekî din de, baldarî û hişyariyê divê. Bi gotineke din wergêr divê hem çavnasê zimanê jêder hem jî yê ziman û çanda armanc be. Zimanên cuda dikarin heman rewşê bi peyv û gotinên cihê ragihînin axêverên xwe. Wek mînak, îfadeyek di zimanekî de ji bo axêverên wî zimanî tiştekî eşkere û şênber be jî, dibe ku ji bo axêverên zimanekî din nepen û razber, yan jî bi temamî tiştekî bêwate be. Sedema vê yekê ew e ku her ziman xwediyê hêmanên taybetî yên çanda xwe ne û di zimanekî din de dibe ku ew taybetî neyên dîtin. Cudahiyên çandî yên zimanên cuda wekî binyata civakî, erdnîgarî, dîn, bîrdozî û hêmanên wekî wan dike ku wergerê carna dijwartir bike. Ji ber ku werger çalakiyek nav-çandî ye, wergera di navbera du zimanan de bivê nevê bandor li zimanê armanc dike. Di wergera wêjeyî de wergerandina biwêjan kêşeyeke dijwar e û wekî ku me berê jî got, sedema vê yekê dibe ku ji ber cudahiyên kulturî be. Bi giştî, biwêj û gotinên pêşiyan ku wateyên wan ên heqîqî yan mecazî hene, bi forma ku di zimanê xwe de hene hergav bi temamî nikarin wergerin zimanên din. Wergerên biwêj û gotinên pêşiyan dibe ku di zimanê armanc de tiştekî bêwate be. Dibe ku em karibin wateya biwêj û gotinên pêşiyan ên zimanê jêder bi rengekî din di zimanê armanc de vebêjin, lêbelê hingê dibe ku tehma wergerê zewqek nede xwîner. Belê, di wergerandina gotinên pêşiyan û biwêjan de wekî ku di wergerên din ên devkî û nivîskî de jî têne dîtin, hin kêşe dikarin derkevin holê. Bêjeyek ku bi tena serê xwe be xwedî wateyek e, herwiha di biwêjekê de be dikare wateyeke din bigire ser xwe. Ji ber vê yekê, gava ku wergêr biwêjekê rasterast wergerîne zimanê armanc îhtimaleke mezin dê freyzeke bêwate derkeve holê. Li dor vê çarçoveyê, ji bo ku bibe mînak û mijar bêtir zelal û eşkere be, em ê li ser çend mînakên ji tirkî (zimanê jêder) û kurdî/kurmancî (zimanê armanc) bixebitin. Wek mînak, di zimanê tirkî de wek biwêj “Eline su dökmek” heye ku wextê di navbera du yan jî zêdetir kesan de berawirdiyek bê kirin tê gotin. Eger em peyv bi peyv wergera vê biwêjê bikin em dikarin bibêjin “Avê li destê yekî/ê kirin”. Belku em dikarin di nav hevokê de wiha bibêjin:

“Di filan mijarê de kes nikare avê li destê filankesê bike.”

Herçiqas ji hêla peyvsaziyê ve rast bixuyê jî li hember vê biwêjê di kurdî de biwêja “Nagihije neynika wî/ê” heye. Ji ber vê yekê di wergerê de li şûna vê biwêja tirkî mirov dikare bibêje:

“Di filan meseleyê de kes nagihîje neynika filankesê.”

Wek mînaka duyem, mirov dikare li ser biwêja “Gözünü seveyim” bisekine. Di tirkî de ev biwêj ji bo daxwaz, tika û ricayekê tê bikaranîn ku eger em rasterast wergera vê bikin hingê

dê bibe “Ez ê ji çavê te hez bikim” yan jî “Ez ê hijê çavê te bikim.” Ji bo ku mijar bêtir zelal bibe em di nav risteyekê de bikar bînin û di risteyeke tirkî de bila wiha derbas be:

“Gözünü seveyim Cemil Abi benim filan işimi yarın hallediver.”

Eger em ji bo vê risteyê rasterast wergerekê bikin û çavê xwe li ber biwêja tirkî bigirin dê risteyeke vî rengî derkeve holê:

“Ez ê hijê çavê te bikim Kekê Cemîl ca sibê filan karê min pêk bîne.”

Mirov hingê ji bo vê wergerê dikare bibêje ku li ser şal û şapika kurdan ew wekî papyona fransizan disekine. Lêbelê yekî kurdî-hizr û kurdî-zar di roman, çîrok an jî nivîsekê de vê risteyê bixwîne îhtimaleke mezin dê tu tiştî tênegihîje. Lêbelê li şûna wî li beramberî biwêja tirkî di kurdî de “Heyrana çavê te me” bibêje hingê îhtimal tuneye ku xwînerek kurd vê hevokê tênegihîje. Dîsa em vê biwêjê di wergera risteya tirkî de biceribînin hingê dikarin risteyek wiha saz bikin:

“Min heyrana çavê te kiro Kekê Cemîl ca filan karê min sibê pêk bîne.”

Mijar ji bo ku di hişê me de tam safî be, em dikarin mînakeke din jî bidin. Bo nimûne di tirkî de gotineke wiha “Lafla peynir gemisi yürümez” heye û wateya vê ew e ku mirov bi gotin û axaftinan nikare karekî bibe serî, divê mirov dema karekî bike zend û bendên xwe vede û bikeve nav wî karî. Eger em vê metnê rasterast wergerînin kurdî hingê dê risteyeke wiha derkeve holê: “Bi gotin û qisekirinê keştiya pênîr pêşde naçe.” Lêbelê di wergerekê de li şûna vê biwêjê, wergêr eger vê biwêja kurdî “Bi gotegot meriv naçe cot” yan jî “Bi ava hindik aş nagere” tercîh bike bêguman her kesek dê wê demê meseleyê bêtir fêm bike (Açar, 2020: 98-100; Oncu, 2014: 53).

Xaleke girîng jî ev e ku hewce ye wergêr bala xwe bide taybetmendiyên zimanê armanc, ji ber ku kapasîteya bêjeyan a hemû zimanan ji hev cuda ne. Lewma divê mirov taybetmendiyên zimanî hertim bi baldarî bifikire û li gor vê yekê tevbigere (Ayvaz, 2013: 216). Herçend di wergerandinê de di zimanên xwedan taybetmendiyên nêzîk (ên wekî kurdî û farisî) de zêde kêşe tunebin jî, cudahiyên di zimanên xwedan taybetmendiyên dûr (ên wekî kurdî û tirkî) de dibe ku bibe sedema hin kêşeyên mezin. Belê dîsa divê wergêr bala xwe bide ser vê yekê ku di tirkî de biwêj û gotinên pêşiyan dema peyv bi peyv bêne wergerandin bo kurdî, dibe ku wateyên wan ên ne guncaw hebin û ev yek dê karjeniyên ragihandinê ji holê rakin.

Helbet her biwêj û gotinên pêşiyan ên di her ziman û çandê de çêjeke din e. Ziman bi gotinên pêşiyan û biwêjên rengrengî dixemile, dikemile û tehmeke xweş digire. Bêguman veguhestina wan axaftinên xweş, digel hunerên bedew li ser zimanên din ne karekî hêsan e. Herçend avahiyên zimanan yek bin, yan jî nêzîkî hev bin jî, cudahiyên çandî û derbirînên bav û kalên wî zimanî dikarin cuda bin. Ji ber vê yekê wateya rastîn a bêjeyan carna di wergerandinê de tê dîtin lêbelê, gelek caran biwêj bi îfadeyeke cuda ye ku bi heman wateyê re tê wergerandin. Wergera biwêjê hewce dike ku xwîner/guhdêr bikaribe bi awayekî rast wê biwêjê fêm bike û şîrove bike.

5. Metodolojiya Wergerê ya M. Bakerê

Di wergerên nivîskî de gelek metodolojî û stratejiyên wergerê yên cihêreng têne bikaranîn. Di nav wan metodolojî û stratejiyan de gelek teorî û teorisyen hene wekî Jacobson, Catford, Nida, Newmark, Vinay û Darbelnet, Katharina Reiss, Skopos, House, Hatim û Mason û gelekên din (Yıldırımçakar, 2021: 46-56). Di vê nivîsarê de em ê kêşeya wergera nav-kulturî di navbera tirkî û kurdî de li dor metodolojiya Bakerê binirxînin û herwiha li gor senifandina wê, mînakên biwêj û gotinên pêşiyan ên herdu zimanan dabeş bikin. Bakerê di berhema xwe de (2001: 72-77) ji bo wergerên biwêjan çar sernav diyar kirine ku ew bi rêzê wiha ne:

1) Bikaranîna biwêjê bi heman wate û teşeyê (Hevtayiya tam) [Using an idiom of similar meaning and form]
2) Bikaranîna biwêjê bi heman wateyê lê bi teşeyeke cuda (Hevtayiya qismî) [Using an idiom of similar meaning but dissimilar form]
3) Wergera bi parafreyz (Guherandina peyvan) [Translation by paraphrase]
4) Wergera bi jêbirinê [Translation by omission]

Me li ser bingeha van stratejiyan vekolîneke wergerê di vê nivîsarê de kir. Herçend metodolojiya Bakerê tenê ji bo biwêjan hatibe kirin jî me biwêj û gotinên pêşiyan bi hev re nirxandin. Ji ber ku li ser vê mijarê jî nîqaş heye ku gotinên pêşiyan ji biwêjan cuda ye; yan jî heman tişt e lêbelê hinek taybetiyên cuda di xwe de dihewîne. Lê bes em neketin nav vê nîqaşê ka gelo ew herdu ji hev cuda ne yan du tiştên wekî hev in. Ya din jî, carna di wergerê de beramberî biwêjeke zimanê jêder dibe ku rastî gotineke pêşiyan bê di zimanê armanc de. Hingê em dikarin bibêjin ku dewlemendiyek jî di mînakan de çêdibe. Lewma di vê xebatê de me biwêj û gotinên pêşiyan di nav kategoriyekê de wekî hev nirxandin.

5.1.Bikaranîna biwêjê bi heman wate û teşeyê (Hevtayiya tam)

Li gor vê metodolojiyê biwêj û gotinên pêşiyan hem di zimanê jêder de hem jî di zimanê armanc de xwediyê heman wateyê ye û herwiha ew biwêj yan jî gotinên pêşiyan ji peyv û gotinên wekhev pêk tên. Helbet divê bê gotin ku di herdu zimanan de biwêj û gotinên pêşiyan ên bi vî rengî herdem peyda nabin (Baker, 2001: 72-73). Eger em mînakek peyda bikin bo vê yekê mirov dikare ji tirkî gotina “Ayağını yorganına göre uzat” bîne ku li hember vê gotinê bi kurdî wergêr dikare bibêje “Piyên xwe li gor berika xwe dirêj ke”[1]. Wek tê dîtin herdu pêşgotin ji hêla wate û forma peyvan ve di zimanê jêder û zimanê armanc de wekî hev in, heta her wekî wergerên hev in. Bi vî rengî di navbera gelek biwêj û gotinên pêşiyan ên kurdî û tirkî de hevtayiya tam heye ku em ê li jêrê çend mînakan diyar bikin:

Akıl akıldan üstündür.	Aqil serdestî aqil e.
Akıllı düşman, akılsız dosttan hayırlıdır.	Dijminê biaqil çêtir e ji dostê bêaqil.
Arkadaşını söyle kim olduğunu söyleyeyim.	Hevalê xwe ji min re bibêje ku ez zanibim tu kî yî.
Az olsun öz olsun.	Bila hindik be bila rindik be.
Bıçak kemiğe dayanmış.	Kêr gihîştiye hestî. Kêr li hestiyê sekiniye
Bıçak yarası geçer gönül yarası geçmez.	Xweş dibe birîna xenceran, xweş nabe birîna xeberan.
Bir çiçekle yaz gelmez.	Bihar bi kulîlkekê nayê. Bi gulekê bihar nayê.
Bir dirhem et bin ayıp örter.	Çiniyek goşt hezar eybî vedişêre.

1 Di vê xebatê de me ji bo biwêj û gotinên pêşiyan serî li van çavkaniyan dan: Ö. A. Aksoy, *Atasözleri ve Deyimler Sözlüğü*, İstanbul: İnkılâp Kitabevi, 1994; Abdulkadir Bingöl, *Gotinên Pêşiyan û Biwêj*, İzmir: Weşanên Na, 2014; Mehmet Oncu, *Ferhenga Biwêjan*, Ankara: Sîtav, 2014. Mehmet Oncu, *Gotinên Pêşiyan (Senifandin-Şîrove-Ferheng)*. Berg I û II, Ankara: Sîtav, 2020.

Bu hamur daha çok su kaldırır.	Ev hevira hê gelek avê hilîne.
Dağ dağa kavuşmaz, insan insana kavuşur.	Çiya rastî çîya nayê, meriv rastî merivan tê.
Davulun sesi uzaktan hoş gelir.	Dengê daholê ji dûr ve xweş tê.
Dilin kemiği yok.	Hestî di zimên de tune / Hestiyê zimên tune.
Düşmez kalkmaz bir Allah.	Ê neketî û ranebûyî bi tenê Xwedê ye.
Fakirin tavuğu bir bir/tek tek yumurtlar.	Mirîşka belengazan fer û fer hêk dike.
Geç olsun güç olmasın.	Bila dereng be bila ne bizehmet be.
Gönül ferman dinlemez.	Dil gotinan nabihîze.
Görünen dağın uzağı olmaz.	Çiyayê xuya bike ne dûr e.
Her yokuşun bir inişi vardır.	Her hevrazek nişûvekî wî heye.
İki dinle bir söyle. (Bin işit bir söyle.)	Du caran guhdar be carekê bêje.
İşleyen demir pas tutmaz.	Hesin bişixule jeng nagire.
İyi dost kara günde belli olur.	Dostê baş di roja teng de xuya ye.
Kel ilaç bilse kendi başına sürer.	Keçel dermanan zanibe, wê pêşî li serê xwe bide.
Kılıç kınını kesmez.	Şûr kalanê xwe nabire.
Ne ekersen onu biçersin.	Çi biçînî wî hiltînî.
Oğlan dayıya, kız halaya çeker.	Qîz li metê, kur li xalê.
Sabır acıdır meyvesi tatlıdır.	Sebr tehl e fêkiyê wê şîrîn e.
Sanat altın bileziktir.	Huner zêrê zer e.
Sizden iyi olmasin…	Ji haziran çêtir nebe…
Su küçüğün, söz büyüğün.	Av ava biçûkan, peyv peyva mezinan.
Su testisi su yolunda kırılır.	Cerê avê di riya avê de dişikê.
Taş yerinde ağırdır.	Kevir li cihê xwe giran e.
Tok, acın halinden bilmez/anlamaz.	Têr çi zane halê birçî.

5.2.Bikaranîna biwêjê bi heman wateyê lê bi teşeyeke cuda (Hevtayiya qismî)

Li gor vê metodolojiyê biwêjek hem di zimanê jêder de hem jî di zimanê armanc de xwediyê heman wateyê ye lêbelê ji hêla peyv û gotinan ne wekî hev in, teşeya gotinan hinekî ji hev cuda ne (Baker, 2001: 74). Bo nimûne em dikarin gotina “Bir taşla iki kuş vurmak” a tirkî binirxînin. Eger em vê gotinê wergerînin kurdî hingê dibe “Bi kevirekî li du [heb] çivîkan lêdide/dixîne.” Lêbelê li şûna vê gotinê di kurdî de “Bi kevirekî du qûç dixe” yan jî “Bi kevirekî çend kêlikan dixîne” heye. Wek tê dîtin tenê li şûna “çivîk/teyr”ê “kêlik” hatiye gotin. Helbet di gotina “Bi kevirekî li du çivîkan da” di vê gotinê de xwînerek kurdîzar dê vê risteyê kêm zêde têbigihîje, lêbelê di jiyan û çanda kurdan de û di zarokatiya her kurdekî de lîstîka qûçê cihekî taybet digire ku mirov kevirên pehn datînî ser hev û ji dûr ve lê dida. Ev gotin ji vê lîstikê tê; kê bi kevirekî çend kêlikan bixista erdê êdî jêhatîbûn û pisporiya wî lîstikvanî diyar dibû. Dîsa em dikarin ji bo vê sernavê gotina tirkî ya “Çam sakızı çoban armağanı” wek mînak bidin. Ev biwêj gava mirovek xelateke biçûk û mutewazî li gor hêz û taqeta xwe bigire û diyariyê yekî

bike hingê tê gotin. Helbet di kurdî de li şûna vê biwêjê “Xelata şivana benîştê kizwana” hatiye gotin. Wek tê dîtin ji hêla form û peyvan ve herdu biwêj wekî hev in bes li şûna dara çam/merxê di kurdî de ji bo ku gotina biaheng û qafîye, dara kizwanê hatiye gotin. Bi vî rengî gelek biwêj û gotinên pêşiyan di kurdî û tirkî de ji hêla form û wateyê ve hevtayê hev in lê hinek peyv ji hev cihê ne. Em ê li jêrê çend mînakan ji bo vê bidin:

Ağaç yaşken eğilir.	Dara ter netewe hişk be natewe.
Atın ölümü arpadan olsun.	Bila mirina kerêji ceh be.
At ölür meydan kalır, yiğit ölür şan kalır.	Ga dimire çerm dimîne, mêr dimire nav dimîne.
Ben ağa sen ağa bu inekleri kim sağa.	Ez axa tu axa kê van golika bibe nav baxa.
Bir elin nesi var, iki elin sesi var.	Destê tenê deng jê nayê.
Bir taşla iki kuş vurmak.	Bi kevirekî çend kêlikan dixîne. Bi kevîrekî du qûç dixe.
Biriyle aşık atmak.	Bi yekî re kap avêtin.
(Bir durum karşısında) sessiz kalmak	Xwe kerr kirin.
Bükemediğin eli öp, başına koy.	Destê tu nikaribî gez bikî, maç bike. Destê neyê geztin divê bê ramûsandin.
Çam sakızı çoban armağanı.	Xelata şivana benîştê kizwana.
Davulun sesi uzaktan hoş gelir.	Dengê defê ji dûr ve xweş e.
Deliye her gün bayram.	Ji bêar re her bihar e.
Eceli gelen köpek cami duvarına işer.	Ecelê bizinê tê, diçe nanê şivên dixwe.
El elden üstündür.	Dest heye li ser destan.
Eşeğe altın semer vursalar yine eşektir.	Barek pirtûk li kerê bikî, ker dîsa ker e.
Eşek hoşaftan ne anlar.	Ker çi zane zeferan çi ye.
Evdeki hesap çarşıya uymaz.	Hesabê malê û sûkê li hev dernayê.
Fare deliğe sığmamış, bir de kuyruğuna kabak bağlamış.	Rovî nediçû qulê hejek jî dêla xwe ve girêda.
Geç olsun da güç olmasın.	Bila zehmet be bila dereng be.
Halep ordaysa arşın burada.	Şam dûr e ma mişar jî dûr e!
Havlayan köpek ısırmaz.	Ji seyê direyê/diewtê netirse.
Havanın altını dövmek	Binê hawinan kun kir.
Her koyun kendi bacağından asılır.	Mî bi lingê xwe, bizin bi lingê xwe, herkes bi ‘emelê xwe.
Her yiğidin bir yoğurt yiyişi vardır.	Her egîdek rêveçûneke wî heye. Her teyr bi bangdana xwe tê nasîn.
İki ayağı bir pabuca sıkışmak.	Piyên wî ketibû soleke teng.
Kara haber tez duyulur.	Dengê mirinê zû belav dibe.

Karga yavrusuna bakmış, benim ak-pak evladım demiş. Kuzguna yavrusu şahin görünür.	Jûjî destê xwe daye têjika xwe gotiye ji nerm e.
Keçiye can kaygısı, kasaba yağ kaygısı. Koyun can derdinde, kasap et derdinde.	Bizin ketiye derdê serê xwe, şivan ketiye derdê bezê bizinê.
Kedinin gideceği samanlığa kadar.	Reva pişîkê heta ber kulînê/kadînê ye.
Komşu komşunun külüne muhtaçtır.	Cîran hewceyê ava cîran e.
Mart kapıdan baktıtır, kazma kürek yaktırır.	Bibare nebare, meha adarê xedar e.
Mühür kimdeyse Süleyman odur.	Hesk di destê kê de be kebanî ew e.
Samanlıkta iğne aramak.	Di nav telîsê ka de derzîkî digere.
Sora sora Bağdat bulunur.	Bi pirsê mirov diçe Xursê.
Sürüden ayrılanı kurt kapar.	Bizina bi şûn de bimîne behra gur e.
Sütten ağzı yanan yoğurdu üfleyerek yer.	Tu ji girarê tirsiyayî pifê dew ji dikî.
Ununu elemiş eleğini asmış.	Ardê xwe dapêt kapeka xwe rêt.
Üzüm üzüme baka baka kararır.	Gul li gulê dinihere, sor dibe.
Yağmurdan kaçarken doluya tutulmak	Ji zefranê xilas bûye û ketiye qetranê.

5.3.Wergera bi parafreyz (Guherandina peyvan)

Yek ji wan rêbazên wergerê ew e ku wergêr peyvan diguherîne. Ya ku di nav rêbazên wergerê de herî zêde tê şuxûlandin ev rê ye. Xasma, eger wergêr nekarî herdu rêbazên peşîn bi kar bîne hingê dikare serî li vê metodolojiyê bide. Anku eger ew gotina pêşiyan an jî biwêja di zimanê jêder de, di zimanê armanc de peyda nebe wergêr hingê serî li wergera bi parafreyzê dide. Çunkî gelekî zehmet e ku wergêr li hevwateya biwêjên çandî yên zimanê jêder de gotinek peyda bike (Baker, 2001: 74-75). Bi taybetî biwêj an jî gotinên pêşiyan ku xwe bispêrin serpêhatî yan jî çîrokekê û xusûsen aîdê qewm û neteweya xwe be, jixwe ev biwêj û gotinên pêşiyan rasterast/peyv bi peyv bê wergerandin jî di zimanê armanc de tiştekî bêwate derdikeve holê. Lê divê bê gotin ku di zimanê armanc de li hember wê biwêj û gotina pêşiyan jî li gor çanda zimanê armanc gotineke belîx dikare bê dîtin.

Bo nimûne di tirkî de biwêjek heye ku dibêjin “Atı alan Üsküdarı geçti”. Ev gotin gava mirovek karekî di wextê xwe de neke yan jî dema kirina karekî derbas bibe, hingê tê gotin. Helbet ev gotin xwedan çîrokeke taybet e. Lewma eger wergêr rasterast wergerê bike û bibêje “Yê ku [serê hevsara] hespê girt Üsküdarê derbas kir” yan jî “Yê ku li hespê suwar bû Üsküdarê derbas kir” bi tu awayî di kurdî de nayê fêmkirin, belkî ji bo xwînerekî kurd “hesp û Üsküdar” dê bibe meseleya hirç û govendê. Herwiha li hemberî wan gotinan di çanda kurdan de gelek gotinên xweş hene wekî “Heta te hevîr kir xelkê işkeva xwe kir” yan jî “Heta me aqil nas kir ‘emir xilas kir” yan jî “Heta malxwe malê pê hesiya mêvan binê beroşê alast” û hwd. Helbet gelek mînakên bi vî rengî hene bes em ê li jêrê di vê çarçoveyê de hin mînakan pêşkêş bikin ku wiha ne:

A köse sayılmadık kaç tel sakalın var?	Min tu li ser darê jî dîtî, bin darê jî.

Abı hayat içmiş.	Mûyê xwe bi ciwanan re diqusîne.
Altın yere düşmekle pul olmaz.	Behr bi devê segan nalewite.
Arslan yattığı yerden belli olur.	Bizin bi bizinitiya xwe cihê xwe paqij dike.
Aşağı tükürsen sakal yukarı tükürsen bıyık.	Tu ha dikî bav dimre tu ha dikî dê dimre.
Atı alan Üsküdarı geçti.	Heta me xwe nas kir mal li xwe xilas kir. Heta me aqil nas kir 'emir xilas kir. Heta te hevîr kir xelkê işkeva kir Heta min kar kir ewî bar kir. Heta te go hûr û rovî, post hate nîvî. Heta malxwe malê pê hesiya mêvan binê beroşê alast.
Balık baştan kokar.	Av li serekaniyê şêlû dibe.
Bekara karı boşamak kolay.	Heçî ne li govendê xweş dawetî ye.
Bir kahvenin kırk yıl hatırı var	Mirov ji kanîkî qîmek av vexwe heyanî çil salî ji bin heqê wê dernayê.
Bir musibet bin nasihatten iyidir.	Sîwar heta ku nekeve nabe sîwar.
Boşuna kürek sallamak.	Av di conî de dikutin.
Bülbülü altın kafese koymuşlar yine de vatanım demiş.	Beq danîne ser bera neqşîn, dîsa xwe kiriye heriyê.
Can çekişmek	Li ber ruhê xwe dide. Li ber xirêna mirinê ye.
Dağdan gelen bağdakini kovar.	Hat ji palê bû malxê malê.
Eşeğe altın semer vursalar yine eşektir.	Avzêr kirin teneke, dîsa kire teqereq.
Gelini ata bindirmişler demiş 'ya nasip'.	Bûk li hespê ye, hevsar li destê ye, kes nizane nesîbê kê ye.
Her horoz kendi çöplüğünde öter.	Her kes li ber deriyê xwe egîd e.
Her koyun kendi bacağından asılır.	Mî bi lingê xwe, bizin bi lingê xwe.
Kimsenin ahı kimsede kalmaz.	Ahê bizina kol namîne ji ya biqiloç re. Ahê sêwiyan namîne ji zaliman re. Ahê vî destî namîne ji wî destî re. Ahê feqîran namîne ji mîran re.
Koyun can derdinde, kasap yağ derdinde.	Derdê feqîran nan e, derdê axê dawet û dîlan e.
Körle yatan şaşı kalkar.	Kera ba hev girêdin, tir fisa ji hev digirin.
Meteliğe kurşun sıkmak	Şîva miriyan lê diçe. Şîva şevê di mala wî de nîne. Hesreta wî qurişkî pere ye.

Misafir kısmeti ile gelir.	Mêvan bi nan û ava xwe tê.
Ölümün kıyısında/eşiğinde olmak.	Ser lêva kendêl e.
Perşembenin gelişi çarşambadan bellidir.	Barîna baranê ji tavê xuya ye.
Saçını süpürge etmek.	Diranê xwe (bo kesekî) dişkênand.
Taşıma su ile değirmen dönmez.	Hec bi silavan qebûl nabe. Himam bi tir û fisan germ nabe.
Ümidini (bir şeyden) kesmek. Elini eteğini bir şeyden çekmek	Destê xwe ji (yekî/tiştekî) şûştin.
Yalancının mumu yatsıya kadar yanar.	Dawiya derewan bihostek e. Dûvikê derewan ne dirêj e.
Yanına kâr kalmak.	Di kîsê (yekî) de dimîne.
Yer yarılıp içine girmek.	Bû ava berfê, kes nezanî bi ku de çû.
Yumuşak huylu atın çiftesi pek olur.	Kerê mirî (guhsist) tirên şidyayî dike.

5.4.Wergera bi jêbirinê

Metodolojiya çaremîn jî piştî hersê stratejiyên ewil dikare bê bikaranîn. Di vê rêbazê de eger wergêr nekare pêşgotineke di cih de di zimanê armanc de peyda bike yan jî gotineke nêzîkî wê pêşgotinê bibîne, hingê dikare ji ber cudahiyên teşe û formên zimanî carna biwêj yan jî pêşgotina zimanê jêder di zimanê armanc de jê bibe, bi gotineke din piştguh bike û qet nebîne. Helbet mirov dikare bibêje ku ev rêbaz ji bo xwînerên zimanê armanc dibe sivikahî, lewma rihetî û asaniyek dide metna zimanê armanc (Baker, 2001: 77-78). Li gor vê rêbazê Baker dibêje ku wergêr dikare biwêja zimanê jêder bi zanebûn nebîne û bavêje pişt guhê xwe. Bo nimûne eger di metneke tirkî de biwêjên wek “Çarşamba pazarı”, “Aklına turp sıkmak”, “Altı kaval üstü şeşhane/Şişhane” û “Üzüm üzüm üzülmek” derbas bibe mirov dikare wan nebîne û li şûna wan di heman wateyê de bi risteyekê hizr û ramana zimanê jêder di zimanê armanc de nîşan bide (İli, 2015: 125). Li gor wan herdu mînakan biwêja ewil eger mirov rasterast wergerîne dibe “Bazara [roja] çarşemê”. Lêbelê ev biwêj di tirkî de ji bo “cihên berbelav, belawela bûye, tu kelmel û eşya li cihê xwe nebin” tê gotin. Herwiha biwêja “[birinin] aklına turp sıkmak” jî rasterast bê wergerandin hingê dê bibe “Tivr biguvêşim nav mejiyê [filankesê]”. Lebelê ev biwêj di zimanê tirkî de argo ye û wextê mirov fikr û nêrîna yekî ne‘ecibîne yan jî bibêje ku hizr û ramanên wî bi kêrî tiştekî nayê hingê tê bikaranîn. Belkî mirov dikare di bin vê rêbaza çaremîn de gotinên argo zêdetir bibîne. Çunkî argo zêdetir girêdayî bi çanda gelê xwe ye û taybetmendiyên zimanê xwe di xwe de dihewîne.

Ji bo zimanê kurdî jî mirov dikare gelek mînakên wiha peyda bike. Bo nimûne li Bakur, li hin deverên Wanê û Agiriyê heta hin kurdên Rûsyayê, di wexta çayvexwarinê de biwêja “Seb xatirê ‘Eliyê ‘Emo” tê gotin ku mêvan îskana herî dawî qebûl neke û malîvan vê biwêjê bibêje, wê çaxê mêvan dilê malîvan nahêle û cardin îskaneke din çay vedixwe (Aykaç, 2012: 76-79). Dîsa mirov dikare biwêja “Fêl fêlên Perê ne, sim simên kerê ne” (Berdestî, 2012: 96) ji bo vê rêbazê nîşan bide ku çîroka vê gotina pêşiyan wiha ye ku vê rêbazê jî nîşan dide:

> Bûkek (navê wê Perî/Perê bûye) û xwesiya wê hebûye. Bûkê heroj dizî dikir. Xwesiyê gotiye; ez çi bikim çi nekim, ez ê nava mala xwe av kim, piştî avê ez ê paqij kim, piştî paqijkirinê ez ê ard kim. Diz kî be ew ê dewsa xwe bihêle. Bûk jî li kerê siwar dibe û wisa li nav malê digere da ku xwesiya wê nizanibe. Xwesî sibetirê hatiye û dêna xwe dayê hinek dews hebûne. Dewsa kerekî bûye. Gotiye ev heye tune bûka min e. Gotiye, fêl fêlên Perê ne sim simên kerê ne.

Gava ev çîrok bê zanîn û di rewşeke wiha de ev biwêj bê gotin hingê tê fêmkirin. Belê, di bin vê sernavê de em dikarin gotina "Genim garis çûne aş, garis genim daye paş." mînak bidin. Ji ber ku ev gotin jî bi temamî malê kurdî ye û gava ku bi zimanekî din bê wergerandin dibe ku bê fêmkirin lêbelê aheng û reseniya gotinê dibe ku di zimanê armanc de peyda nebe. Helbet gelek biwêj û gotinên pêşiyan ên xas û xwerû kurdî hene ku mirov di wergerê de, bi taybetî jî di wergera tirkî de nikare li hemberî wan gotinan peyda bike, lewma jî belkî serî li metodolojiya "wergera bi jêbirinê" dide. Li dor vê çarçoveyê em dikarin çend mînakên bi vî rengî di kurdî de wiha rêz bikin:

Bila sor be bila pênc qurûşan zêde be.
Go, kûsî tu çima wisa pîs î, go Xwedê wisa li 'eniya min nivîsî.
Go kerê belengaz ji birçîna mir, go Xwedêyo tu dikarî vi girî teva bi ka kî, kerê vî belengazî jî pê rakî, lê te tu cara nekiriye tu nakî.
Heft kiras qetandin.
Herê herê! Heft birayên min hebû ez tenê şandime kerê.
Ji kerê pirsîn, çi xweş e? Go, kelbeş!
Jîrê xwar nan rijî, geniyê xwar nan rûn.
Malîvan gotiye: Kişekiş e popinreşê, mêvan rojkî duda xweşê. Mêvan gotiye: Kişekiş e popinxwarê wele ez hevalê te me heta biharê.
Meriv kete guhê gunda meriv dibe bav[w]inda.
Min bûk anî lez û bez, me pê dabû ga w pez, sivka malê dîsa bûme ez.
Ne malê pir ne gerdenê stûr.
Nêçîra min tê giyê tajiyê min tê. / Salê rojekê nêçîra min tê, ew roj jî giyê tajîyê min tê.
Pîvaz e ha sor ha zer.
Pîrê rûnişt li ser gûnî, gûnî di qûna pîrê re çû, ne pîrê qenc kir rûnişt li ser gûnî, ne jî gûnî qenc kir çû qûna pîrê.
Sibatoka dînik dibêje ez weyn dikim, du ro danekî ji xweka Adarê deyn dikim, postê gîskan bi ser sergo de wer dikim.
Şeb û şekir çûn Diyarbekir, şêkir rûnişt deng nekir, şebê rabû pesnê xwe kir.
Şêr şêr e çi jin e çi mêr e / Şêremêr jî şêrejin jî hene.
Teyrê wê toraqê (ne)bûn.

6. Encam

Biwêj û gotinên pêşiyan perçeyên girîng ên ji malê gelê xwe ne. Çunkî her miletek xwedî taybetiyên xusûsî ne, lewma jî di navbera her neteweyekê de ji her aliyê ve cihêtî peyda dibin. Gava ku ew cihêtî bê li ser karê wergerê hingê girîngiya biwêj û gotinên pêşiyan bêtir derdikeve holê. Di wergerên biwêj û gotinên pêşiyan de herdu ziman çiqas ji hev dûr bin, werger jî ewqas zor û zehmet dibe. Dîsa li gor vê encamê di navbera du kulturan de cudahî çiqas zêde be ferqa navbera biwêj û gotinên pêşiyan jî ewqas ji hev dûr û cuda dibin. Helbet ew jî di wergeran de dibe sedema hin zehmetî û kêşeyan. Mirov dikare bibêje ku ewqas rê û rêbazên wergerê hemû ji bo wergereke serkeftî ye. Ji bo ku wergereke baş bê kirin ev metodolojî hatine danîn û hinek strateji û tecrubeyên salane jî hatine teorîzekirin. Bi wan metodolojî û rêbazên wergerên biwêj û gotinên pêşiyan, armanca herî mezin ew e ku xwînerên zimanê armanc jî wekî xwînerên zimanê jêder tehm û çêjek ji heman berhemê bistînin.

Me di vê nivîsarê de ji metodolojiya M. Bakerê sûd wergirt û li dor dabeşkirinên wê, biwêj û gotinên pêşiyan tesnîf kirin. Ji ber ku ev lêkolîn bi biwêj û gotinên pêşiyan ên zimanê tirkî û kurdî sînorkirî ye, me jî li dor van herdu zimanan mînak anîn. Bakerê, di xebata xwe de biwêj û gotinên pêşiyan dibin van sernavan de kirine çar beş ku bi rêzê wiha ne: Bikaranîna biwêjê bi heman wate û teşeyê (Hevtayiya tam), bikaranîna biwêjê bi heman wateyê lê bi teşeyeke cuda (Hevtayiya qismî), wergera bi parafreyz (Guherandina peyvan) û wergera bi jêbirinê. Li gor vê dabeşkirinê me jî di vê xebatê de mînakên xwe di bin van sernavan de civandin û bi mînakan dewlemendtir kirin. Me dît ku li gor dabeşkirina Bakerê ji ber dewlemendiya çand û folklora kurdî, gelek caran mirov dikare li hember biwêj û gotinên pêşiyan ên zimanê jêder, hevtayiya wan di kurdî de bibîne, wateyeke nêzik peyda bike. Ji bilî van, di wergerên biwêj û gotinên pêşiyan de me dît ku wergêr divê hakimê herdu zimanan be. Yan ne, eger ku biwêj û gotinên pêşiyan di zimanê jêder de ferq neke û pê nehese, dibe ku di metna zimanê armanc de şaşî û xeletiyên mezin derkevin holê.

Wekî gotina dawî û pêşniyaz em dikarin bibejin; divê di kurdî de ferhengên giştî yên biwêj û gotinên pêşiyan bi destê komîsyon û lîjneyan bê amadekirin. Çunkî ferhengên ku ji aliyê yek yan jî du nivîskaran ve hatine amadekirin hertim bi kêmasî ne. Herwiha divê ji bo kurdî ferhengên biwêj û gotinên pêşiyan di navbera zimanên cîran yên wek erebî, farisî û tirkî; herwiha zimanên dunyayê yên wekî îngilîzî, fransizî û îspanyolî de bê amadekirin. Divê bi destê saziyan website/malperên profesyonel ên online ji bo ferhengên biwêj û gotinên pêşiyan bê amadekirin ku hemû nivîskar, lêkolîner û wergêrên kurdî bi rihetî xwe bigihînin wan xebatan ku zimanê kurdî bi awayekî xweşiktir û dewlemendtir bi kar bînin.

Çavkanî

Açar, Z. (2020). Wergera ji Tirkî bo Kurdî û Bikaranîna Hin Peyv û Qalibên Girîng ên Kurdî di Wergerê de. *Kurdiyat*. hejmar 1, 83-130.

Aksan, D. (2004). *Türkçenin Sözvarlığı Türk Dilinin Sözcükbilimiyle İlgili Gözlemler, Saptamalar*. (Çapa 3). Ankara: Engin.

Aksoy, Ö. A. (1988). Atasözleri, Deyimler. *Belleten*. Ankara: TDK. 131-166.

Aksoy, Ö. A. (1994). *Atasözleri ve Deyimler Sözlüğü*. İstanbul: İnkılâp.

Aykaç, Y. (2012). Seb Xatirê 'Eliyê 'Emo. *Nûpelda*. hejmar 9, 76-79.

Ayvaz, G. (2013). Sözcükler, Söz Öbekleri, Deyimler ve Atasözleri'nin Çevirisi ve Çeviri Eylemine Etkisi. *SAÜFED*, c. II, 211-221.

Baker, M. (2001). *In Other Words a Coursebook on Translation*. USA-Canada: Routledge.

Berdestî, Z. (2012). Zarokname. *Nûpelda*. hejmar 9, 96.

Bingöl, A. (2014). *Gotinên Pêşiyan û Biwêj*. İzmir: Na.

Fahd, T. (1986). Ibn Waḥshiyya. EI. (c. III, 963-965). Leiden: E. J. Brill.

Gutas, D. (2003). *Yunanca Düşünce Arapça Kültür Bağdat'ta Yunanca-Arapça Çeviri Hareketi ve Erken Abbasî Toplumu*, Lütfü Şimşek (Wer.), İstanbul: Kitap.

İli, M. (2015). İngilizce Deyimlerin Türkçeye Çevirisinde Karşılaşılan Sorunlar ve Çözüm Yolları. *DÜSBED*. sal 7, jimar 14, 112-128.

Kaplan, L. (2020). *Beramberên Gotinên Pêşiyan Ên Kurdî di Gotinên Pêşiyan ên Tirkî de*. Semînera Doktorayê. Diyarbekir: Zanîngeha Dîcle. Enstîtuya Zanistên Civakî.

Kaya, M. (1992). Beytülhikme. DİA. (c. VI, 88-90). İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı.

Keskin, M. (2012). Çevirinin Vücutsal Tecrübesinden Kürtçe'nin Kayıp Zaman Arayışları. *İnatçı Bir Bahar*, Vecdi Erbay (Ed.), İstanbul: Ayrıntı. 442-461.

Macit, M. (2011). Tercüme Hareketleri. DİA. (c. XL, 498-504). İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı.

Oncu, M. (2015). *Ferhenga Biwêjan*. Ankara: Sîtav.

Oncu, M. (2020). *Gotinên Pêşiyan (Senifandin-Şîrove-Ferheng)*. Berg I û II, Ankara: Sîtav.

Sağlam, M. Y. (2001). Atasözleri ve Deyimlerde İmgelem. *HÜEFD*. c. 18, j. I, 45-51.

Yıldırımçakar, Z. (2021). *Werger wek Kirineke Çandî li ser rêyên ji wergernasiyê ber bi kurdolojiyê ve*. Wan: Peywend.

Yıldız, A. (2020). Tevgera Wergera Kurmancî li Sûrî û Tirkîyeyê. *Nûbihar Akademî*. j. 13, sal 7, 115-138.

Yücel, F. (2013). *Çeviribilimin Paradigmaları Çeviri Seçkisi*. İstanbul: Çanakkale Kitaplığı.